

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



TEZA LÎSANS A BİLİND

DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE AJAL

Muzaffer DUMAN

160001003

ŞÊWİRMEND

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

2019

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ



TEZA LÎSANS A BİLİND

DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE AJAL

Muzaffer DUMAN

160001003

ŞÊWİRMEND

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

CEGERXWÎN'İN ŞİİRLERİNDE HAYVANLAR

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN

Muzaffer Duman

DANIŞMAN

Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

2019

(Teza Lîsansa Bilind)

Muzaffer Duman

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

Tebax-2019

(Di Helbestên Cegerxwîn De Ajal)

KURTE

Di vê xebatê de lêkolînek li ser ajalên di helbestên Cegerxwîn de hatiye kirin. Cegerxwîn navdartirîn helbestvan û nivîskarê Kurd yê sedsala 20. e. Bi giştî li ser Wêjeya Cîhanê taybetî jî li ser Wêjeya Kurdî lêkolîn hatiye kirin. Ajalên di nava helbestên Wêjeya Cîhanê û Wêjeya Kurdî de cih digirin bi mînakên ve hatine vegotin. Wêjeya ku bi navekê xwe yê din Wêjeya Dîwanê yanî Wêjeya Klasîk jî hatiye nêrîn û mînakên ajalan yên ku di vê wêjeyê de derbas dibin jî hatine nivîsîn. Bingeh û esasê vê tezê ew e ku di helbestên Cegerxwîn de navên kîjan ajalan derbas dibin, tesbîtkirin û nivîsandina wan e. Her wiha Cegerxwîn ji aliyên jiyana, perwerdehî, malbat, mexles, berhemên çapbûyî, kesayetiya edebî, mijarên helbestan, zimanê wêjeyî, kesayetên edebî yên ku bandor li ser kirine û mirina wî ve hatiye vegotin.

Jiyana mirovan a civakî û çandî çawa be ew jiyana mirovan jî bandora xwe dike. Ajal di nava jiyana mirovan ya civakî û çandî de çawa cih digirin wisa derbasî wêjeyê jî dibin. Di vê xebatê de jî mînakên ajalan yên di nava edebiyatê de hene. Ajal bi kîjan taybetiyên xwe ve di nava wêjeyê de cih digirin bi mînakên ve hatine vegotin û şîrove jî li ser van hatine kirin. Ji helbestên Cegerxwîn jî ev mînak hatine hîlbijartin û bi şîroveyan wan ve hatine nivîsîn. Cegerxwîn çanda gelê xwe baş dizanî û bi ilma xwe ya medreseyê ve jî ev çand di nava helbestên xwe de pir baş bi kar anî. Cegerxwîn çîrokên ajalan û taybetiyên ajalan di nava helbestên xwe de baş nivîsîne.

Ev xebat t kiliya mirov   ajalan j  n şan dide   di hişmendiya mirovan de ajal cihek   awa digirin diyar dike.   rok n ajalan   nav n ajalan y n ku di nava  anda gel de cihek  gir ng digirin eger ku l kol nek li ser b  kirin d  k rhat  be.

Peyv n Sereke: W jeya Klas k, W jeya Kurd , Cegerxw n, Helbest, Ajal.

Hejmara R pelan: 108

 ewirmend: Do . Dr. Nesim S NMEZ



(Yüksek Lisans Tezi)
Muzaffer Duman

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Ağustos-2019
(Cegerxwîn'in Şiirlerinde Hayvanlar)

ÖZET

Bu çalışmada 20. yüzyılın ünlü Kürt şair ve yazarı Cegerxwîn'in şiirlerinde geçen hayvanlar incelenmiştir. Genel olarak Dünya Edebiyatında özeldede Kürt Edebiyatında, edebiyatın bir türü olan şiirlerde kullanılan hayvanlar üzerinde çalışma yapılmıştır. Divan Edebiyatı diye de tabir edilen Klasik Kürt Edebiyatında kullanılan hayvan isimleri örneklerine de yer verilmiştir. Tez çalışmasının temelini teşkil eden Cegerxwîn'in Şiirlerinde Hayvanlar konusunun yanı sıra Cegerxwîn'in hayatı, aldığı eğitim, ailesi, mahlası, basılmış edebi eserleri, edebi kişiliği, şiirlerinin teması, edebi dili, etkilendiği edebi şahsiyetler ve vefatı konuları araştırılmıştır.

İnsanların hayatında önemli bir yer tutan hayvanların, sosyo-kültürel yaşantının yansıması olan edebiyatta nasıl yer aldığı konusu örneklerle incelenmiştir. Hayvanların hangi özelliklerinden dolayı şiirlerin beyitlerinde yer aldıkları üzerinde de çalışılmış ve her örnek açıklamasıyla birlikte verilmiştir. Cegerxwîn'in şiirlerinde de bu örneklerden alıntılar yapılmış ve açıklamalarıyla birlikte yazılmıştır. Halk kültürüne çok iyi vakıf olan ve bunu aldığı iyi bir medrese eğitimiyle harmanlayan Cegerxwîn, hayvan hikayelerini ve hayvanlara ithaf edilen özellikleri şiirlerinde ustalıkla kullanmıştır.

Bu çalışma bir anlamda edebiyat-hayvan ilişkisini incelemekle birlikte hayvanların, insanların düşünce dünyasında nasıl bir tasavvura sahip olduklarını göstermesi açısından de değerlidir. Halk kültürünün önemli bir parçasını teşkil eden hayvan hikayelerinin ve hayvanların edebiyata yansıması konusunun incelenmesi yararlı olacaktır.

Anahtar Kelimeler: Klasik Edebiyat, Kürt Edebiyatı, Cegerxwîn, Şiir, Hayvanlar.

Sayfa Sayısı: 108

Danışman: Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

(M.Sc. Thesis)

Muzaffer Duman

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES
August-2019

(The Animals In Cegerxwîn's Poems)

ABSTRACT

In this study, the animals were analysed in famous 20th century Kurdish poet and writer Cegerxwîn's poetry. Generally in World Literature and particularly in Kurdish Literature have been studied on the animals used in poetry, which is a genre of literature. Also called Divan Literature examples of animals names included which were used in the Classical Kurdish Literature. In Cegerxwîn's Poems the side of animals issues, which constitute the basis of the thesis work, as well as Cegerxwîn's life, education, family, pseudonym, printed literary works, literary personality, theme of his poems, literary language, literary figures and his deaths were analysed.

The issue of animals analysed with examples, which have an important place in human life and how did take place in literature which is a reflection of socio-cultural life. Because of which characteristics of the animals, they have been studied in the couplets of poems and each example has been given with its explanations. In Cegerxwîn's poems have been quoted from these examples and have been written together with their explanations.

This study, in a sense, analyses the relation between literature and animals, and it is also valuable in terms of showing how animals have imagination in the world of thought. It will be useful to analyses the animal stories which constitute an important part of folk culture and the reflection of animals in literature.

Key words: Literature, KurdishLiterature, Cegerxwîn, Poem, Animals.

Quantity of page:108

Supervisor:Doç. Dr.Nesim SÖNMEZ

NAVEROK

KURTE	i
ÖZET	iii
ABSTRACT	iv
NAVEROK	v
KURTEBÊJE.....	x
PÊŞGOTIN	xi
DESTPÊK	1
Armanca Xebatê	1
Girîngiya Xebatê	2
Çavkanî û Rêbazên Xebatê	2
1. DI EDEBIYATA CÎHANÊ Û EDEBIYATA KURDÎ DE AJAL.....	4
1.1. Di Edebiyata Cîhanê de Ajal	5
1.2. Di Edebiyata Kurdî de Ajal	6
2. JIYAN Û BERHEMÊN CEGERXWÎN Û KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ	15
2.1. Jiyana Wî.....	15
2.1.1. Bi Kurtasî Jiyana Wî û Malbata Wî.....	15
2.1.2. Mexlesa Wî	20
2.1.3. Xwendina Wî.....	21
2.1.4. Zewaca Wî û Zarokên Wî	23
2.1.5. Wefata Wî.....	24
2.2. Berhemên Wî	25
2.2.1. Cîm û Gulperî	25
2.2.2. Reşoyê Darê	26
2.2.3. Gotinên Pêşyan	26

2.2.4. Gulistan.....	27
2.2.5. Awaw û Destûra Zimanê Kurdî.....	27
2.2.6. Ferhenga Kurdî.....	27
2.2.7. Salar û Mîdya	28
2.2.8. Tarîxa Kurdistanê	28
2.2.9. Folklorê Kurdî.....	29
2.2.10. Agir û Pirûsk	29
2.2.11. Sewra Azadî.....	30
2.2.12. Kî Me Ez?.....	30
2.2.13. Ronak.....	31
2.2.14. Zend-Avesta	31
2.2. 15. Şefaq	32
2.2.16. Hêvî.....	32
2.3. Kesayetiya Wî ya Edebî.....	33
2.3.1. Zimanê Wî.....	33
2.3.2. Helbestvanên Ku Li Ser Tesîr Kirine	35
2.3.3. Naveroka Helbestên Wî.....	36
2.3.4. Xebatên Ku Li Ser Cegerxwîn Hatine Kirin.....	37
3. DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE AJAL Ê AWAYÊ BIKARANÎNA AJALAN.....	40
3.1. Di Helbestên Cegerxwîn de Ajal	40
3.1.1. Ajalên Ku Difirin	40
3.1.1.1. Çûk/Çûçik	41
3.1.1.2. Baz/Şahîn	41
3.1.1.3. Kund/Bûm/Pûm	42
3.1.1.4. Hacî Legleg	43

3.1.1.5. Zax.....	43
3.1.1.6. Qirak/Reşqirak	44
3.1.1.7. Murxê Seher.....	45
3.1.1.8. Quling.....	45
3.1.1.9. Hudhud	46
3.1.1.10. Tûtî/Totî	47
3.1.1.11. Kew/Çêlekew/Kewê Ribat/Kewa Gozel/Mêkew/Nêrkew/Ferxa Kewan.....	47
3.1.1.12. Kevok.....	49
3.1.1.13. Qaz/Qazik.....	50
3.1.1.14. Bilbil	50
3.1.2. Ajalên Ku Têna Kedîkirin.....	51
3.1.2.1. Pez/Mî.....	51
3.1.2.2. Beran.....	52
3.1.2.3. Berx	53
3.1.2.4. Bizin.....	54
3.1.2.5. Ga/Boxe/Gamboxe/Conega.....	55
3.1.2.6. Mirîşk/Tûtik/Varik	56
3.1.2.7. Dîk	57
3.1.2.8. Werdek/Ordek	58
3.1.2.9. Seg/Kûçik/Tajî/Tola (Tûle)/Dêl.....	58
3.1.2.10. Ker	60
3.1.2.11. Deve	61
3.1.2.12. Hesp/Kihêl.....	62
3.1.3. Ajalên Kûvî	63

3.1.3.1. Şêr/Şepal/Nêreşêr/Şêremê/Mêreşêr/Şêrgelê/Şêresawê.....	63
3.1.3.2. Asik/Ahû/Xezal.....	65
3.1.3.3. Rovî	66
3.1.3.4. Gur	67
3.1.3.5. Keftar.....	68
3.1.3.6. Wawik	70
3.1.3.7. Kerkedan	70
3.1.3.8. Mar/Koremar	71
3.1.3.9. Hirç û Kudik	72
3.1.3.10. Piling.....	73
3.1.3.11. Beraz/Xenzîr	74
3.1.3.12. Fîl.....	74
3.1.3.13. Kêvroşk/Kêrgoh.....	75
3.1.4. Ajalên Biçûk	75
3.1.4.1. Dûpişk.....	76
3.1.4.2. Qumbil/Qimil	76
3.1.4.3. Mûristan/Mûrî	76
3.1.4.4. Mişk.....	77
3.1.4.5. Rişk	78
3.1.4.6. Kêç.....	78
3.1.4.7. Mêş	78
3.1.4.8. Kulî	79
3.1.5. Ajalên Ku Di Nava Avê De Dijîn	79
3.1.5.1. Masî/Gamasî	80
3.1.4.2. Kevjal.....	80

3.1.6. Ajalên Mîtolojîk.....	81
3.1.6.1. Dêw	81
3.1.6.2. Ejdeha	82
3.2. Awayê Bikaranîna Ajalan	82
3.2.1. Di Nav Gotinên Pêşyan De Ajal.....	83
3.2.2. Di Nav Biwêjan De Ajal	86
3.2.3. Di Nav Ajalan De Dijberî.....	87
3.2.4. Di Nav Ajalan De Nêzwateyî.....	89
3.2.5. Bi Navên Ajalan Ve Hevdengî	90
3.2.6. Bi Navên Ajalan ve Cotepeyv	90
3.2.7. Peyv û Lêkerên Bi Jiyana Ajalan Ve Têkildar	91
3.2.8. Di Nava Malikan De Piraniya Ajalan	93
3.2.9. Helbestên Bi Tevahî Fabl.....	94
3.2.10. Di Nava Mezmûnên Edebiyata Kurdî ya Klasîk De Ajal	99
3.2.10.1. Xezal/Ahû	100
3.2.10.2. Perwane/Pirpirîk	101
3.2.10.3. Mar.....	101
3.2.10.4. Bilbil	102
3.2.10.5. Şêr û Piling	102
ENCAM	104
ÇAVKANÎ.....	105

KURTEBÊJE

amd. : Amadekar

b. d. : Bê dîrok

B.Z. : Beriya Zayînê

ç. : Çap

çap. : Çapxane

h.b. : Heman behrem

h.c. : Heman cih

h. r. : Heman rûpel

hwd. : Her wekî din

P.Z. : Piştî Zayînê

r. : Rûpel

s. : Sayfa

s.s. : Sedsal

wer. : Wergêr

weş. : Weşanxane

PÊŞGOTIN

Edebiyata her miletekî li gorî ziman, çand, keleşor, zargotin, dîrok, erdnîgarî û hwd nirxan ji edebiyata miletên din cuda dibe. Lê em dikarin bi hêsanî û kurtasî bibêjin di edebiyatên hemû miletan de ajal bi şiklekî cihê xwe digirin. Gava em li Edebiyata Devkî ya Rojhilata Cîhanê dinêrin em dibînin ku li ser ajalan gelek çîrok, metelok, pêşgotin û biwêj hene. Wext derbas bûye û ev çîrok ji aliyê hinek nivîskaran ve hatine nivîsandin û heta îro jî hatine parastin. Beydaba bi Kelîle û Dîmne'ya xwe ve Sadî Şîrazî bi Bostan û Gulistana xwe ve vê yekê baş nîşanî me didin. Her wiha di Edebiyata Rojavayê Cîhanê de jî mirov van mînanan bi berhemên Aisopos (Ezop) û La Fontaine baş dibîne.

Çîrokên ajalan ne tenê mijara edebiyatê ye her wiha mijara siyaset û felsefeya siyasetê jî ye. Pirî caran gava miletek di bin desthilatdariyeke tund de dijîn û tu kes nikare zulma ku li wan tê kirin rasterast bibêje hingê kul û derdên wî miletî bi mecazên çîrokên ajalan ve tînin gotin. Ji bo vê jî mînak herî baş pirtûka George Orwell a bi navê Çewlika Ajalan (bi navê xwe yê resen Animal Farm) e.

Li cîhanê em dibînin ku welat, netewe û dewletên ji aliyê şaristanî û zanistê ve pêşveçûyî, girîngiyeke pir mezin dane çand û edebiyata xwe. Heta em dikarin bi awayekî din bibêjin şaristanî û zanistên wan miletan yê îro, li ser çand û edebiyata wan ya berê de ava bûye û geş bûye.

Di Edebiyata Kurdî de Cegerxwîn ji aliyê berhevkerin û nivîsandina çîrok, metelok, pêşgotin hwd yê li ser ajalan ve ji van nivîskaran kêmtir nîn e. Her wiha Edebiyata Kurdî jî ji van edebiyatan qelstir nîn e. Cegerxwîn Edebiyata Kurdî ya Devkî pir baş dizanî. Di nava Edebiyata Kurdan ya Devkî de jî çîrokên ajalan cihekê girîng digirin. Wek mînak çîrokên Dîk û Rovî, Rovî û Şêr, Hirç û Gur û Rovî, Rovî û Qijik, Pîrê û Dîk, Pîrê û Rovî, Şengê û Pengê, Sê Beran û Gur, Tevdîra Mişkan, Serxwebûna Moriyân û hwd. Cegerxwîn di helbestên xwe de yan îşaret li van çîrokan kiriye yan jî rasterast ev çîrok bi helbestkî nivîsandine. Tenê ne ev, di pirî cihan de jî bi ajalan ve tînkildar pêşgotin û biwêj jî di nava helbestên xwe de nivîsandine.

Miletekî ku di nava edebiyata wî ya devkî de bi ajalan ve tînkildar ew qas çîrok, metelok, gotinên pêşyan, biwêj hebin û tu helbestvan û nivîskarên wî miletî wan qeyd neke jixwe ew milet dê çandêke pir biha wînda bike. Cegerxwîn ji wan çend helbestvan û nivîskaran e ku ev kêmasî ji holê rakiriyê û çanda kurdî parastiyê.

Me di vê xebatê te xwest cihê ajalan ê di nava helbestên Cegerxwîn de diyar bikin û raxin ber çavan. Pêşiyê me dîwanên Cegerxwîn yek bi yek xwendin û helbest û malikên ku navên ajalan di nav de derbas dibin me tesbît kirin û nivîsîn. Paşê jî me şîroveyan wan malikan û ajalan ji pirtûkan peyda kirin û nivîsîn. Di derheqê jîyan, berhem û kesayetiya edebî ya Cegerxwîn de me lêkolîn kirin û nivîsîn. Her wiha di derheqê fablên Edebiyata Rojhilatê Cîhanê û Edebiyata Rojavayê Cîhanê de jî me agahî ji pirtûk, tez û çavkaniyên înternetê dîtin û li nav teze de cih kirin.

Bi giştî teza me, ji sê beşên berfireh pêk hat û her beş jî di nava xwe de ji sernavên cur bi cur pêk hat. Di beşa yekem de behsa mijara Di Edebiyata Cîhanê û Edebiyata Kurdan De Ajal, beşa duyem de behsa mijara Jîyan û Berhemên Cegerxwîn û Kesayetiya Wî Edebî, di beşa sêyem de behsa mijara Di Helbestên Cegerxwîn De Ajal û Awayê Bikaranîna Ajalan hatiye kirin. Dawiyê di encamê de bi kurtasî naveroka teze hatiye vegotin.

Helbestên Cegerxwîn yên ku navên ajalan di nav de derbas dibin, ji deh pirtûkên wî yên helbestan hatin girtin. Çapên van pirtûkan yên dawî jî di heman salê (2011) de hatine kirin. Ji ber vê sedemê me di têbiniyan de navê her pirtûkekê bi herfekê da nîşandan. Kîjan pirtûk cara pêşî di têbiniyê de derbas bibe me bi berfirehî kunyeya wê nivîsiye. Lê belê me ji cara duyem de dest pê kir û navên pirtûkan bi herfan îşaret kirin. Herfên ku me dane pirtûkan jî bi vî awayî ne:

Pirtûka bi navê **“Agir û Pirûsk”** bi herfa **“a”** yê,

Pirtûka bi navê **“Sewra Azadî”** bi herfa **“b”** yê,

Pirtûka bi navê **“Kî Me Ez”** bi herfa **“c”** yê,

Pirtûka bi navê **“Ronak”** bi herfa **“d”** yê,

Pirtûka bi navê **“Zend-Avista”** bi herfa **“e”** yê,

Pirtûka bi navê **“Şefaq”** bi herfa **“f”** yê,

Pirtûka bi navê **“Hêvî”** bi herfa **“g”** yê,

Pirtûka bi navê **“Aşitî”** bi herfa **“h”** yê,

Pirtûka bi navê **“Salar û Mîdya”** bi herfa **“i”** yê,

Pirtûka bi navê **“Şerefnameya Menzûm”** bi herfa **“j”** yê hatine nîşandan.

Ez dixwazim spasîyên xwe yê taybet pêşkeşî şêwirmendê xwe Doç. Dr. Nesim Sönmez bikim ku ji destpêka vê tezê heta xilaskirina wê rêberî û alîkariyêke pir baş da min û di hemû astengiyan de rêya min vekir û hêsan kir. Dîsa ez spasîyên xwe pêşkeşî Dr. Öğr. Üy. Kenan Bulut dikim ku ji aliyê serastkirina rêzikên vê tezê de alîkariya min kir. Her wiha ez spasîyên xwe li hemû nivîskar, helbestvan û lêkolînerên ku min ji berhemên wan sûd girtine dikim.



DESTPÊK

Cegerxwîn helbestvan û nivîskarê kurd yê sedsala 20. e. Di sedsala 20. de tu helbestvanên kurd bi qasî Cegerxwîn di nava kurdan de navdar nebûne û helbestên tu kesî bi qasî helbestên wî di nava gel de belav nebûne.

Cegerxwîn di meydana helbestên civakî û siyasî de hozanekî dîdaktîk e. Ev nûvedan di hunera kurdî ya helbestî de bi Cegerxwîn re dest pê kiriye. Cegerxwîn pir helbestên xwe bi stîla fablî ya dîdaktîkî nivîsandine. Wek: “Ji Biçûkan Re”, “Serxwerabûna Mirîşkan” hwd. Wî ev cure helbestên fablî yanê çîrokên heywanan nivîsîne. Wek mînak babeta helbesta “Ji Biçûkan Re” parçeyek penîr e; ev parçeyê penîr çawa di navbera şêr û pilingekê de bîn dabeşkirin; ji ber dijiwariya dabeşkirinê; şêr û piling, rovî ji xwe re kirine hakem. Di dawiyê de rovî wan her duyan dixapîne û penîr dixwe.¹

Danasîna xebatê: Di vê xebatê de me lêkolînek li ser ajalên ku di helbestên Cegerxwîn de derbas dibin kir. Me pêşiyê mijara teza xwe kifş kir û me navê tezê wek “Di Helbestên Cegerxwîn De Ajal” danî. Paşê jî me sînorên mijara teza xwe diyar kirin û li gorî van sînoran me yek bi yek helbestên Cegerxwîn xwendin. Di nava van helbestan de me malik û helbestên bi mijarê ve têkildar kifş kirin û nivîsîn. Me navên ajalan yek bi yek nivîsîn û malikên bi wan ve têkildar jî di binê wan de nivîsîn. Helbet me hemû malikên ku tesbît kirin nenivîsîn lewra herî kêr malikek yan du malik mijar didan fêmkirin.

Di nava her sê beşên vê tezê de beşa herî berfireh û eslî û bingeîn “Di Helbestên Cegerxwîn De Ajal” bû. Jixwe mijar û armanca nivîsandina vê tezê jî heman beş bû.

Armanca Xebatê

Fabl cureyeke edebiyatê ye û taybetiya fablê ya herî diyarker ew e ku ajalan didin axaftin. Axlebê van fablan li ser çîrokekê, meseleyekê bi mirovan dide fêmkirin û dîdaktîk (hînkir) in. Me bi vê xebatê xwest bizanin û bidin zanîn ku Edebiyata Kurdî ji aliyê fablan ve gelek dewlemend e û Cegerxwîn di vî warî de helbestvanekê bêhempa ye.

Edebiyata Kurdî ya Devkî ji aliyê çîrokên ajalan ve gelek têr û tijî ye. Bi ajalan ve têkildar çîrok, pêkenok, gotinên pêşyan, zûgotinok, biwêj û hwd di Edebiyata Kurdî ya Devkî

¹ Yusuf, Kaynak (2010), *Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî*, Çapa yekem, Weşanên Do, İstanbul. r. 129.

de pir hene. Heta kurmancan êdî ajalekî wekî rovî jî ji xwe re kirine mam û di piraniya çîrokên bi rovî ve têkildar, rovî wek “Mam Rovî”, “Mamê Rovî” derbas dibe. Armanca vê xebatê ya bingehîn ew e ku ew çîrok û gotinên li ser ajalan hatine nivîsîn bên kifş kirin û parastin.

Girîngiya Xebatê

Her millet divê ku li wêje, çand, ziman û dîroka xwe xwedî derkeve û van nirxan bigihîjîne nifşên nû. Lewra her millet bi van nirxên neteweyî ji milletên din cuda dibe. Her wiha milletên ku hêza neteweyiyê ji van nirxên pîroz hildidin pêşve diçin û digihîjin asta şaristaniyê. Ji bo me kurdan jî divê ev nirx bên zanîn û parastin.

Em dibînin ku Cegerxwîn ji zargotina kurdî gelek çîrokên ajalan zanîne û di nava pirtûkên xwe de cih kirine. Divê xwendevan û zanayên kurd jî li ser vê babetê bi hûrgilî bisekinin û peyamên ku Cegerxwîn xwestiye bi van helbestên xwe yê fablî bide baş bizanin.

Çavkanî û Rêbazên Xebatê

Di vê xebatê de ji bo beşa yekem çavkaniyên me yê bingehîn pirtûka Ali İhsan Kolcu ya bi navê “Batı Edebiyatı” û pirtûkên Sadî Şîrazî “Bostan” û “Gulistan” û pirtûka Beydaba “Kelîle û Dîmne” û pirtûkên Edebiyata Kurdî ya Klasîk bûn. Ev pirtûk jî Dîwana Feqiyê Teyran, “Mem û Zîn” a Ehmedê Xanî, Dîwana Melayê Cizîrî, pirtûka Destana Şerrê Kundan û Qijikan, Dîwana Seyîd Eliyê Findikî, pirtûka Mela Huseynê Bateyî, helbestên Axayokê Bêdarî û hwd din bûn. Di beşa yekem ya pirtûkê de me ji van pirtûkan hemûyan sûd wergirt.

Di beşa duyem de Cegerxwîn yê helbestan bûn. Ji bo beşa duyemîn me di pirtûk bingeh girtin û ji van her du pirtûkan sûd wergirt. Yek ji van, pirtûka Yusuf Kaynak ya bi navê Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî bû, ya din jî pirtûka Cegerxwîn ya bi navê Jînenîgariya Min bû. Me wergera vê pirtûkê a bi navê “Hayat Hikayem” bi kar anî û piraniya jiyana Cegerxwîn ji pirtûkê girt. Her wiha me ji bo vê beşê ji pirtûkên antolojiya edebiyata kurdî jî sûd wergirt.

Di beşa sêyem de me deh pirtûkên Cegerxwîn yê helbestan wek çavkanî bi kar anîn. Her wiha me ji pirtûka İskender Pala ya bi navê “Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü” û ji teza Önder Ertap ya bi navê “Divan Şiirinde Hayvan Motifi” jî sûd wergirt.

Me malik û helbestên ku navên ajalan di nav de derbas dibin pêşiyê tesbîtê kirin û nivîsîn. Paşê jî ev malik bi kîjan armancê ve di nav helbest û malikan de hatine bikaranîn me diyar kirin. Me bi alîkariya van pirtûk û tezan şîroveya van malikan li ser wan nivîsîn.



1. DI EDEBIYATA CÎHANÊ Û EDEBIYATA KURDÎ DE AJAL

Ji destpêka jiyana mirovahiyê heta niha, mirovan gelek sûd ji ajalan girtine û ajalan di gelek qadên jiyane de alîkariya mirovan kirine. Mirovan hinek ajalên wek hesp, ker, çêlek, ga, pez, dîk, mirîşk, kûçik û hwd kedîkirine û xistine bin xizmeta xwe. Van ajalan carinan di şeran de, carinan di nêçîrê de, carinan di parastina mirovan ya li dijî ajalên kûvî de, carinan di xwedîkirina pez û dewaran de gelek alîkarî dane mirovan. Wekî din mirovan şîrê ajalan yan vexwarine yan jî ji xwe re kirine mast û penîr û dew. Her wiha goştê ajalan xwarine û ji postên wan ji xwe re cil û berg û pêlav û alavên din çêkirine. Ji zemanê berê heta niha jî ji hiriya ajalan, ji xwe re nivîn û lihêf û konên mezin çêkirine. Ji van tiştan hemûyan xuya dibe ku di navbera mirov û ajalan de têkiliyeke pir xurt heye û gelemperî mirovan ji ajalan feyde dîtiye.

Mirovan her tim xwestiye kul û derd û fikr û ramanên xwe bi zimanekî xweşik û herikbar bînin ziman. Edebiyat ji vê yekê derketiye holê û li dora heman fikrê ketiye nava dirûv û teşeyekî. Edebiyata devkî li gorî jiyana mirovan şikl girtiye û bûyer û serpêhatî û jiyana mirovan ya rojane bûne mijarên edebiyata devkî. Ji ber ku ajalan di nava jiyana mirovan de cihekî gelek girîng digirt, li ser navên ajalan jî çîrok û gotinên pêşyan û metelok û zûgotinok û biwêj ketine edebiyata devkî. Paşê jî mirovên ku xwestine kevneşopî, 'edet û orfên xwe ji nifşên pêşerojê re bihêlin ev cureyên devkî nivîsandine û ji pêşerojê re wek berhemên edebî yên nivîskî hiştine.

Di nav wêjeya devkî ya hemû milletên cîhanê de, bi navên ajalan ve têkildar gelek çîrok, gotinên pêşyan, metelok, biwêj, zûgotinok, helbest û hwd hene. Çîrokên ku bi zimanê ajalan ve tên nivîsîn di nava edebiyata cîhanê de êdî bûye cureyek ji cureyên edebiyatê. Di van çîrokan de armanc ew e ku derseke sincî (exlaqî) bê dayîn. Çîrokên ajalan bi kurtewateyiya xwe û aliyê xwe yê metaforîk ve di nav edebiyatê de cihekê girîng digire. Ji aliyê dersdana exlaqî, hînkirina nixên baş û nîşandana tiştên bêexlaqî û tiştên xirab ev çîrokên ajalan bûne amûrên baş. Her wiha axaftandina ajalan ji bo hunerên edebî yên teşxîs û întaqê jî dibin mînakên baş.²

²Banu Özer, Griffin (2015), *Marzuban-name Tercümesi Metninde Geçen Hayvan Tasvirleri Üzerine Bir İnceleme*, Yıldız Teknik Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Eski Türk Dili ve Edebiyatı, Yüksek Lisans Tezi, İstanbul, r. 14.

1.1. Di Edebiyata Cîhanê de Ajal

Di çanda Hindîstan û ya Derya Spî ya berê de du cureyên ji hev cuda yê çîrokên ajalan pêk hatine. Di nava Wêjeya Rojavayî de cara yekem Aisopos'ê Frîgyayî çîrokên ajalan nivîsîne. Tê gotin ku Aisopos B.Z. di navbera salên 620-650an de jiyaye û di bin desthilatdariya hingê ya zorker û fîşarker de nikariye fikr û ramanên xwe bibêje û bi van çîrokên ajalan ve fikrên xwe nivîsîne. Lê helbestvanê Yewnanî yê berê Hesiodos (B.Z. s.s. 8.) bi çîroka xwe ya Başok û Bilbil, dîsa şervanê Yewnanî Arkhilokhos (B.Z. sala 7an) bi çîrokên xwe yê bi vî awayî heta îro jî tî zanîn. Berhevkirinên çîrokên Aisopos cara ewil ji aliyê Demetrius'ê Pheronî ve hatine kirin. Phaedrus jî wekî Ezop kole bû wî nedikarî ramanên xwe bibêje. Phaedrus çîrokên Ezop bi menzûmî wergerandine zimanê Latînî û rêyeke nû vekiriyê. Piştî wî jî Aviaus û Planudes jî bi çîrokên Ezop ve mijûl bûne. La Fontaine ji berhemên Ezop û Beydaba yê ku hatine wergerandin îstîfade kiriye û ji helbestvanên berê xwe Phaedrus, Planudes û Edmund Spenser sîd wergirtiye û di warê fablan de xebatên hêja pêk anîne. Nivîskarê Ūris Îvan Andreyeviç jî di heman warî de berhemên baş nivîsîne.

Li Rojhilatê Cîhanê de, em çîrokên ajalan yê ewil di edebiyata Hindîstanê de di nav çîrokên Pançatantra de dibînin. Lê çend sedsalan paşê (P.Z. 100-150), ev çîrok hatine nivîsîn û tu kesî nezaniye gelo ka ji aliyê kê ve hatine nivîsîn. Di vî warî de berhemeke din ji aliyê Beydaba (P.Z. 300) ve hatiye nivîsîn. Beydeba berhema xwe ya Kelîle û Dîmne di dewra Hukumdar Debşelem de nivîsiye û pêşkeşî wî kiriye. Di edebiyata Farisan de jî di sedsala 8 û 9. de henekwanek bi navê Ubeyd-î Zakanî yê ku bi helbestên xwe ve rexneyên civakî kirine û helbestvanekî bi navê Muhemmed Bakir Meclîsî bi navê (Mûş û Gurbe) Mişk û Pisîk berhem nivîsandine. Di berhemên Sadî Şîrazî yê Bostan û Gulistanê de gelek çîrokên ajalan hene.³

Di 'alema Îslamê de jî destpêka xebat û lêkolînên li ser ajalan bi wergerandina berhemên beriya Îslamê ne û ev berhem bi zimanê Erebi hatine wergerandin. Ev xebat û lêkolînên li ser ajalan gelek girîng in. 'Alimên musulman, berhemên Yewnaniyan ji wergerên Erebi nas kirine û ji wan berhemên sîd wergirtine. Pirtûka filozofê Yewnanî Arîsto ya bi navê " Historia Animalium" ji aliyê Yahya Îbni'l-Bitrîk ve bi navê "Kîtabu'l-Hayevan" hatiye

³ Griffin, r r. 14-15.

wergerandin. “Kîtabu’l-Hayevan”paşê jî ji aliyê Ebû Alî Îbn Zur’a ve bi awayekî berfirehtir hatiye wergerandin.⁴

Cahiz, di nava wêjeya Ereban de kesayetekî gelek navdar e û navê wî yê eslî jî Ebû Osman ‘Amr bin Bahr’el-Kînanî ye. Cahiz bi ol û sirûştê ve têkildar ji 200’an zêdetir berhem nivîsandine. Gava ku berhemên xwe dinivîse jî, dixwaze xwandeveanên xwe bêyî ku bêhteng bike di derheqê mijarekê de agahdar bike. Cahiz berhema xwe ya navdar “Kîtabu’l-Hayevan” jî bi vî awayî nivîsiye û ev berhema wî ji heft cildan pêk tê.⁵

1.2. Di Edebiyata Kurdî de Ajal

Edebiyata kurdî ya devkî ji aliyê çîrok û metelokên ajalan ve gelek dewlemend e. Di jiyana kurdan de bi taybetî jî kurdên gundan de ajalên kedî roleke mezin dilîzin. Kurdên jiyaneke gundewarî dijîn li ser ajalan gelek mesele gotine û êdî van meseleyan di nav edebiyata kurdan ya nivîskî de jî cih girtine. Di gelek çîrokan de bûyer di navbera ajalan tenê de, di hinek çîrokan de jî di navbera mirov û ajalan de derbas dibe. Çîrokên ku di nava lehengên wê de mirov hebin, gelemperî mirov pîrejîn û pîremêr û zarok û keç û jin in. Ev leheng jî bi qasî mêrekî hêzdar nîn in. Di edebiyata kurdî ya devkî de çîrokên herî navdar ev in: “Rovî û Pîrê”, “Rovî û Dîk”, “Şengê û Pengê”, “Gur û Heft Karik”, “Gur û Bizin”, “Çûk û Pîrê”, “Kêzaxatûn”, “Pîrê û Dîk”, “Şîva Rovî û Legleg” û hwd.

Gava ku mirov dixwazin nirxên mirovahiyê bi awayekî çîrokî ji nifşên pêşerojê re bihêlin, van nirxan bi alîkariya van çîrokan ji zarokan re dihêlin. Wek mînak:

Di çîroka “Rovî û Pîrê” de nebaşiya diziyê ji zarokan re tê vegotin. Rovî her roj şîrê pîrê didize û vedixwe. Pîrê rojekê xwe li rovî vedişêre û pêdihese ku rovî her roj şîrê wê vedixwe. Pîrê rovî digire û boçika wî jêdike. Rovî dest bi lavayan dike û boçika xwe ji pîrê dixwaze. Pîrê jê re dibêje here şîrê min bîne paşê ez ê boçika te bidim te. Rovî piştî gelek dûçûn û lêgerînan şîrê pîrê tîne û boçika xwe distîne.

⁴ Selçuk, Kırbaç (1999), *Hayâtü’l-Hayevân Tercümesi 1. Cilt*, Sakarya Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Doktora tezi, Sakarya. r. 4.

⁵ Kırbaç, r. 5.

Di çîroka “Rovî û Dîk” de nebaşîya derewkeriyê derdikeve pêş. Rovî tê û lêdinêre ku dîkek li ser çîtê hewşê bang dide. Rovî bi derewan dixwaze dîk bixapîne û bixwe. Lê dîk bi derewên rovî naxape û xwe ji destê wî xilas dike.

Di çîroka “Şîva Rovî û Legleg” de behsa nirxa mêvanperweriyê tê kirin. Rovî û legleg dibin cîranên hev û rovî dixwaze şîveke xweş bide cîranê xwe. Rovî xwarineke pir xweş çêdike û cîranê xwe gazî şîvê dike. Legleg tê mala rovî û dest bi xwarinê dikan. Lê rovî xwarina leglegê jî mîna xwarina xwe xistiye firaqeke fireh û deşt. Leglega nikuldirêj çî qas li ber xwe daye jî nikariye vê xwarinê bixwe û ji mala rovî birçî vegeyriyaye. Leglegê jî ji bo rovî ji halê wê fêhm bike, şîvek amade kiriye û gazî cîranê xwe yê rovî kiriye. Wê jî xwarina rovî xistiye firaqeke kûr û dirêj û daniye ber rovî. Rovî kiriye û nekariye nikariye vê xwarinê bixwe û bi xeletiya xwe hesiyaye. Paşê jî leglegê rewş jê re vegotiye û xwarina rovî xistiye firaqeke fireh û daniye ber. Rovî tê xwarina xwe xwariye û carek din jî di gazîkirina mêvaniyê de xeletiyek wisa nekariye.

Di çîroka “Şengê û Pengê” de nirxa guhdarkirina gotinên dê û bavan derdikeve pêş. Şengê û Pengê du karikên biçûk in û gava diya wan diçe da ku biçêre, ji wan re dibêje nebe ku hûn deriyê malê ji tu kesî re vekin. Ew jî dibêjin baş e li malê ji xwe re dileyîzin. Gur jî tê, bazarî diya wan dike û bi dek û dolaban derî bi karikan dide vekirin û her du karikan dixwe. Paşê jî diya wan bi vê bûyerê dihesê û diçe zikê gur diqelêşe û her du karikên xwe xilas dike.

Ji xeynî van çîrokan, di edebiyata kurdî ya devkî de di nava biwêj û gotinên pêşiyên de jî nimûneyên ku navên ajalan tê de derbas dibin hene. Hinek ji wan nimûneyên biwêjan ev in:

Bi dilê xwe **hespê** xwe bezandin:

Neyarên me nuha di ser axa me da, bi dilê xwe **hespê** xwe dibezînin.⁶

Gayê Belek:

Li bajêr pirs bike wek **gayê** belek herkes wî nas dike.⁷

Goştê Berazan:

⁶ Ahmet Cengiz, Çamlıbel (1997), *İdyomên Kurdi*, Çapa Yekemîn, Weşanên Deng, İstanbul, r. 29.

⁷ Çamlıbel, r. 88.

Bila goştê **berazan** be êdî ez naxwim.⁸

Gundê bê kûçik:

Mîna gundê bê **kûçik** usa bê tirs herine nav malan.⁹

Gurê sibatê:

Wek **gurê** sibatê êrîşê xûrekan kir.¹⁰

Kerê vî barî nîne:

Bi min be ew **kerê** vî barî nîne, divê em vê wazifê nedine wî.¹¹

Marê Gewr:

Ku fesal bikeve destê Celo, wek **marê** gewr meriyan dixê.¹²

Ji bilî van biwêjên ku navên ajalan di nav de derbas dibin, gelek biwêjên din jî di kurdiyê de hene û di nava gel de belav bûne. Her wiha bi vî rengî di nava gelek gotinên pêşyan de jî navên ajalan derbas dibin û hinek ji wan bi şîroveya xwe ve di kurdiyê de wiha cih digirin:

Adarê **seg** kete bin siya darê.

Ev gotin der heqê tava adarê de hatiye gotin. Di meha adarê de roj pir xuya nake lê dema dertê jî tava wê giyaneweran dişewitîne.¹³

Bar ê **keran** e, bez a **hespan** e.

Her kes wekî xwe ye; divê mirov li gorî rewşê û taybetiyên mirovan kar û peywirê bide wan.¹⁴

⁸ Çamlıbel, r. 91.

⁹ Çamlıbel, r. 92.

¹⁰ Çamlıbel, r. 93.

¹¹ Çamlıbel, r. 121.

¹² Çamlıbel, r. 137.

¹³ Mehmet, Oncu (2009), *Gotinên Pêşyan*, Çapa yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, r. 14.

Bi **gayekî** cot nabe.

Her karek li gorî kirin û domandina wî alavên wî hene. Ji bo kirin û domandina van karan, divê alavên wan tam bin. Karekî ku mirov kir, divê mirov amadehiya xwe baş bike û karê xwe jî baş bike.¹⁵

Ku me firot **kerê** reş, em ê bixwin xurd û xwarina xweş.

Dema mirov tiştên ku ji mirov re girîng in, (bi giştî ji bo xelkê jî welê ne) bifiroşedê mirov bi bihayê wan heta demeke kin di xweşiyê de bijî.¹⁶

Rovî got; “Min nebin nav **mirîşkan**, wekî din hûn çî ji min bikin, bi dilê we ye.”

Kesên fêlbaz û hişyar dema xelk bi vê zeafiya wan dihesin, berê wan didin qada kul ê zeîf in. Lê ew bi vê hişyarbûna xwe van fetlan jî def dikin.¹⁷

Gur û **seg** bûn yek, mala şivên şewitandin.

Seg alîkarê şivan e û ji alîyekê jî dest û piyê şivan e. Dema xayîntiyê li şivan bike û bi dijminê şivan re bibe yek, dê mala şivan xera bike.¹⁸

Ev biwêj, gotinên pêşyan, çîrok û metelok hemû di nav edebiyata kurdî ya devkî de cihê xwe digirin û hêj bi awayekî berfirehî ji aliyê nivîskar, helbestvan û lêkolînerên kurdan ve nehatine tomarkirin. Çend nivîskaran li ser çîrokan xebat kirine û hinek ji van derbasî nivîsê kirine. Yek ji van nivîskaran Mehmed Emîn Bozarslan e.

Mehmed Emîn Bozarslan di 15'ê îlona sala 1934an da li wîlayeta Diyarbêkrê li gundekî qeza Licê hat dinê. Di sala 1960'î de dest bi nivîskariyê kiriye. Bozarslan li Swêdê ji bilî xebata li ser “Jîn”ê “Kurdistan”ê, “Mem û Zîn”ê û “Kurd Teavun ve Terakî Gazetesi” yê, li ser meselok û pêkenok û çîrokên gelî yên Kurdî jî xebitî. Ew meselok û pêkenok û çîrokên gelî yên ku wî di wextê xwe da li Kurdistana Jorîn ji nava gel berhev kiribûn, lê belê mecala nivîsîn

¹⁴ Oncu, r. 33.

¹⁵ Oncu, r. 56.

¹⁶ Oncu, r. 418.

¹⁷ Oncu, r. 589.

¹⁸ Oncu, r. 276.

û çapkirina wan nedîtibû li Swêdê dest bi nivîsîn û çapkirina wan jî kir. Beşek ji xebata wî ya li ser meselok û pêkenok û çîrokan, rêza “Meselokên Lawiran” bû. Bozarlan di vê rêzê de pênc pirtûk nivîsîn. Pirtûka pêşîn “Mîr Zoro” di sala 1981’an de, pirtûka duduyan “Gurê Bilûrvan” û ya sisêyan “Kêz Xatûn” di sala 1982’yan de, pirtûka çaran “Serketina Mişkan” di sala 1984’an de, pirtûka pêncan “Pepûk” jî di sala 1985’an de derketiye.¹⁹

Helbestvanên Edebiyata Kurdî ya Klasîk jî navên ajalan di nav berhemên xwe de bi kar anîne. Çendî ku em dibînin di nav Edebiyata Kurdî ya Klasîk de navên ajalan kêr hatine bikaranîn. Sedema vê yekê jî ew e ku mijarên edebiyata klasîk ji çand û jiyana kurdan ya rojane dûr bûn û helbestên edebiyata klasîk li ser mijarin ‘ilmî û dînî dihatin nivîsîn. Piraniya ajalên ku di nava helbestên klasîk de derbas dibin, ji mezmûnên edebiyata klasîk in.

Em ê ji hinek helbestvanên Edebiyata Kurdî ya Klasîk hinek mînakên binivîsin. Helbet di helbestên van helbestvanan de navên ajalan di gelek malikan de derbas dibin. Tenê em ê ji bo nimûne du-sê mînakên binivîsin.

Melayê Cizîrî di dîwana xwe da, navên ajalan wiha bi kar tîne:

Îro ji me l’bedra tamam ‘enberfeşan bin sed selam

Ey **hudhudê** şîrînkêlam ehlen wesehlen merheba.²⁰

Li **kelbê** asîtanê xwe nepirsî qet hebîb carek

Gelo naêne bîrê em di vê nêçîr û ravê da.²¹

Seyîd Eliyê Findikî di helbestên xwe de navên ajalan wiha bi kar tîne:

Tu hingê pak û xweşmêr î

Li meydanê wekî **şêr** î

Di her du dinya tu têr î

Li min gotin li te dakî²²

¹⁹ Mehmed Emin, Bozarlan (2000), *Gurê Bilûrvan*, Çapa diduyan, Weşanên Deng, Stenbol. r r. 120-125.

²⁰ Selman, Dilovan (2012), *Dîwan Melayê Cizîrî*, Çapa duyem, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 21.

²¹ Dilovan, r. 25.

Ta kengî tê bêjî 'Elî

Tu'd gotinê wek **bilbil** î

Fayde çî ye tu ne j' dilî

Te l'gotinê ne'l kirinê.²³

Mela Huseynê Bateyî di helbestên xwe de navên ajalan wiha bi kar aniye:

Ya reb hewar sed car hewar

Perwane qet nakit qerar

Xweş muhbetê havêti nar

Ya reb tu yî dermanê min.²⁴

Dilbera gerden şefîf î danuwa dura 'Eden

Nazik û mewzûn letîf î nexliya selwa çîmen

Gullîbas î, gulqiyas î, gulenî gulpîrehen

Ahûya deşta Tetarê rehzena **aska** xeten

Horiya baxê beheştê çav **xezala** kê yî tu²⁵

Pertew Begê Hekarî di helbesta xwe de ajal wiha bi kar aniye:

Sedayê **'endelîban** tar û azar

Newayê **bulbulan** her wirdê al e²⁶

²² Seyîd Eliyê, Findikî (2012), *Dîwan*, (Amd: Selman Dilovan- Huseyn Şemrexî), Çapa 6. Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 31.

²³ Findikî, r. 81.

²⁴ M. Xalid, Sadinî (2011), *Mela Huseynê Bateyî, Jiyân, Berhem û Helbestên Wî*, Çapa duyem, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 73.

²⁵ M. Xalid, Sadinî (2011), *Mela Huseynê Bateyî, Jiyân, Berhem û Helbestên Wî*, Çapa duyem, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 107.

²⁶ Perto Begê, Hekarî (2011), *Dîwan*, (Amd: Tehsîn İbrahim Dorskî), çapa yekem, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 254.

Ehmedê Xanî di berhema xwe ya navdar Mem û Zîn'ê de navên ajalan wiha bi kar tîne:

Murxê dilê murde bête perwaz

Bê perde bibit teraneperdaz²⁷

Ew **şêresiwar** û **bebrê** cengî

Xûnî kiribûn belek**pelengî**

Ewçendi **xezal** ewan kirin seyd

Ewçendi **piling** ewan kirin qeyd²⁸

Feqiyê Teyran di helbestên xwe de navên ajalan wiha bi kar tîne:

Nalîna **teyr û tiyûran**

Kalîna çeng û bilûran

Xuxulîn d'qesr û qisûran

Bilbilê xweşxwan im ez²⁹

Sofî dibên **şêran** werîn

Mixleb wekî **şêr** didirîn

Vêk ra hezaran dibirîn

Mecrûh di babîl raketê³⁰

²⁷ Ehmedê, Xanî (2011), *Mem û Zîn*, (Amd: Huseyn Şemrexî), Çapa duyem, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 48.

²⁸ Ehmedê, Xanî (2011), *Mem û Zîn*, (Amd: Huseyn Şemrexî), Çapa duyem, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 176.

²⁹ M. Xalid, Sadinî (2012), *Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Çapa şeşan, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 129.

³⁰ M. Xalid, Sadinî (2012), *Feqiyê Teyran, Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Çapa şeşan, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 316.

Gernas Koçer jî ji pirtûka Beydaba a bi nav û deng Kelfîle û Dîmne beşa, Şerrê Kundan û Qijikan wergerandîye kurdiyê û berhemeke di vî warî de ya bêhempa derxistiye holê. Bi xwe di pirtûka xwe de wiha behsê vê berhemê dîke:

“Di nava civaka hemî netewan de, berhemên çandî û hunerî û wêjeyî wek helbest, çîrok, serpehatî, destan û peşan hatine nivîsandin. Bi taybetî jî gelek berhemên çandî û hunerî û wêjeyî jî, bi reng û şeweyên fabl ango li ser têkilî û axaftinên teyrik û lawiran hatine ziman. Mebest jê, ne ku teyrik û lawir/heywan in, mebest ew peywendî û qewimîn in ku di jiyana civakî ya mirovahiyê de pêk tînin. Bi tevahî rastiya wan didin diyarkirin. Gelek kesên fîlozof, civaknas û hunermend jî fikr û ramanên xwe bi şeweyên fabl pêşkêşî civakan kirine.

Ev berhema me ya bi navê “Destana Şerrê Kundan û Qijikan” jî berhemeke bi vî rengî ye. Seranser destaneke bi helbestî ye. bi terzê hevdeng ya bi navê (nezma mesnewî) hatiye ristîn.

Bingeha vê çîrokê min ji pirtûka Beydabayê Hindî ya bi navê Kelfîle û Dimne ji beşa “Kundan û Qijikan” wergirtiye. Kelfîle û Dimne pirtûkek gelek bi nav û deng e li seranserê cîhanê û bi gelek zimanan hatiye wergerandin. Dema ku Îskenderê Makedonî ji Hindistanê bi paş de veberiyaye piştî hingê ev feylesofê bi navê Beydeba vê pirtûkê dinivîsîne. Pirtûk ji pazdeh beşan pêk hatiye; beşa kundana û qijikan jî yek ji wan beşan e. Li ser pirs û daxwaza padîşahê Hindistanê yê wê demê Debşelem, ku dibêje ka gelo çawa mirov dikare bibe dostê neyaran?, an jî bibe neyarê dostan? Beydaba jî ji padîşah re wek bersiv mînakî şerrê kundana û qijikan dide û çîroka wan pêşkêşî dîke.

Naveroka vê çîrokê gelek girîng û balkêş e. Mirov dikare kundana û qijikan wek du netewan binirxîne. Şerr û ceng di nava wan de çawa dest pê dîke? Di serî de kund çawa qijikan tarûmar dîkin? Dîsa ka çawa wezîrê qijikan yê pêncan, dikeve nava kundana û siyaseteke bi çî rengî li hember kundana dimeşîne? Di dawiyê de qijik çawa bi ser dikevin û çî tînin serê kundana? Eva ku hatiye serê kundana, egerê wê çî bû? Bersiva van pirsan mirov dikare di naveroka vê berhemê de bixwîne û bizane.”³¹

Ev çarînen jêrîn ji pirtûka Destana Şerrê Kundan û Qijikan hatine girtin.

Li Çîn û li Maçînê

³¹ R. Yılmaz (Gernas Koçer) (2007), *Destana Şerrê Kundan û Qijikan*, Çapa yekem, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 7-8.

Hebû darek gilale

Qijik lê dihatin lîs

Pir bilind û hewal e³²

Li me hemî wêran bûn

Tev war û hêlîn û lîs

Çi anîne serê me

Evan **kundên** korên pîs³³

Ji rengê vê **pisîkê**

Tim birçî û bêbext in

Ji bona evê ye ew

Her dem bê tac û text in³⁴

Gotina dostaniya

Digel **dûvpişk** û **maran**

Gelekî xweştire ji

Hevaltiya neyaran³⁵

³²Yılmaz, r. 15.

³³Yılmaz, r. 17.

³⁴Yılmaz, r. 56.

³⁵Yılmaz, r. 191.

2. JIYAN Û BERHEMÊN CEGERXWÎN Û KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ

2.1. Jiyana Wî

Cegerxwîn, helbestvanê sedsala 20. yê ji navdarên kurdan e. Jiyana wî ji zarokatiyê heta ku emrê wî xelas bûye di nava feqîrî û belengaziyê de derbas bûye. Lê Cegerxwîn bi helbestên xwe ve tevgerên xwe tu caran dest ji têkoşîna xwe bernedaye. Jiyana Cegerxwîn ji her alî ve hêjayê vekolîneke berfireh e.

2.1.1. Bi Kurtasî Jiyana Wî û Malbata Wî

Cegerxwîn navê mexlesê Şêxmûs Hesen e. Hesen û Eyşê navê dê û bavê wî ne. Hesen lawê Mihemed, lawê Mehmûd û lawê Elî ye. Dê û bavê Şêxmûs Hesen berî çar nifşan ji gundê Pêkende hatine gundê Hesarê; gundê ku Cegerxwîn lê hatiye dinê. Hesar gundekî qezaya Kercewsê ye, dikeve rojavayê Heskîfê û rojhilatê qezaya Midyadê û li rajorî Çemê Dîcleyê ye.³⁶

“Navê gundê me Hesar e. Bi rastî Hesar navê hejdeh gundanê hevpar e. Gava ji me dipirsin em dibêjin “Em Hesarî ne.” Her wiha ev nav, navê eşîrekê jî ye.

Li gundê me nêzikî sê sed mal hebûn. Lê piraniya wan malan ji gundê koç kirine û çûne deverên din. Gundê me di nava deşteke sî-çil kîlometre de ava bûye. Li rojhilatê deşta Hesarê bajarokê Kercewsê heye û her çar aliyên deştê çiyayî ne.”³⁷

Berî ji dayikbûna Şêxmûs, du zarokên Hesen hebûn; a herî mezin keçik bû û navê wê Asya bû, yê biçûk law bû û navê wî Xalid bû. Şêxmûs di sala 1903'yan de hatiye dinê. Ji bilî van her sê zarokan heşt kurên wî yên din bûne lê jiyê wan dirêj nebûye, ji ber feqîrtî û belengaziyê û hemû mirine.

Malbata Şêxmûs kurtedemekê berê Şerê Cîhanê yê Yekemîn ji ber xizanî û şerê di navbera ol û eşîrên kurdan de bar kirine û çûne li gundê Bêder Memo bi war bûne. Li wir jî axayê gundê cendirmeyan rehetî nedaye wan û ji wir jî car din vegeyriyane û hatine gundê xwe yê berê.³⁸

Dema Şêxmûs 9-10 salî bû di hundirê salekê de dê û bavê wî diçin heqîya Xwedê. Ew sêwî dimîne. Di vê piçûkatiyê de mirina dê û bavan wî gelekî diêşîne û xemgîn dike. Rewşa wî

³⁶ Kaynak, r. 11.

³⁷ Cegerxwîn (2003), *Hayat Hikayem*, Birinci basım, Evrensel Yayınları, İstanbul. r. 13.

³⁸ Kaynak, r. 11.

ya aborî û psîkolojîk xirabtir dibe. Ji ber ku temenê wî piçûk bû, ew li cem birayê xwe yê mezin Xalid dimîne, lê ji ber jinbira xwe ya çavteng, temahkar û zilmkar zêde li ba wan namîne.³⁹

Cegerxwînwiha behsa dê û bavê xwe dike: “Bavê min şêst-heftê salî bû û nedikarî bixebite. Yazdeh par axa me hebû; zevîyeke avî, cihê din jî tenê me dikarî em ceh û genim biçînin. Me erdê xwe dida kirê û li bergîdana vê yekê de ji deh paran parek heqê zevîyê digihijî me û me debara xwe pê dikir.

Dayika min berikçêkereke pir baş bû. Her wiha aşpêjeke baş û pir baş jî tayîk dirêşîn. Ji destê wê her kar dihat. Barê xwedîkirin û mezinkirina me li ser milên wê bû. Ruhsivik û dilpaqij bû. Dilê wê ji bo sêwî û birçiyar pir dişewitî. Li derve belengazek bidîta, dianî malê û bi rojan xwedî dikir.⁴⁰

Diya min bejinkurt û qelew bû. Jineke pir baş û dilsax bû. Exlaqxweş û hevalê feqîr û ketiyar bû. Her tim dîn û bêkes û birçî diparastin. Nexweş û feqîr û li dora xwe berhev dikirin û cil û bergên wan li wan dikir û zikê wan têr dikir. Herkesî pesnê diya min dida û ji wê hez dikir. Pir baş pembû û hirî dirêsiya û aşpêjeke bêhempa bû. Rijdeyên pir xweş çêdikirin. Stran, kilam û çîrok jî pir baş dizaniyan. Xwendina nivîsandina wê tunebû lê pir biedeb bû. Dayika wê Xeco ji malên Keyxweyan keça Huseyn bû. Ji ber wê yekê em jî dibûn xwarziyên axayan. Li gorî texmîna min li dora pêncî salî bû.

Bavê min bejindirêj û zirav bû. Temenê wî ji şêstê zêdetir xuya dikir. Xwedîwijdan û mêrekî baş bû. Gava li gund gengeşî û pirsgirêk derdiketin dawiyê de ji pirsgirêk ji wijdana bavê min re dihiştin. Her tim li dijî axa û malbata axa derdiket. Lê em dijminê wan nebûn. Jixwe me her tim ji nava wan axayek ji xwe re hildibijêrî.

Tu hêz û qaweta bavê min wan tunebû li hemberî axayan. Lê ma çî bikin? Her tim bêhêz û bêçare bûn. Bi xwe axatî nedikirin lê tiştên ku axayan dikirin jî qebûl nedikirin. Bavê min ji merdiya diya min pirî hez nedikir lê li dijî kiriên wê jî dengê xwe dernedixist.

Bavê min di sala 1918an de li Amûdê wefat kir. Diya min jî salekê piştî wî li Bêdermemo'yê wefat kir û em pir perîşan bûn.⁴¹

³⁹ Kaynak, r. 12.

⁴⁰ Cegerxwîn (2003), r. 23.

⁴¹ Cegerxwîn (2003), r. 55-56.

Cegerxwîn piştire ji ber destê birayê xwe û jinbira xwe diçe mala xwîşka xwe ya mezin. Xwîşka wî jî ji ber ku pîrî feqîr bûye, Cegerxwîn ji xwe re kiriye şivan û şandiye ber pêz. Bi vî awayî du-sê sal derbas dibin û temenê Cegerxwîn dibe hejdeh.⁴²

Kurê Cegerxwîn Keyo Hesên jî di pêşgotina pirtûka bavê xwe ya “Reşoyê Darê” de di derheqê mirina dê û bavê Cegerxwîn de heman agahiyên dide û dibêje: “Cegerxwîn hê pazdeh şazdeh salî bû bi salek navber winda dike. Carinan li cem birayê xwe dimîne û carinan jî li cem xwîşka xwe dimîne û ji wan re şivantiyê û rênçberiyê dike.”⁴³

Diya min ji bavê min yazdeh zarok anîne û ji van zarokan bes sê zarok sax mane û yê din tev jî mirine. Xwîşka min Asya, kekê min Xelîl û ez.

Bavê min hêj di saxiya xwe de xwîşka min Asya bi xwarziyê xwe yê Xelîl re zewicand. Xelîl ji Hesarê bû û li Amûdê mele bû.

Sê apên min hebûn. Îbrahîm di cianiya xwe de wefat kiribû û mine w nedîtibû. Ezîz tê bîra min lê ew jî hêj di ciwaniya xwe de li Edene’yê wefat kir. Keçeke wî bi mala apên bavê min re zewiciye. Navê mêrê wê jî Feto ye. Mamê min yê din jî Mehmûd bû. Ji Mehmûd jî du kurik û keçik ma: Şêxmûz, Îsmail û Fatim. Min her sê jî dîtî. Malbata wan jî li Edene’yê man. Ji malbate me yazdeh mirovên ciwan, hinek ji xwîndariyê, hinek jî li eniya şer ya Qers-Erdahanê hatin kuştin.

Min behsa rewşa me ya Şerê Cîhanê yê Yekemîn kiribû. Hingê mêrê xwîşka min ya Asya’yê ji nexweşiyê mir. Xwîşka min bi çar zarokên xwe ve jinebî ma. Bavê min ez û diya min li Hesarê hiştin û çû nik xwîşka min. Xwîşka min hêj pir can û ciwan bû û bavê min jî nedixwest ku ew tenê bimîne.

Navê dapîra min (diya bavê min) Temo bû. Bi navê Hesên, xalekê min hebûye û hêj di ciwaniya xwe de wefat kiriye. Diya min û xaltika min Emîne mal û milkê dapîra min di nava xwe parve kirine. Navê kurê xaltika Xelîl, navê keça xaltika min jî Fatim bû.⁴⁴

Piştî ku bavê Şêxmûs diçe Amûdê, kekê Şêxmûs Xelîl jî diçe eskeriyê û Şêxmûs û diya tenê di malê de dimînin. Li gund gelek feqîrî û belengaziyê dikêşin. Ne xwarina wan dimîne

⁴²Feqî Huseyn, Sağniç (2002), *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Çapa yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul. r. 551.

⁴³Cegerxwîn (2007), r. 7.

⁴⁴Cegerxwîn (2003), r. 56-57.

ne jî tu kes heye li wan xwedî derkeve. Di dawiyê de Şêxmûs û diya xwe di destên wan de çî heye çî tune difiroşin û diçin Amûdê.

Wekî ku min berê jî gotibû ez û diya xwe li gund tenê man. Piştî çûna Xelîl ez û diya xwe jî çûn Amûdê. Tenê du tûrik genimê mabû. Diya min ew her du tûrik li kadîne veşartin û em ber bi Amûdê ve rêketin.⁴⁵

Şêxmûs û malbata xwe li Amûdê jî ji feqiriyê pir dikêşin. Şêxmûs û sê hevalên xwe li karê rêya hesin ya trêne de dixebitin. Bavê wî di heştê saliya xwe de ji dinyayê koç dike. Salekê jî piştî bavê wî diya wî wefat dike û Cegerxwîn dibêje gava min mirina diya xwe bihîst ez pir xemgîn bûm û min negirîya. Lê kula diya min tu caran ji dilê min derneket.

Cegerxwîn paşê dest bi xwendinê dike û li medreseyên Kurdistanê xwendina xwe kuta dike. Di jiyana xwe ya perwerdehiyê de jî gelek feqîrî û belengaziyê dikêşe. Lê her tim li ber xwe dide û bi awayekî serkeftî xwendina xwe tamam dike û dibe mele.

Kurê Cegerxwîn Keyo Hesên di pêşgotina pirtûka bavê xwe ya Reşoyê Darê de bi kurtasî wiha behsa jiyana bavê xwe dike: “Cegerxwîn dema feqîtiyê li her çar parçeyên Kurdistanê têr digere û rewşa gelê kurd baş nas dike. Di sala 1928an de dibe Seyda û her wisa di vê salê de jinê tîne.”⁴⁶

Dema Cegerxwîn melatîyê dike, bi meseleya kurdî hişyar dibe. Wî di pirtûka xwe ya Jînenîgariya Min de wiha gotiye:

Wekî tê bîra min, di sala 1924an de bû ku ez li ser destê Şewqî Begê Erxenî şiyar bûme û min bîra kurdperweriyê biriye, bûme welatparêz. Çenda ku ez berî hingê ristevanekî kurdî bûm, min caran ristên xwe bi erebî jî datanî, lê min ev mîletperweriya hûr û kûr nizanîbû. Lê ez bi xwe di vê qonaxê de bêxeber û agah bûm, haya min ji tiştêkî nebû. Ji naê zikê xwe û xwendina mizgeftê pê velî tiştêkî dî nedigeriyam. Me nizanîbû kurd çawa dixebitin û ji bo çî dixebitin. Lê paşiyê min ev serpên ha ji devê hin hevalên xwe bihîstin û nivîsîn. Piştî şerê Şêx Seîd Efendî, sala 1925an min dest bi xebatê kir.⁴⁷

Keyo Hesên jiyana bavê xwe wiha didomîne:

⁴⁵ Cegerxwîn (2003), r. 61.

⁴⁶ Cegerxwîn (2007), *Reşoyê Darê*, Çapa yekem, Weşanên Lîs, Stenbol. r. 8.

⁴⁷ Cegerxwîn (2007), r. 8.

Di destpêka salên sihî de Cegerxwîn şaşik û cubeyê diavêje û êrîşê şêx û axayan dike. Beg û axayên kurdperwer piştgiriya Cegerxwîn dikin. Piştî ku Cegerxwîn dest ji melatiyê berdide, diçe du gundan ava dike. Dixwaze rewşa gundan li ser esasên wekhevîyê be. Lê pir naçe gundî li hev nakin û Cegerxwîn dest ji gundîtiyê berdide û tê Amûdê. Li wir Cegerxwîn û hevalên xwe li hev dicivin û biryara sazkirina komeleyekê didin. Sala 1937an Komeleya Ciwankurd saz dikin.

Pir nadome, kolonyalîstên Fransa vê komeleyê digirin. Derheqê karê komeleyê de Cegerxwîn di pirtûka xwe de wisa nivîsiye:

Ev cara yekem e ku Kurdên Cizîrê, xortên kurd bi zimanê zikmakî dixwînin, tarîx û rewşa milletê kurd dibihîsin. Cara yekem e ku stran û xweşxanên kurdî bi dengê bilind li nav bajarê Amûdê têne gotin. Jin bi lîlan û mêr bi demaŋeyan bersiva me didan.

Sala 1946an Cegerxwîn tev li Rêxistina Xoybûnê dibe û tê de kar dike. Navê Xoybûnê diguherînin û dikin Civata Azadî û Yekîtiya Kurdistanê.

Di sala 1949an de Cegerxwîn dibe hevalê komunîstan. Vê gavê girtin û lêdan jî bi serê wî de tînin barandin.

Cegerxwîn heta sala 1957an bi xurtî, bi komunîstan re xebitiye. Serokatiya Komîteya Aştî li Cizîrê kiriye. Piştî ku hevkaruya Cegerxwîn û komunîstan vediqete, Cegerxwîn bi hevalên xwe re Rêxistina Azadî saz dikin. Sala 1958an jî bi Partiya Demokratî Kurdî re dibin yek. Partî, sala 1959an Cegerxwîn dişîne Kurdistana Îraqê. Cegerxwîn li wir, li Bexdayê di Unîversîteyê de dersên kurdî, zaravayên kurmancî dide xortên kurd. Piştî ku navbera kurdan û hikûmatê xirab dibe, Partiya Demokrat xwe dikişîne serê çiyayan, di sala 1962yan de hikûmeta Îraqê bera Cegerxwîn dide û Cegerxwîn vedigere Kurdistana Sûriyê. Sala 1957an di kongreya Partiya Demokratên Kurd li Sûriyê de Cegerxwîn tê hilbijartin ji bo Komîteya Merkezî ya partiyê. Heta dawiya jiyana xwe jî Cegerxwîn endamê Komîteya Merkezî ya Partiya Demokratê Kurdên Pêşverû li Sûriyê bû.

Sala 1969an Cegerxwîn car din diçe Kurdistana Îraqê û li şoreşê nêzîkî salekê dimîne. Sala 1973yan ji ber sitemkariya hikûmeta Sûrî Cegerxwîn diçe Lubnanê û heya sala 1975an li wir dimîne. Sala 1979an Cegerxwîn diçe Swêdê. Pênc salên dawî jî jiyana xwe li Swêdê derbas dike. Di roja 22'yê Kewçêrê di sala 1984an de li Stockholmê wefat kiriye.⁴⁸

⁴⁸Cegerxwîn (2007), r. 8-9-10.

2.1.2. Mexlesa Wî

Cegerxwîn piştî 1925an hêdî hêdî dest bi nivîsandina helbestan dike. Wî heta sala 1930an di bin navê mexles “Şêxmûs Mûsa” yan “Şêxmûsê Hesarê” de helbestên tesewûfî bi navekê din î mistîkî yanê klasîkî dinivîsandin.⁴⁹

Cegerxwîn cara ewil di dawiya helbesta xwe ya “Bi Kurtî Jîna Min” de mexlesa xwe ya Cegerxwîn dibêje:

Ev cîhana xapînok heta me jê xwe nas kir

Çi b’kim fêde nemaye emrê xwe min xelas kir

Çima rastî dibêjim li nav dîna bûme dîn

Heta bimrim ji nû ve xelk ê bêjin Cegerxwîn.⁵⁰

Berî ku ew ji kovara Hawarê re helbestan binivîse, wî demeke kurt jî beqalî kiriye û bi vî şuxulî debara xwe kiriye lê bi vî karî jî tiştekî zêde qezenc nekiriye. Lewma dest ji vî karî jî berdaye û careke din dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Êdî ji wê demê û bi şûn de bi navekê mexles “Cegerxwîn” an “Cegerxwînê Kurd” helbest nivîsandine.

Cegerxwîn tê wateya cîger û xwînê yanê cîgera bi xwîn. Ji bo çî wî ev nav bi kar aniye wiha şîrove dike: “Min bi çavê xwe rewşa ku miletê kurd tê de dijiya, belengazî û feqîrtiya wî dîtiye û wê tecrubeya nexweş û tehl tesîr li min kir ku ez navê xwe deynim wek Cegerxwîn. Jixwe min dixwest bi vî navî tiştekî bînim zimên.” Gotina Cegerxwîn rast e, di zargotina gel de jî biwêjên ku qatlîam û kirêtên hov tînin zimên hene, mînak: “cîgera min perçe kir”, “xwîn kire cîgera min” û “xwîna cîgera min miçiqand.” hwd.⁵¹

Helbesta Cegerxwîn a yekemîn di hejmara Hawarê ya çaran di meha pûşpera sala 1932yan de der çûye. Navê helbestê “Soza Welat” bû. Helbesta Cegerxwîn a herî dawî ku di

⁴⁹ Kaynak, r. 24.

⁵⁰Cegerxwîn (2011), *Agir û Pirûsk*, Çapa şeşan, Weşanên Avesta, İstanbul. r. 280.

⁵¹ Kaynak, r. 31.

Hawrê de hatiye weşandin jî di hejmara 57an (15 Tebax 1943) de bi navê “Ez û Yar” der çûye.⁵²

2.1.3. Xwendina Wî

Me ev beşên xwarê yê di derbarê xwendina Cegerxwîn ji pirtûka wî ya bi navê ‘Jînenîgariya Min’ û pirtûka Yusuf Kaynak ya bi navê ‘Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî’ wergirtine:

“Wekî ku min berê jî gotî em heyamekê li gundê Bêdermemoyê bûn. Melayê gundê Bêdermemoyê Mele Seîd ji min pir hez dikir û li mala xwe ez xwedî dikirim. Xanima wî Eyşê pirî caran serê min dişuşt û ez xwedî dikirim. Gelek caran ez li mala wan radizam û xwarin û vexwarina min li mala wan bû. Bi rastî jî wekî dayika min li min xwedî derdiket. Sê kurên wê û keçeke wê hebû: Salih, Namo, Huseyn û keça wê Sekina.”

“Mele Seîd ders dida zarokên gundê û zarokan jî di karûbarên malê de alîkariya wî dikirin û ji wî re ji çiya êzing dianîn. Min li ber destê Mele Seîd dest bi xwendina Qur’an’ê kir û gava ez vegeyriyam Hesar’ê min li ber destê meleyeke jin tamam kir. Navê wê jî Xoce bû. Xoce jî ji min pir hez dikir û ez di dersên xwe de pir serkeftî bûm. Min nîviya Qur’an’ê xwe bi xwe jiber kiribû. Navê Xoce Zeyneb bû û her tim ji min re digot:

- Xwedê te bihêle. Tu çi qas zarokekî jîr û jêhatî û baş î.

Min ji derwêşan pirî stran û helbest jiber kiribûn. Min ev ji jinan re dixwendin wan jî her tim digiriyan digotin: “Xwedê te bihêle lawo.”⁵³

Cegerxwîn gava dibe hejdeh salî êdî bi xwe biryara jiyana xwe dide û dibêje ez ê bixwînim. Li ser vê biryara wî ew û birayê xwe Xelîl li hev nakin û şer dikin. Cegerxwîn di pirtûka xwe ya Jînenîgariya Min de wiha behsa vê biryarê û bûyerê dike:

“Min dixwest bixwînim lê birayê min Mele Xelîl nedixwest ez bixwînim. Meseleya xwendinê di navbera me de bû sedema şerê me. Me rahişt çûv û keviran û me li hev dixist. Paşê jî me dev ji kevir û çûvên xwe berda û em rûniştin me hevdu hembêz kir û em têr giriyan. Min dubare kir:

⁵² Kaynak, r. 32.

⁵³ Cegerxwîn (2003), r. 59-60.

- Tu çareke din tune ye û ez ê ji vir herim û bixwînim.
- Nexwe, çi tiştê me hebe em parve bikin û paşê tu here.

Me du-sê rîspî anîn û malê xwe parve kir. Kerek û çêlekek ji min re, gayek û çêlekek jî ji Mele Xelîl re ma. Lihêv û nivîn jî ji wî re man. Paşê min çêleka xwe jî da wî û min got:

- Ê ku here xwendinê dê çi bi çêlekê bike?⁵⁴

Cegerxwîn êdî bi xwe li ser jîyana xwe biryar dide. Biryara wî ew bû ku bikeve medreseyan, bibe xwendevan û bixwîne. Hîç dem naborîne vê biryara pîroz pêk tîne. Êdî ji wê rojê paş em Cegerxwîn di medreseyan de dibînin. Cegerxwîn di medreseya Seydayê Mele Ibêdilâhê kûlatî de, dest bi xwendinê dike. Ji ber zekaya xwe ya tûj gelek zû bi ser dikeve. piştî pêşveçûneke normal derdikeve gera başûrê welêt û rojhilatê. Wan deveran gelek rind dadihûrûne û qasekê jî di medreseyan wan deveran de jî dixwîne. Dû re vedigere Amûdê û xwendina xwe didomîne.⁵⁵

Cegerxwîn gava behsa salên xwe yên medreseyê dike navên hinek meleyên navdar yên hingê dike û dibêje: Ji Amûdê Mele Ubeydullah, ji Dêrikê Mele Îskender, ji Farqînê Mele Huseynê Kiçik û ji Hewlêrê Mele Kiçik Efendî. Ji Koysencaqê Mele Mihemed Cilîzade jî ji wan kêmtir nebû.⁵⁶

Cegerxwîn, Ewamîl, Zirûf û Terkîbê yanî sê pirtûkên bingehîn di nava salekê de xilas dike. Cegerxwîn xwendina xwe ya medreseyê ya dînî ku diviya di pazdeh salan de biqedanda, di 8 salan de qedand. Wî xwendina xwe li cem Şêx Ubeydullah li Diyarbekirê domand lê berî ku îcazeta xwe bigire Şêx Ubeydullah çû ser heqiya Xwedê û wî jî îcazeta xwe di sala 1928an jî destê birayê Ubeydullah ê biçûk Mela Fetullah wergirt.⁵⁷

Cegerxwîn gava xwendin qedand û îcazeta xwe stand; bêrawestan riheke dirêj berda; cube li xwe kir û bû melayê gundekî. Cegerxwîn, bi destpêkirina xwendina medreseyê re, derence bi derence dest bi nivîsandina helbestan kiriye, jixwe ji hemû zanînan zêdetir kêfa wî ji helbestan re dihat.⁵⁸

⁵⁴ Cegerxwîn (2003), r. 83.

⁵⁵ Sağniç, r. 551.

⁵⁶ Cegerxwîn (2003), r. 89.

⁵⁷ Kaynak, r. 21.

⁵⁸ Sağniç, r. 552.

2.1.4. Zewaca Wî û Zarokên Wî

Piştî ku Cegerxwîn medreseya xwe li Diyarbekirê qedand, di eynî salê de yanî 1928an vedigere diçe cihê kul ê ji dayik bûye ango gundê Hesarê. Li wê derê bi keça xalê xwe re dizewice û piştî kurtedemekê vedigere, tê Amûdê.⁵⁹

Cegerxwîn bi xwe wiha behsa zewaca xwe dîke: “Pêşîya ku min îcazeta xwe hilda divê ez zewicîbûma û min meletiya gundekê jî heq bikira. Birayê min, jinbira min û mriovên min yên din dixwestin ku ez bi keça xalê xwe yê Mistefa re bizewicim. Navê keça xalê min jî Kehla bû. Her wiha li Amûdê du keçikên bi navên Hesîne û Cemîle hebûn ku dixwestin b imin re bizewicin. Hindik mabû ku ez bi Cemîlê re bizewicim. Lê ji ber ku xizmetkara Şêx Heybetullah bû min biryara xwe guherand. Hesîne jî jinebî bû û ji kurê Seydayê min Mihemedê Pîran cuda bûbû. Min jî nedixwest ez bi yeke jinebî re bizewicim. Ji min re gotin ku: “Birayê te keça xalê te aniye sînor. Hespekî û berbûyekê bişîne da ku werin.” Min jî hespek û berbûyek ji sînor re şand û keça xalê xwe anî Amûdê. Piştî ku keça xalê min hat Amûdê bi dawet û kêf û şahiyê ve em bûn bûk û zava.

Kurê min Cemşîd di sê saliya xwe de Xurşîd jî di sala xwe de mirin. Bi rastî ez ji bo mirina wan negiriyam. Min ji diya wan re jî got divê tu negirî. Lê ma mimkun e ku dilê dayikan rihet be. Min birayê xwe Xelîl jî anî cem xwe û em bi hev re dijiyan. Şeş heb zarokên me ji nexweşiya sorikan mirin. Birayê min kurikek (Zubeyr) û du keçik (Eyşan û Enîse) man. Yê min jî du kurik (Keyo û Azad) û pênc keçik (Sînem, Gulperî, Rojîn, Benîsueda û Haştî) man.⁶⁰

Em çûna Cegerxwîn ya Ewropayê ji pirtûka wî ya bi navê ‘Jînenîgariya Min’ de wiha dibînin: “Êdî em bi malbatî li Stockholmê ne. Malbata min 15ê Berfanbara 1979an hatin ba min. Ewil biraziyê min Zibêr Xelîl Hesên û kurê min Keyo Şêxmûs Hesên hatin. Zavayê min Mihemed Silo jî ji rêya ku Keyo û Gulperî tê de hatin de hat. Zarokên min yê din nehatin.⁶¹

⁵⁹ Kaynak, r. 23.

⁶⁰Cegerxwîn (2003), r. 199.

⁶¹Cegerxwîn (2003), r. 376.

2.1.5. Wefata Wî

Cegerxwîn pênc salên xwe yên dawî li Swêdê derbas dike. Gava sala 1979an diçe Ewropayê li wir jî dest ji xebatên netewî bernade û beşdarî pir civînên kurdên Ewropayê dibe.

Cegerxwîn yek ji sazgerê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê jî bû. Ew enstîtu di sala 1983yan de ji aliyê hinek rewşenbîrên kurd ên ku li Ewropayê dijîn ve hat damezirandin. Cegerxwîn jî wek Qanatê Kurdo, Tewfîk Wehbî, Îsmet Şerîf Wanlî, Yilmaz Guney û Kendal Nezan endamên sazgeriya enstîtuyê ne.

Êdî ev salên Cegerxwîn ên dawî ne, ew êdî giran bûye, jixwe aciz e û êdî diêşe, nikare ji dil û can çalakiyên xwe bimeşîne. Di sala 1984an de nivê şevêsaet di sisêyan de li malê di nav lêzimên xwe de bi nexweşiya dilsekinînê çû heqiya Xwedê.

Cegerxwîn êdî li dinê tune bû. Ji bo serxweşiyê li Stockholmê merasîmek hat çêkirin, ji malbata wî re serxweşî dihatin xwestin û heval û nasên wî li wir hazir bûn. Li ser wefata Cegerxwîn li Stockholmê bi fermî jî merasîmeke serxweşiya malbata Cegerxwîn hat amadekirin, gelek rêxistin û şexsiyetên kurd di serxweşiyê de cih girtin û li ser çalakiyên Cegerxwîn ên edebî û siyasî-rêzanî dûr û dirêj axivîn. Yek ji wan wezîra Swêdê ya Karûbarên Penaberan, Anita Gradin bû. Anita Gradin di axaftina xwe de wiha digot: "Pir xemgîn im li ser mirina Cegerxwîn. Ew ji bo gelê kurd kêmasiyeke mezin e. Cihê wî divê vala nemîne. Belê Cegerxwîn ji bo gelê kurd pir girîng bû." Di 2'yê Sermawez (meha yanzdeh) a 1984an de cendekê mamoste şandin Parîsê, çunku ew endamê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê bû, divê li wir jî merasîmek bihata çêkirin. Di vê merasîmê de gelek kurdên rewşenbîr ên li Ewropayê ku li sirgunê dijiyan û berpirsyarên rêxistinên kurd û çend tirkên li Ewropayê hemû amade bûbûn. Enstîtuya Kurdî ya Parîsê bi afîş û çeleng û wêneyên mamoste Cegerxwîn hatibû xemilandin. Ji Moskowê heta New York'ê ji enstîtuyê re mesajên serxweşî hatibûn şandin û dihatin xwendin.

Li gorî wesiyeta Cegerxwîn divê cendekê helbestvan li Qamişlo'yê di bexçeyê mala wî de bihata çalkirin. Helbestvan digot: "Ev mal min bi arîkariya heval û nasan çêkriye, yekane milkê min î li vê cîhana bêser û binî ye." Cendekê Cegerxwîn bi balafirê şandin Şamê. H.C. çûyîna Şamê û merasîma ku li Qamişloyê hatibû amadekirin wiha tîne zimên: "4'ê Sermaweza 1984an de di saet 09:00'ê êvarê de balafirgeha Şamê ji kurdan tijî bûbû. Odeya

rûniştinê û ya mêvanan a balafirgehê jî ji kurdên welatparêz û berpirsyarên komele û rêxistinên kurd tijî bûn. Hatina cendek ji aliyê balafirgehê ve hat îlankirin; cendekê Cegerxwîn li ser destan ji balafirê hat girtin û ji aliyê kurdên li wê kom bûbûn de bi gulan hatin xemilandin. Tabûta ku bi gulan hatibû xemilandin li ser milan birin di ambûlansê de bi cih kirin û di nîvê şevê de bi rê kirin ku here Qamişloyê. Wê şevê xelkê Qamişloyê ranediket. Lambeyên malan hemû pêxistîbûn. Tu kesî nedixwest ku roja din biçe karê xwe û rûniştibûn heta ku roj hilat û çavnêriya cendekê mamoste dikirin. Kurdên Sûriyeyê bi taybetî xelkê Qamişloyê bêaram li hêviya helbestvanê mezin man û dixwestin ji bo dawîtirîn car bi qêrîn, bibêjin: “Helbestvanê mezin nemir e!” Ji Tirkiyeyê kurdên li derdora Dêrik, Cizîrê û Mêrdîn û Nisêbîn û hembajariyên Cegerxwîn li Kercewsê û heta xelkê Efrîn û Çiyayê Kurd li Sûriyê ji bo gorkirina mamoste dihatin Qamişloyê. Hemûyan lez dikir bigihijîn Qamişloyê. Wexta cendekê mamoste hê di nîvê rêka Qamişloyê de bû dirêjîya otomobîlên dihatin Qamişlo nêzîkî 20 km bû.”⁶²

Li gorî kovar û rojnameyên kurdî yê cuda cuda ji 100 hezarî zêdetir kes li Sûriyeyê li Qamişloyê, wezîfeya xwe ya dawî ji bo Cegerxwîn anîne cih û bi girî, hêvî û kulîlkên rengareng hatiye rêkirin. Ji sed hezar kesî zêdetir li ser cenaze kom bûn, xatirê xwe ji Mamosteyê mezin xwestin. Ev roj, wek roja mahşerê bû, bajarvan, gundî, cotkar, jin û mêr, kal û pîr bi cilên rengîn meydan û kûçe tijî kiribûn. Hindek digiriyan, hinekan distran. Cenazeyê Cegerxwîn bi kulîlkên sor hatibû xemilandin. Bi hezar mirovan bi yek dengî digotin: “Cegerxwîn nemir e û namire!”⁶³

2.2. Berhemên Wî

Cegerxwîn hêj di destpêka melatiya xwe de hêdî hêdî dest bi nivîsandina helbestan kiriye. Heta niha şazdeh berhemên Cegerxwîn li cihên cur bi cur hatine çapkirin û weşandin.

2.2.1. Cîm û Gulperî

Cîm û Gulperî pirtûkeke serpêhatiyan e, 44 rûpel in û di sala 1947an deli Şamê çap bûye. Naveroka pirtûkê serpêhatiya lawikekî bi navê Cîm û keçikeke bi navê Gulperî ye. Her

⁶²Kaynak, r. 57-58.

⁶³ Kaynak, r. 59.

du ciwanên hemgundî û hemsal bi hev re diçin dibistanekê. Dû re ji bo xwendina navîn diçin bajêr û li wir dilketiyê hev dibin. Bi salan peywendiyên xwe ji heval û nasan vedişêrin; dû re her tişt eşkere dibe û Cîm û Gulperî jî evîna xwe aşkera dikin.

Nivîskar di vê serpêhatiyê de rexne li jiyana feodal dike û li hemberî vê jiyanêramanên xwe yê bedbîn radixe ber çavan. Serpêhatî wek tefsîra erdnîgariya Kurdistanê hatiye neqîşandin.⁶⁴

2.2.2. Reşoyê Darê

Ev pirtûka biçûk ji 44 rûpelan pêk tê û wekî kurteçîrok hatiye nivîsandin û di sala 1956an de li Şamê hatiye weşandin. Cara duyemîn li Swîsreyê di sala 1973yan de ji aliyê rêxistina kurd “Ronahî” ve hatiye çapkirin.

Reşoyê Darê yanê Reşoyê ji gundê Darê. Navê Darê ji keyserê Îranê yê kevn Darius tê û hê jî bi vî navî li Kurdistana Îranê gundek heye. Nivîskar xwestiye bi vî navê dîrokî balê bikişîne ser tarîxa kevn û her çî qas serpêhatî di dema me de qewimîbe jî. Babeta vê kurteçîrokê li berxwedana gundiyan e li dijî axayekî kedxwar. Di dûmahîka kurteçîrokê de ew gundî di bin zordariya axa û burokasî û cendirmeyan de dimînin û ji hev diqetin û bêtaqet dimînin. Dû re mecbûr dibin ku welatê xwe terk bikin û koçber bibin. Dîsa Cegerxwîn di kovara Hawarê de bi navê “Behramê Gur” kurteçîrokek nivîsiye ku heta niha li tu cihê din nehatiye weşandin. Di vê kurteçîrokê de serpêhatiyê kevn a li ser şahê Îranê yê bi navê Behram rêberî me dike ku ew çawa xwînmij û wêranker bûye. Cegerxwîn ji bo rewşa nebaş berçav bike gelek motifên mîtolojîk û folklorîk bi kar tîne.⁶⁵

2.2.3. Gotinên Pêşyan

Gotinên pêşyan wek pirtûkeke metelokan tê naskirin. Ev berhema Cegerxwîn a pêncan e; û bi tîpên latînîyên kurdî ye; bi temamî 64 rûpel in û cara yekemîn di sala 1957an de li Şamê hatiye weşandin. Nivîskar pirûk bi du beşan weşandiye û ji 64 rûpelan pêk hatiye (ne diyar e bê ka beşa yekemîn an jî her du beş bi tevayî 64 rûpel in). Di pirtûkê de çî qas metelokan yanê gotinên pêşyan cih girtine ew jî ne diyar e, çunkî tu nusxeyên wê di destê

⁶⁴ Kaynak, r. 63.

⁶⁵Kaynak, r. 63-64.

me de tune ne. Li gorî agahiyên ku tên zanîn mamoste Cegerxwîn berî mirina xwe ev pirtûk nû ve berfireh kiriye, lê mixabin hê çap nebûye.⁶⁶

2.2.4. Gulistan

Cegerxwîn bi navê Gulistan di salên 1960'î de kovareke nehênî ji komê kurdên Sûriyeyê yê derdora xwe re diweşîne. Li ser vê kovarê agahiyeke me ya zêde tune ye. Cihê ku kovar çap bûye ne diyar e. Wekî tê zanîn kovar bi dizî li Sûriyeyê hatiye çapkirin û belavkirin. Kovar bi naveroka xwe kulturî û siyasî bûye.

Li gorî zanînan, Cegerxwîn bi navê mexles "Gulistan" wekî sernivîsar ji kovarê re nivîs nivîsîne, lê van pirsan hê jî bersiv nedîtine; çend hejmarên kovara Gulistanê der çûne? Kovar hefteyî yan mehane bûye? Cegerxwîn bi temamîçend nivîs jê re nivîsîne? Çend helbest tê de weşandine? Kes nikare ji serê xwe agahdariyeke bê çavkanî li ser van pirsan bide.⁶⁷

2.2.5. Awaw û Destûra Zimanê Kurdî

Awaw û Destûra Zimanê Kurdî, bi kurtî rêziman û verêsa (îmla) zimanê kurdî ye. Ev pirtûk wekî pirtûkeke hînkariya kurdî hatiye amadekirin bo dersdariyê. Bi taybetî pirtûk 206 rûpel in û ji bo perwerdehiya kurdî ya li Îraqê hatiye amadekirin û di sala 1961'ê de li Bexdayê bi arîkariya Zanîngeha Bexdayê hatiye weşandin. Ev rêziman ji xwendevanên kurd ên Îraqê re ji bo hînkirina zimanê kurdî hatiye çêkirin, zimanê Îraqê yê fermî erebî ye, ji bo vê yeke jî pirtûk bi tîpên erebî-kurdî hatiye hazirkirin. Çawa tê zanîn Cegerxwîn ev pirtûk berî mirina xwe nû ve fireh kiriye, lê çî mixabin ew jî hê nehatiye çapkirin.⁶⁸

2.2.6. Ferhenga Kurdî

Ferhenga Kurdî ji du beşan pêk tê û tevî hevdu 537 rûpel in. Ew ferheng cara yekemîn di sala 1962'yan de li Bexdayê bi arîkariya Zanîngeha Bexdayê û Wezaretê Perwerdehiya Îraqê hatiye çapkirin. Cegerxwîn ev ferheng bi tîpên erebî ji bo xwendevanên kurd ên

⁶⁶ Kaynak, r. 64.

⁶⁷ Kaynak, r. 64.

⁶⁸ Kaynak, r. 65.

Zanîngeha Bexdayê çêkiriye. Ferheng bi tenê ji peyvên kurmancî hatiye amadekirin (hinek bêjeyên soranî jî tê de hene); û ji tîpa A heta tîpa E hatiye qedandin û yên din hêj nehatine xelaskirin.

Cegerxwîn ev ferheng jî berê mirina xwe careke din berçav kiriye ji bo çapa duyemîn, lê ew jî hê nehatiye çapkirin.⁶⁹

2.2.7. Salar û Mîdya

Salar û Mîdya wekî kurteçîrok e û temamî 30 rûpel e û di sala 1973'yan de li Beyrûdê hatiye çapkirin. Di vê serpêhatiyê de nivîskar vê dide neqîşandin; lawikekî feqîr û belengaz dilketiyê kça axyekî dibe; Salar lawikekî feqîr e; Mîdya jî keça axayekî dewlemend e. Dû peywendiyê kurt re tê xuyakirin ku ev her du ciwan ji hevdu hez dikin û jixwe bi ramanên xwe siyasî jî hemfikir in. Di dawiya van peywendiyên de biryar didin ku bi hev re bizewicin. Ev biryar jî dibe mizgîniya destpêka jiyaneke nû ji van her du ciwanan re. Pirtûka bi navê "Salar û Mîdya" cara duyemîn di sala 1991'ê de li Stenbolê di nav "Weşanên Med" de hatiye weşandin. Di çapa duyemîn de kurteçîroka jiyana Cegerxwîn jî lê hatiye zêdekirin. Çapa duyemîn 42 rûpel in; çawa kut ê zanîn serpêhatiyê bîngeha navê xwe ji du navên dîrokî "Salar" û "Mîdya" girtiye. Cegerxwîn bi hişyarî ev nav bi kar anîne; daxwaza wî ji wan navan divê kurd hinekî li ser bûyerên tarîxa xwe mijûl bibin.⁷⁰

2.2.8. Tarîxa Kurdistanê

Ev berhema Cegerxwîn ji 4 cildan pêk hatiye û her du cildên pêşîn li pey hev di sala 1985 û 1987an de li serbajarê Swêd Stockholmê ji aliyê weşanxaneyê "Roja Nû" ve hatine weşandin. Di cilda yekem de Cegerxwîn behsa binemalên kurdan (eslê wan), ol û dewletên wan kiriye. Cilda yekem tarîxa kurdan heya qonaxa Îslamiyetê tîne û berçav dike. Di cilda duduyan de jî ji Îslamiyetê vir de heta sedsala 19an şîrove dike; divê navbeynê de çî xanedan û dewletên kurd saz bûne yek bi yek di bin sernavên kurt de dabeş û şîrove kirine. Cilda yekem ji 216 rûpelan pêk hatiye û ya duduyan 250 rûpel e. di pêşgotina ji b ovan cildan nivîsî de Cegerxwîn dibêje ku ev karê dîroknivîsî nêzîkî 20 salên wî girtiye. Di pêşgotina xwe de

⁶⁹ Kaynak, r. 65-66.

⁷⁰ Kaynak, r. 66.

dide zanîn ku ew ne dîrokzan e, lê ji bo ku tu kesî ev kar nekiriye, wî ji xwe re ev kar wek wezîfeyekê dîtiye ku çî ji dest bê di vî warî de binivîse.⁷¹

2.2.9. Folklorê Kurdî

Folklorê Kurdî, pirtûka zargotina kurdî ye û li Stockholmê ji aliyê Roja Nû ve di sala 1988an de hatiye weşandin. Ev karê Cegerxwîn ji du cildan pêk hatiye. Cildê yekemîn bi tevahî 200 rûpel e. Cilda duyemîn hê nehatiye weşandin. Cilda yekemîn ji du beşan pêk hatiye. Di beşa yekemîn de heft cure stranên cih girtiye: 1. Berdan, 2. Berdestarî, 3. Helbest û Berdîlan, 4. Berbûkî, 5. Stran û Lawik, 6. Lawij, 7. Avêjê Botan.

Di beşa duyemîn de helbestên ciwanîyê û lehengiyê cih girtine. Ev navê jor ê komstranên cuda cuda ne. Bi piranî ji aliyê Cegerxwîn ve hatine dîtin û binavkirin. Di Folklorê Kurdî cilda yekemîn de du pêşgotinan cih girtiye. Pêşgotina pêşî Cegerxwîn bi xwe nivîsiye û ya duyemîn jî ji aliyê X. Lezgîn ve hatiye nivîsandin.⁷²

2.2.10. Agir û Pirûsk

Dîwana Cegerxwîn a yekemîn "Prîsk û Pêtî" di sala 1945an de li Şamê ji aliyê çapxaneyê "Tereqî" ve di nav weşanên Hawarê hejmara 19an de hatiye weşandin. Dîwana Yekemîn cara duyemîn di sala 1971ê de li Swêdê li bajarê Uppsalayê di nav weşanên "Bahoz" (bi vî navî di salên 1960 û 1970'î de rêxistineke kurdan hebû li Ewropaya Rojava) de çap bûbû. Zanîna ku me ji pêşgotina Bahozê girtiye, çapa Dîwana Yekemîn a Şamê ji ya Uppsalayê xerabtir bûye, çapa Bahozê jî li gorî standartên Ewropeyê ew qasî ne baş û birêkûpêk e. Jixwe çapa duyemîn jî ji aliyê çap û dîtbarî ew qas baş nîn e.

Dîwana Yekemîn tevî dîwana duduyan Sewra Azadî di sala 1992yan de cara sêyemîn li Tirkîyê cara sêyemîn ji aliyê "Weşanên Deng" ve hatiye çapkirin. Dîwana Yekan û Sewra Azadî wek dîwaneke tevî pêşgotineke Ferhat Can ji nû ve ji bo xwendevanên kurdên li Tirkîyê

⁷¹ Kaynak, r. 66-67.

⁷² Kaynak, r. 68.

dijîn tenê bi kurdî hatiye weşandin. Çapa sêyemîn a her du dîwanan tevî hevdu 480 rûpel in û ji aliyê çap û dîtbarî ve ciwantir in ji her du çapên pêşîn.⁷³

2.2.11. Sewra Azadî

Dîwana Cegerxwîn a duyemîn “Sewra Azadî” di sala 1954an de cara yekemîn li Şamê ji aliyê weşanxaneyê “Kerem” ve hatiye çapkirin. Cara duyemîn li Swêdê di sala 1979an de ji aliyê rêxistineke kurd “Pale” ve hatiye weşandin. Cara sêyemîn di sala 1992yan de li Stenbolê ji aliyê “Weşanên Deng” ve tevî Dîwana Yekemîn mîna yek pirtûk çap dibe. Ew her du çapên pêşîn ji bo bidestneketina dîwanan pêwîstî pê hatiye dîtin ku ji nû ve bînin çapkirin.

Sewra Azadî tevî hev 212 rûpel in û ji 117 helbestan pêk hatiye. Temayên helbaestan li gorî naverokê wiha dabeş dibin: a) helbestên li ser welatevîniyê, b) helbestên gelemperî, c) helbestên civakî, d) helbestên evînî. Di Sewra Azadî de 1950 beytan cih girtiye û piraniya wan helbestên ciwan û marşên polîtîk in.

Di vê dîwanê de helbesta dîwanê ya herî dirêj ji 181 beytan “Serpêhatiya Ciwan û Dewletê” ye. Di dîwanê de xezel, qesîde, fabl, stranên gelêrî, marş û sirûd cih girtine, lê qesîdeyên vê dîwanê ne bi şiklê qesîdeyên li ser Mihemed Pêxember (e.s.) û ewliyayan hatine gotin; qesîde li ser şehîd û serokên kurd in.⁷⁴

2.2.12. Kî Me Ez?

Dîwana sêyemîn “Kî Me Ez?” di sala 1973yan de li Lubnanê hatiye çapkirin. Vê dîwanê navê xwe ji helbesta bi nav û deng Kî Me Ez? girtiye. Kî Me Ez? wek kronolojiya mêjûya kevin e; û li ser ol û eşîr û welatên kurdan û împaratoriyan kevin e; û li ser mîtolojiya gelên Îranî yên berê û serpêhatiyên wan e. Kî Me Ez? helbesteke lîrîk e û ji pazdeh beşan pêk hatiye; Kî Me Ez? ji aliyê hunermendê kurd ê bin av û deng Şivan Perwer ve bi kurtî û guherînan naverokî hatiye bestekirin; navê stranê Kî Ne Em? e. Kî Ne Em? wek sirûdeke neteweyî di hemû cejn û şahiyên kurdan de tê stran û xelk pê keyfxweş û serbilind dibe; hîs û fikrên millet tev dide û tu dibêjî belkî ew helbesta serhildanê ye.

⁷³ Kaynak, r. 71-72.

⁷⁴ Kaynak, r. 73-74.

Di dîwana sêyemîn de 1792 beyt hene. 12 bend ji 3 rêzikan, 520 bend ji 4 rêzikan, 18 bend ji 8 rêzikan, 20 bend ji 5 rêzikan û 44 bend ji 6 rêzikan pêk tên.

Dîwana Kî Me Ez? ji 155 helbest û 318 rûpelan pêk hatiye. Babetên van helbestan wiha dabeş dibin: a) helbestên welatevînî û şoreşgerî. b) helbestên têkoşîna neteweyî û piştgirtina navneteweyî. c) helbestên felsefî û evînî.⁷⁵

2.2.13. Ronak

Ronak dîwana Cegerxwîn a çaremîn e. Ev dîwan berhemeke nivîskar a ji bo nîşana demeke nû ye. Lewra Cegerxwîn êdî li Sûriyeyê dijî, ew êdî li Swêdê bû. Êdî Cegerxwîn azad e û êdî ew karê çapkirina dîwanên xwe bi xwe nake, lewra wî ev kar spartiyê weşanxaneyê kurd, "Roja Nû" da ku dîwanên wî yê mayîn çap bike û belav bike. Lewma Cegerxwîn di salên dawî de pir berdâr bû di karê nivîsandinê de; di navbeyna 5 salan de 5 dîwan weşandine.

"Ronak" ji aliyê Roja Nû ve di sala 1980'î de cara yekemîn li Stockholmê hatiye çapkirin. Di vê dîwanê de 62 helbestan cih girtiye û bi tevahî 208 rûpel in. Di Ronak'ê de 1707 beytan cih girtiye: ji 500'î zêdetir bend ji 5 rêzikan, 214 bend ji 4 rêzikan û 8 bend jî ji 3 rêzikan pêk hatine. Ronak ji aliyê çapê ve çaktir e. Di forma helbestan de tu guherînek pêk nehatiye. Naveroka helbestên vê dîwanê jî bi piranî li evîn û polîtîkayê ne. Li gorî babetê helbestên Ronakê li jêr li ser van navan dabeş dibin: a) helbestên welatperwerî. b) helbestên civakî û siyasî. c) helbestên evînî û felsefî.⁷⁶

2.2.14. Zend-Avesta

Zend-Avesta dîwana Cegerxwîn a pêncan e û navê xwe ji kitêba miqedes a ola Zerdeştî ya bi navê Avesta girtiye. Zend-Avesta li Swêdê di sala 1981'ê de ji aliyê Roja Nû ve hatiye çapkirin. Di dîwanê de 34 helbestan cih girtiye û pirtûk bi xwe bi tevahî 176 rûpel in. Zend-Avesta bi temamî ji 1501 beytab pêk hatiye di vê dîwanê de jî Cegerxwîn tu formeke nû bi kar neaniye. Pêşgotina Zend-Avesta ji aliyê kurdologê Sowyetê yê mezin î bin av û deng Prof. Qanatê Kurdo ve hatiye nivîsîn. Tenê pêşgotona vê dîwanê bi serê xwe 30 rûpel in.

⁷⁵ Kaynak, r. 75.

⁷⁶ Kaynak, r. 76.

Qanatê Kurdo helbestên Cegerxwîn li gorî babetê wiha dabeş dike: a) helbestên li ser adetên kevin. b) helbestên yadkirinê. c) helbestên li dijî feodalîzm û kapîtalîzmê. d) helbestên berxwedan û protestokirinê. e) helbestên evînî û felsefeyê. f) helbestên mîtolojiyê.⁷⁷

2.2.15. Şefaç

Şefaç dîwana Cegerxwîn a şeşan e ji aliyê Roja Nû ve di sala 1982yan de li Stockholmê hatiye çapkirin. Dîwana şeşan ji 42 helbest û 180 rûpelan pêk hatiye. Di dîwana şeşan “Şefaç”ê de 1728 beytan cih girtiye: 14 bend ji 5 rêzikan, 223 bend ji 4 rêzikan, 13 bend jî ji 3 rêzikan tê de cihê xwe girtine. Li gorî babetê helbest ji aliyê naverokê ve li ser van beşan dabeş dibin: a) helbestên welatparêzî, b) helbestên civakî û siyasî, c) helbestên evînî û felsefî. Helbesta Cegerxwîn a herî mezin û dirêj a ji 220 beytan pêk hatiye di vê dîwanê de cih girtiye. Navê helbestê “Jin û Jinkok” e. helbest bi forma xwe de diyalog e lê bi naveroka xwe jî şibî helbesta dîdaktîkî dibe.⁷⁸

2.2.16. Hêvî

Hêvî dîwana Cegerxwîn a heftan e di sala 1983yan de li Stockholmê ji aliyê Roja Nû ve hatiye weşandin. Ev dîwan salekê berî wefata Cegerxwîn çap bûye. Di Hêvî’yê de 94 helbestan cih girtiye û ji 186 rûpelan pêk hatiye. Di Hêvî’yê de bi temamî 1924 beytan cih girtiye. Piraniya wan ji bendên 4 an 5 rêzikan pêk hatine. Ji aliyê zimên û çapê ve her çar dîwanên li Swêdê çap bûne ciwantir in ji her sêyên pêşîn. Van her çar dîwanên dawî meriv dikare ji weşanên Roja Nû ya li Swêdê peyde bike.

Di Dîwana Heftan de jî Cegerxwîn di stîl û form û naveroka helbestên xwe de tu guherîn çênekiriyê û tim û tim li ser yek rê bi rê ve çûye. Helbesta dîwanê ya herî kurt ji pênc beytan û ya herî dirêj jî ji 195 beytan pêk hatiye. Helbestên di Hêvî’yê de li ser van babetan dabeş dibin: a) helbestên civakî û siyasî, b) helbestên gelemperî, c) helbestên evînî û felsefî.⁷⁹

⁷⁷ Kaynak, r. 77-78.

⁷⁸ Kaynak, r. 79.

⁷⁹ Kaynak, r. 80-81.

2.3. Kesayetiya Wî ya Edebî

Cegerxwîn di warê folklor û çanda kurdan de xwediyê zanîneke pir hûr û kûr bû. Ji ber ku di medreseyan Kurdistanê de xwendibû û jiyana wî bi temamî di nav kurdan de derbas bibû, ji aliyê çand û zimanê kurdan gelek tişt zanîbûn û bûbû têgihiştîyê zemanê xwe. Cegerxwîn çawa ku dest bi nivîsîna helbestan kir, em dibînin ku ev zanebûna xwe di nava helbestên xwe de nîşan daye. Cegerxwîn li ser çand û ziman û edebiyata kurdî xebatên cur bi cur kirine û hinek ji van hatine çapkirin hinek jî nehatine çapkirin. Di nav berhemên Cegerxwîn yê hatine çapkirin de ferheng, çîrokên pexşan, gotinên pêşyan, helbest û hwd hene. Ev yek nîşan dide ku Cegerxwîn ne tenê helbestvan e û yekî piralî ye.

Cegerxwîn ji destpêka melatiya xwe heta ku emrê wî xelas bûye, xebatên xwe yê wêjeyî berdewam kirine. Cegerxwîn hemû rastiyên jiyane bi çavê xwe dîtîye û jiyaneke pir çalak jiyaye. Vê yekê jî ew, di warê wêjeyê de ji helbestvanên hevdema wî cuda kiriye. Her kurdek dikare xwe di nava helbestên Cegerxwîn de bibîne. Lewra Cegerxwîn jiyana kurdên gundî û bajarî û deştî û çiyayî pir baş dizanî û jiyana wan diherikand nava helbestên xwe. Lêkolînerê Wêjeya Kurdî Feqî Huseyn Sagniç di derheqê wî de wiha dibêje:

“Cîgerxwîn hozan e. Hozanekî civatî, evîndarî, siyasî, welatparêz, neteweyî û pêşverû ye. Di giraniya helbestên xwe de, wêjeya gel bilind kiriye. Ango biz anîn û zimanê gel nivîsandiye. Di giraniya helbestên wî de, welatparêziya wî bi rewşeke vekirî dixuye. Ev rê û rêçika ku daye pêş xwe, bêguhertin heta mirinê bi pêşveçûneke pîvane domandiye û pêşve çûye.”⁸⁰

Helbestên Cegerxwîn ji aliyê dirûv û teşeyê ve klasîk in û bi malikên edebiyata klasîk hatine nivîsîn. Lê belê ji aliyê naverokê ve Cegerxwîn nûjen e û mijarên edebiyata nûjen ya rojavayî xistina nava helbestên xwe.

2.3.1. Zimanê Wî

Cegerxwîn navdartirîn nivîskar û helbestvanê kurdî ku bi hostatî folklor û zimanê kurdî gelêrî bi kar aniyê ye. Di dema xortî û xwendina xwe de bi salan ew li Kurdistanê daniştîye û li hemû Kurdistanê geriyaye. Lewra wî bi hemû zaravayên kurdî dizanî. Berhemên Cegerxwîn ji aliyê orîjînalîte û dewlemendiya bêjeyan ve bêguman çavkaniyên nehên dîtin in.

⁸⁰ Sagniç, r. 552.

Di wan de gelek detayên tradîsyon, orf û adet û exlaq û rewşa jiyana civakî tên ber çavan. Wekî: tu dikarî van pergalan (hacet) hemûyan di helbestên wî de bibînî: pergalên eşxane; çaydan, cezweyê qehwê, elbik û kaw û kacaxên paxir û heya parzûna rûn jî. Car caran pêşanî dide bi kurdiyêke paqij derbarê konê koçeran de ê reş, car caran jî pêşaniya xaniyên cotkar û gundiyan kurd ên wek şkeftên di quntarên çiyayan de dide; mînak: wekî helbesta “Xaniyê Cotkar”:

Xanîkî kûr û teng, li dor çar dîwar,

Li ser wî pûş û li bin beşt û dar.

Sifirne û şirik bi kunc û eywan,

Bi kulek û refik him bi nêrdewan.

Herçar dîwarên wî jî ax û av,

Mal û sermiyan zar û zêç di nav.⁸¹

(...)

Di helbestên xwe da Cegerxwîn navên hemû pergalên ku di malên gundiyan de tên dîtin û bi kar tînin yek bi yek bin av kirine. Wekî: kulav, balîf, mitêl, beroj, meşk, misîn û legan, bêjing, hestîl, xaçigan, ber û zengil, bivir û destar, kevgir, berfmal, heçî û werîs, tûr û têt, şûzin û derzî, kilîm û xalî û hwd. Wek hacetên waran û zozanan jî di “Xaniyê Cotkar” û “Konê Reş” de yek bi yek anîne zimên. Ew pêşanîdan bi zimanekî pir hêsan hatine teswîrkirin. Hemû kurdên kurmançîaxêv bê pirsgirêk û guman dê jê fêhm bikin.

Cegerxwîn car caran li ser erdnîgariya Kurdistanê diaxive; car caran li gel çem û rûbaran qise dike. Wekî: Çemê Xabûr yek ji van e. Ew bi xwe ji derdora çiyayên Hekarî dizê û diherike digîje çemê Dîcleyê li derdora Zaxoyê.

Cegerxwîn xisûsiyeteke xwe ya pir taybetî heye ew jî stîla wî ye. Ew vê stîla xwe ji bo erdnîgariyê bi kar tîne. Ji bo helbestên fabilî û evîniyê jî vê stîla xwe bi kar tîne. Mînak: “Şam Şekir e Welat Şêrîntir e.” Mirov dikare van helbestan bêwestan di nefesekê de bixwîne.

⁸¹Cegerxwîn (2011), *Agir û Pirûsk*, Çapa şeşan, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 102.

Cegerxwîn pir baş dizanî ew ê çawa ramanên xwe bi rêgaya helbestê, bi hevokên kurt û paqij bîne zimên. Bê zehmetî mirov dikare wan bixwîne û ji wan fêhm bike. Wî zimanekî paqij û xweşaheng bi kar aniyê.

Nivîskarê kurd ê li Ewropa dijî, Rojen Barnas li ser ziman û helbestên Cegerxwîn ev rave kiriye: “Cegerxwîn bi zimanê xwe î paqij û hêsan mîna Melayê Batê ye, çunkî Cegerxwîn û Melayê Batê helbestên xwe ne ji bo elîtê, lê ji bo gel nivîsandine. Belkî bi vê rêgê bigihijin armanca xwe. Cudatiya di navneynan her du nivîskar û helbestvanan de Melayê Batê angajeya propagandaya ji bo Hz. Muhammed (e.s.w.) û ola Îslamê bûye. Cegerxwîn ji bo Kurdistanê azad.”⁸²

2.3.2. Helbestvanên Ku Li Ser Tesîr Kirine

Cegerxwîn di medreseyan Kurdistanê de xwendibû û helbestvanên edebiyata kurdî ya klasîk nas kiribûn û xwendibûn. Di pirtûka xwe ya bi navê Jînenîgariya min de wiha behsê vê mijarê dîke:

“Êdî dema vegera me ya Tilşeyê bû. Me berê xwe da Cizîrê û em vegeriyan çûn û ji sînor derbas bûn û em ihaştin Tilşeyê me ya xweşik û delal. Tilşeyê gelek bi kêrî min hat. Min nexweşiya xwe ji bîr kir. Li wir min dîwanên Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrê û Anter⁸³ xwendin. Ev pirtûk her tim li ber serê min bûn. Min bi dengê bilind ji wan dîwanan malik dixwendin. Dengê min jî pir xweş bû û kê ez guhdar dikim dest bi giriyê dikim.”⁸⁴

Ji xeynî van helbestvanên kurd yê klasîk Cegerxwîn ji Nazim Hikmet ê nivîskar û helbestvanê tirk pir hez kiriye. Di derheqê heman mijarê de kurê Cegerxwîn van agahiyan dide:

“Cegerxwînê gorbihîşt bi hemû zaravayên kurdî dizanî: kurmancî, soranî, goranî û zazakî. Wî bi zimanê farsî, erebî û tirkî jî dizanî. Wî ji nivîskar û helbestvanan ji Nazim Hikmet ê tirk î bin av û deng pir hez dikim, rexneyên xwe jî lê dikim. Ji ber ku Nazim Hikmet piştgiriya gelê kurd ê bindest nekiriye û di tu nivîsarên xwe de neaniye zimên.”⁸⁵

⁸² Kaynak, r r.154-158.

⁸³ Anter: Pirtûkeke ku di medreseyan de tê xwendin e û di nava wê de îlahiyên dînî hene.

⁸⁴Cegerxwîn (2003), r. 144-145.

⁸⁵ Kaynak, r. 62.

Li gorî agahiyên Keyo, Cegerxwîn gelek besta (îlham) xwe ya nivîsandinê ji Ehmedê Xanî û Melayê Cizîrî girtiye. Peywendiyên wî li gel van kurdên Iraqê yê nivîskar û helbestvan jî hebûye. Wek: Bêkes, Hejar, Eladîn Secadî û Refîk Hilmî.⁸⁶

Cegerxwîn li gel helbestvanên qonaxa kovara Hawar'ê jî di têkiliyê de bû. Di pirtûka xwe ya bi navê Jînenîgariya Min de bi berfirehî behsa têkiliyên xwe û Celadet Elî Bedirxan, Kamuran Elî Bedirxan, Doktor Nureddîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan û hwd dike. Di heman pirtûka xwe de wiha dibêje:

“Celadet, li Şamê, kovar û rojnameyên Hawar û Ronahî'yê derdixistin. Hingê Kamuran li Beyrûdê rojnameyên “Sitêr” û “Roja Nû” diweşandin. Her du birayan gelek pirtûkên kurdî weşandin. Alfabe ya latînî ya kurdan jî cara ewil van her du birayan amade kir. Em înkâr nakin ku wan gelek gotar û pirtûkên kurdî, tirkî û erebî nivîsîne. Bedirxaniyan ji bo çanda kurdan xizmeteke pir baş kirin. Ez bi saya serê wan bûm nivîskar û helbestvan. Lê di nêrîn û fikr û ramanên polîtîk de em ji hev cuda bûn.”⁸⁷

Cegerxwîn di dîwanên xwe de li ser Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Siyahpoş, Mela Xelîlê Sêrtî, Mela Selîmê Hîzanî, Şêx Evdîrehmanê Axtepi, Melayê Bateyî û hwd helbest nivîsîne. Di Dîwana Yekem (Agir û Pirûsk) de helbestek bi navê “Hozan û Şairên Kurd” nivîsiye û navên helbestvanên kurd yek bi yek nivîsîne.

2.3.3.Naveroka Helbestên Wî

Gava em jiyana Cegerxwîn dixwînin em dibînin ku di destpêkê de Cegerxwîn ne ji bo welatparêziyê û mafên kurdan helbestan dinivîse. Ew helbestên xwe li ser delaliyê û felsefeyê dinivîse.

“Min li Dêrikê dest bi nivîsîna helbestan kir. Min dest pê kir ku delaliyên Dêrikê birêjim nava helbestê. Min xwest ez delalî û rewşa jinên Dêrikê vebêjim.”⁸⁸

Helbest ji bo Cegerxwîn navgîneke ku pê bigihîje armanca xwe. Çi wextê wî li ser evîne, felsefeyê, tarîxê, welatperwerî û pirsgirêkên civakîxwestiye binivîse çavkaniya wî ya bingehîn polîtîka bûye. Wî her demê babetên xwe di vê çarçoveyê de dîtine.

⁸⁶ Kaynak, r. 62.

⁸⁷Cegerxwîn (2003), r. 216.

⁸⁸Cegerxwîn (2003), r. 91.

Dû Şerê Cîhanê yê Yekemîn ra helbestên siyasî formeke teqez li Kurdistanê girtine. Cegerxwîn heta sala 1940î di helbestên xwe de belengazî û perîşaniya milletê kurd dianî ziman. Wî êdî bi baweriyeke xurt dengê xwe bilind dikir û xelk li dijî zordariya koledar û dagirkerên Kurdistanê teşwîq dikir. Meriv dikare li gor tîma helbestên Cegerxwîn di bin van beşan de dabeş bike:

1. Helbestên welatevînî û azadiyê
2. Helbestên li dijî feodalî kapîtalîzmê
3. Helbestên şoreşgerî û navneteweyî
4. Helbestên fabl û mîtolojîk
5. Helbestên evîniya sembolîk û evîniya rastî.
6. Helbestên felsefî.

Xisûsiyeteke helbestên Cegerxwîn a spesîfîk welatevînî ye. Bi piranî helbestên Cegerxwîn berê xwe dane azadiya gelê kurd. Wî bi zimanekî hêsan rewşa milletê kurd aniye zimên. Helbestên Cegerxwîn ên li ser welêt û nostalgîkî bi piranî lîrîk in.

Cegerxwîn car caran temaşeyî welatê bapîrên kurdan “Medya” û “Selahedînê Eyûbî” dike. Cegerxwîn gelek helbest li ser sembolên kurd ên neteweyî nivîsandine. Wek: şal û şapik û cilên kurdan, ziman, folklor û xisûsiyeten kurdan ên mîrxasiyê û sirûdên niştimanî, ala kurdî û hwd.⁸⁹

2.3.4. Xebatên Ku Li Ser Cegerxwîn Hatine Kirin

Helbestvanekî di rêza Cegerxwîn de hêjayî xebat û lêkolînên gelek kûr û berfireh e. Her çî qas gelek nebin jî hinek lêkolînên akademîk li ser Cegerxwîn hatine kirin. Ji xeynî lêkolînên berfireh di rojname û kovaran de jî di derheqê Cegerxwîn de gotar hatine nivîsîn. Her wiha di antolojiyên gelek nivîskaran de behsa jiyana Cegerxwîn û berhemên wî hatine kirin. Di nav hemû lêkolîn û xebatên vê babetê de helbet cihê pirtûka Yusuf Kaynak ya bi navê “Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî” cuda ye. Lewra Yusuf Kaynak berfirehî ev xebata xwe amade kiriye û wek teza doktorayê li ser jiyana, kesayeta edebî, berhemên Cegerxwîn lêkolîneke bêhempa pêk aniye.

Xebatên sereke yên ku li ser Cegerxwîn hatine kirin ev in:

⁸⁹ Kaynak, r r. 109-112.

Yusuf, Kaynak (2010), *Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî*, Çapa yekemîn, Weşanên Do, İstanbul.

Mikail, Bülbül (2013), *Di Helbestên Cegerxwîn De Rengvedanên Têkiliyên Îqtîdarî*, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Mardin.

Ibrahim, Ibrahim (2016), *Rengvedana Dîroka Kurdî Di Helbestên Cegerxwîn De*, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Mardin.

Ömer Faruk, Yekdeş (2008), *Nazım Hikmet ve Cegerxwîn'de Aşk Şiirinin İdeolojisi*, Bilkent Üniversitesi, Ekonomi ve Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Bölümü, Yüksek Lisans Tezi, Ankara.

Kovara Federasyona Komalên Kurdistanê li Swêdê, “Berbang”ê de derheqê wefatkirina Cegerxwîn de hejmareke taybet weşandiye.⁹⁰

Di kovara “Dengê Komkar” de bi navê Kurdox, kurdekî Sûriyeyê yê ku li Sowyetê dimîne, dû mirina Cegerxwîn re nivîsareke bi navê “Kê Got Cegerxwîn Mir” nivîsîye.⁹¹

Di Berbangê de Zinarê Xamo nivîsareke “Meriv ji bo Cegerxwîn çî bibêje hêja ye” nivîsiye, bi kurtî jiyana Cegerxwîn û hunera wî ji her alî ve rave dike.⁹²

Nivîskar û ronakbîrê kurd ê ku hêj li Swêdê dijî, Rohat Alakom di nivîsara xwe ya bi navê “Edebiyat û Fîlozofîya Cegerxwîn” de li ser meziyetên Cegerxwîn ên mezin ên wek mirovhezî û demokratî bi kurtî disekine û wan dide naskirin.⁹³

Mehmet Uzun, Feqî Huseyn Sağniç û Qanatê Kurdo di Antolojiyên Edebiyata Kurdî de bi kurtasî behsa Cegerxwîn kirine û di derbarê berhemên wî û jiyana wî de agahî dane.

Musa Anter di bîranînên xwe de behsa Cegerxwîn dike û dibêje ez gelek di bin bandora wî de mame.

⁹⁰Kaynak, r. 92.

⁹¹Kaynak, r. 100.

⁹²Kaynak, r. 103.

⁹³Kaynak, r. 104.w

Ji bilî van nivîs û lêkolînan di 'Gazete Duvar/Kitap' a tirkî de di Xizîrana 2018an hejmara 12. de Berken Bereh, Îrfan Amîda, Vecdi Erbay û Deham Ebdulfettah di derheqê Cegerxwîn de çar nivîsan dinivîsîn.

Li ser înternetê di gelek rojname û malperên cuda de li ser Cegerxwîn nivîs û gotar hatine nivîsîn. Lînkên wan malperan li jêr in:

<https://www.ilkehaber.com/yazi/kurt-sairi-cegerxwin-kisa-yasam-oykusu-1429.htm>

http://guneydergisi.org/index.php?option=com_content&view=article&id=314%3Acisgerxswin-uzesrisne-dussunscsler&catid=47&Itemid=11&showall=1

<https://gazete.alinteri1.org/cegerxwin-kalbini-bir-gule-degisen-sair>

<http://www.avestakitap.com/sayfa.php?sayfa=sicil11>

<https://www.bitlishaber13.net/seyda-cigerxwin-594.html>

<http://haber.sol.org.tr/serbest-kursu/stalin-ve-cigerxwin-ozkan-oztas-haberi-71656>

<http://www.batmansonsoz.net/haber/8374/cegerxwin-iz-birakan-bir-isim>

3. DI HELBESTÊN CEGERXWÎN DE AJAL Û AWAYÊ BIKARANÎNA AJALAN

Cegerxwîn di helbestên xwe de fikr û ramanên xwe yê siyasî, olî, civakî bi kurmanciyê zelal anîne ziman û gelek caran di van helbestên xwe de navên ajalan û taybetiyên ajalan bi kar anîye. Kîjan ajal di çand û wêjeya Kurdan de xwedî wateyê çawa be, Cegerxwîn ew ajal di helbesta xwe de di wê wateyê de bi kar anîye û gelek caran helbestên Cegerxwîn xwerû li ser ajalan di forma fablê de hatine nivîsîn. Wek mînak: Rovî, bi fêlbazî û çêkirina dek û dolaban ve; Şêr, bi hêzdarî û qawet û penceyên xwe ve; Dîk, bi pêşengiya xwe ve; Pez/Mî, bi sernermî û bêhêziya xwe ve di helbestên Cegerxwîn de derbas dibin.

3.1. Di Helbestên Cegerxwîn de Ajal

Di helbestên Cegerxwîn de ajalên ku difirin (teyr û tiyûr), ajalên ku tên kedîkirin, ajalên kûvî, ajalên ku di nava avê de dijîn û ajalên biçûk yê mîna kêzik û mêş û moriyên derbas dibin. Me di beşên jêrîn de li gorî van sernavan navên ajalan di nav beşên cur bi cur de nivîsîn û diyar kirin.

3.1.1. Ajalên Ku Difirin

Piraniya ajalên ku difirin di edebiyatê de remz û sembola serdestiyê ne. Wek mînak: Baz/Şahîn, Qertel, Bûm û hwd. Helbesta Cegerxwîn ya bi navê “Serxwerabûna Mirîşkan” delîlê vê gotinê ye. Lewra di vê helbestê de ajalên ku di koxikan de dijîn li dijî serdest û hukimdarên xwe serî hildidin. Serdest û hukimdarên wan jî teyr û tiyûr in û navên wan yek bi yek di nava helbestê de derbas dibin. Hinek çûkên ku difirin jî di wateya sernermî, sexîbûn û belengaziyê di edebiyatê de derbas dibin. Wek mînak: Kew, kevok, beytik û hwd. Di çanda Kurdan de kew/kewa gozel ji bo delalbûna yarê jî bûye simbol û bi taybetî dengbêjan di kilamên xwe de navên vê çûkê ji bo bedewiya yarê bi kar anîne.

3.1.1.1. Çûk/Çûçik

Di Edebiyata Klasîk de çûk bi navên wek çûk, murx, teyr, tûr derbas dibe. Dengê wê, firîna wê ya bi nizmî û bilindî, ketina wê ya dafikê, nêçîrkirina wê, hebûna wê ya di bax û bostanan de û hwd. bûne mijarên helbestvanan.⁹⁴

Cegerxwîn li vir çûçik di wateya biyaniyekî ku ji derve were û mal û milkê xwediye malê bixwe de bi kar aniye.

Hawar hewar

Hawar hewar

Van **çûçikan**

Genmê me xwar.⁹⁵

3.1.1.2. Baz/Şahîn

Teyrê baz, çûkeke/î rengspî û gir e. Di edebiyatê da porê yarê ji aliyê nêçîrvaniyê vali teyrê baz hatiye şibandin. Ew, çûka nêçîrvaniyê ye û porê yarê jî wek nêçîrvanî ye û ew, nêçîrvaniya dilê evîndara xwe dike. Teyrê baz, bi bêtirs û berzbûna xwe navdar e û ew, şahê çûkan e û sultan û paşayan bi wî ra nêçîr kirine.

Di tesewûfê de tê wateya ku çawa nêçîrvan dema bixwaze çûkekê/î binêçîrîne wî bi teyrê baz dinêçîrîne, were jî Xwedê dema bixwaze 'evdekê/î xwe îrşad bike wî/ê bi wesileya weliyekê xwe tîne hizûra xwe.⁹⁶

Cegerxwîn di vê malikê de aliyê dilawerî û nêçîrvaniya bazî/şahînê derxistiye pêş.

Şahînû bazhilatin, bûmbûye padîşahek;

Bermayê tirk û taçîk, talan kir û hemî xwar.⁹⁷

⁹⁴ Önder, Ertap (1996), *Dîwan Şiirinde Hayvan Motifi*, Yüksek Lisans Tezi, Balıkesir Üniversitesi, rr. 9-10.

⁹⁵ Cegerxwîn (2011), *Ronak*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 11.

⁹⁶ Nesim, Sönmez (2018), *Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî-Metn û Lêkolîn*, Seyda Yayınları, Diyarbakır, r. r.112-113.

⁹⁷ Cegerxwîn (2011), *Agir û Pirûsk*, Çapa şeşan, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 27.

3.1.1.3. Kund/Bûm/Pûm

Bûm çûkeke/î şevê ye û bi roj nagerin. Çavên wê/î pir mezin in û di tariya nîvê şevê de jî baş dibîne. Serê wan li gorî laşê wan hinekî mezin e. Ajaleke/î dirende ye. Bi giştî li cihên wêran digerin. Ji ber vê jî di nava edebiyatê de wek remz û sembola bêoxiriyê tên qebûlkin.⁹⁸

Di mîtolojiya Çînê de bûm ji ber ku bi şev difire, bûye remza tarîtiyê. Di edebiyata Farisan de wek *ehlê kavil û xirabeyantê* dîtin. Di çanda Îslamê de jî bûm, wek remza bêoxiriyê û dijminê qijkê tê dîtin. Di çanda Anatoliyayê de jî bûm, wek sembola bêoxiriyê tê dîtin û tê bawerkirin ku li ser banê mala kê bûm bixwîne dê ji wê malê miriyek derkeve.⁹⁹

Cegerxwîn jî di berhemên xwe de bûm di heman wateyan de bi kar aniyê.

Dijmin li jor û jêr e, ji cengê re li kar in.

Kundên serê şikêra nêçîr ji ber te xwarin.¹⁰⁰

Welatê we xela rakir li şêran,

Niha seyd e ji bo **kundê** şikêran.¹⁰¹

Di ser me ra ev xanên pozbilind

Li ber derên wan dinalin wekî **kund**¹⁰²

*Şahîn*û bazhilatin, **bûm** bûye padîşahek;

Bermayê tirk û taçîk, talan kir û hemî xwar.¹⁰³

⁹⁸ Ertap, r. 22.

⁹⁹ Osman, Aslanoglu (2014), *Pervîn-i İ'tisâmî Divanı'nın Tahlili*, Doktora tezi, Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Fars Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Erzurum. r. 440.

¹⁰⁰ Cegerxwîn, a, r.16.

¹⁰¹ Cegerxwîn, a, r. 90.

¹⁰² Cegerxwîn, d, r.129.

¹⁰³ Cegerxwîn, a, r. 27.

Qesrek bilind e li hawir şênî

Li birca jorî, **pûmek** dixwênî¹⁰⁴

3.1.1.4. Hacî Legleg

Çûkeke/î di keşa hênikayê dijî û di heman demê de koçber e. Hatina wê mizginiya biharê ye. Li hêlîna xwe ya berê digere û dîsa li wir dimîne. Di Edebiyata Klasîk de dibêjin ku li ser serê Mecnûn hêlîna xwe çêkiriye. Zilfên yarê jî mar in û dixwazin bigihîjin wê hêlînê da ku wê çûkê bixwe.¹⁰⁵

Cegerxwîn, bi gelemperî taybetiya hacîleglegê ya koçberiyê di helbestên xwe de derxistiye pêş.

Bi lêdan geh, bi kuştin geh bi talan,

Li çolan em dibazin, **hacî legleg**¹⁰⁶

Were rabe binêre ey Melîk beg

Beg û axa hemî bûn **hacîlegleg**¹⁰⁷

Hemî îro li çolan **hacîleklek**

Hemî derwêş û kêr û jar û parsek¹⁰⁸

3.1.1.5. Zax

Di helbesta Dîwanê de di navbera qijikê û reqîb têkiliyek tê çêkirin. Di vê rewşê de yar dibe bilbil, aşiq jî dibe çûka Huma. Ji ber ku rengê qijikê reş e, dişibe şevê. Lê dîsa jî li hemberê qijikê nêrînên helbestvanan neyînî ye.¹⁰⁹

¹⁰⁴Cegerxwîn (2011), *Salar û Mîdyâ*, Çapa şeşan, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 40.

¹⁰⁵Ertap, r. 93.

¹⁰⁶Cegerxwîn, a, r. 28.

¹⁰⁷Cegerxwîn (2011), *Şerefnameya Menzûm*, Çapa şeşan, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 33.

¹⁰⁸Cegerxwîn, j, r. 64.

¹⁰⁹İskender, Pala (2015), *Ansiklopedik Diwan Şiiri Sözlüğü*, 26. Basım, Kapı Yayınları, İstanbul, r. 487.

Zax cureyeke qijikan e û di nava qijikan de ya ku rengê wê herî reş e. Ji ber vê yekê helbestvanan bextê xwe yê reş şibandine rengê vê çûkê. Di wêjeyê de zax, gelemperî bi awayekî neyînî û ajaleke hîcwê derbas dibe. Bi bangdana xwe ya kirêt û bi meşîna xwe ya xirab ve di nava çanda gel jî wek ajaleke neyînî cih digire. Di gelek çîrok û helbestan de ajala ku tiştên bi qiymet didize tê binavkirin. Her wiha ajaleke wisa ye ku bizarî yekê/î din vedike û taybetiyên xwe winda dike. Ji vî ali ve hinek mirov bi vê ajalê tên şibandin.¹¹⁰

Di van malikan de Cegerxwîn, zax wek metafora bextreşiyê bi kar aniye.

Wek bilbil dinalin û wek baz nêçîrvan in tev,

Lê çi bikin bindest û bextreş in wek **zax** in.¹¹¹

Ji derdê nazika xweşkendizanin ez Cegerxwîn im,

Siyah bext im wekî **zaxan** di nêv baxan de ez dîn im.¹¹²

3.1.1.6. Qirak/Reşqirak

Qirak, bi deng, reng û meşîna xwe û xwarina tiştên necis ve di helbestan de cih digire. Her wiha di derheqê qirakê de baweriyên nebaş jî hene. Mirov di wê baweriyê de ne ku qirak bi dengê xwe yê nexweş û bangdana nebaş xeberên nexweş tîne. Ji ber vê yekê qirak bûye remz û sembola bêoxiriyê.¹¹³

Cegerxwîn di van malikan de qirak bi sembola bextreşiyê bi kar anîne.

Pir şerm e ko **reşqirak** me bixwin û em nêçîrvan

Kê diye ko nêçîra **qirakê** qertel û qerbaz in¹¹⁴

Ji vî bextê min ê reş wek **qirakê**

Gulî sorê nema tê ber şibakê¹¹⁵

¹¹⁰ Aslanoğlu, r. 453.

¹¹¹ Cegerxwîn, a, r. 49.

¹¹² Cegerxwîn, a, r. 249.

¹¹³ Ertap, r. 70.

¹¹⁴ Cegerxwîn (2011), *Dîwana Sêyemîn (Kî Me Ez)*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 30.

3.1.1.7. Murxê Seher

Di navbera dil û canê aşiq û murxê can (çûka dil) de ji aliyê şibandinê ve têkiliyeke pir xurt heye. Murxê can her tim difire diçe cih û warê yarê. Wekî can ji laşê mirov derkeve û here wisa jî di navbera çûk û dil de şibandinek hatiye çêkirin. Çawa ku dilê mirov di qefesa singê mirov de be, çûka di qefesê de jî wisa bi dil hatiye şibandin.¹¹⁶

Di wêjeyê de gelek caran murx wek amûreke şibandina dil hatiye bikaranîn. Lewra dil jî wek qelbê mirov di laşê mirov de ye û wek di qefesê de ye. Murx di wêjeyê de herî zêde di wateya dil de tê bi kar anîn.¹¹⁷

Tenha go min, da te du şêv,

Ev bexçe ey **murxê seher**.¹¹⁸

3.1.1.8. Quling

Quling, çûkeke/î reşdeq, renggewr yan jî spînokî, çîpdirêj, bejindirêj û perûbaskfireh e. Quling jî wek qazê zêdetir di edebiyata gelêrî de hatiye bikaranîn. Bi hatina wî ya ji cih û warên dûr, ji aliyê teyrê baz va nêçîrkirina wî, xeberanîna wî ji yarê re, di edebiyatê de hatiye bikaranîn.¹¹⁹

Cegerxwîn di van malikan de quling di sembola bêhêzî, belengazî û bextreşîyê de bi kar aniye.

Li jor tê dengê **qulingê** perşikestî,

Rê winda ye, şop û rêç lê bûne leylan

Ji refê xwe mayîye ev **qulingê** bextreş;

Wek min dil bi kul û derd e bê goman.¹²⁰

¹¹⁵Cegerxwîn (2011), *Dîwana Heftemîn (Hêvî)*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 81.

¹¹⁶Ertap, r. 13.

¹¹⁷Aslanoğlu, r. 436.

¹¹⁸Cegerxwîn, a, r. 258.

¹¹⁹Sönmez, r. 112.

¹²⁰Cegerxwîn, a, r. 80.

Ev **quling, qulingê** welatê me ê jor;

Lîs û hêlîn dijminan tev kirine wêran.

Qulingê me warê xwe berdaye naçar,

Nema karî, vegeerî wek mirovê bêgan.¹²¹

Li ser şaxan dibazin wek **qulinga**

Neyaran ew didane ber tivinga¹²²

3.1.1.9. Hudhud

Hudhud, ji ber ku dikare li hewayê, avên ku gelek dûr in bibîne û wan kifş bike bûye xizmetkarê Suleyman pêxemberî. Navekê wî jî murgê Suleymanî ye û di Quranê da navê wî bi çîroka Suleyman Pêxemberî ra derbaz dibe. Hudhud, di navbera Suleyman Pêxember û melîkeya Seba/Sebeyê Belqisê da peyamber/xeberdar bûye. Ev çîroka ku di navbera Suleyman Pêxember û Belkisê de derbaz bûye, weke tiştêkî efsaneyî ye, di edebiyata klasîk da derbaz dibe. Di lîteratura Îslamê de navê hudhud, ebu'l-exbar, ebû'r-rebî', ebû 'îbad, ebû's-seccad û... hwd derbaz dibe. Gelek taybetiyên ev çûkê hanê hene û ji wan taybetiyan hinek ji wan vana ne: Dikare ava di binê axê de bibîne, bi hevsera xwe re dilsoz e, dema hevsera wî dimire, dil nake ku cara duduyan bizewice, hurmeta wî ji bo diya wî û bavê wî gelek zêde ye. Dema diya wî û bavê wî kal û pîr dibin, li pey rizqê wan digere û dema dayîka wî dimire, ji bo veşartina termê wê heta ku cihekî lêhatî dibîne, wê li ser serê xwe digerîne. Lewma weke xelat, tepelîka serê wî gelek xweşik hatiye xemilandin û ji ber vê sedemênavekî wî jî sahîbu'l-kulah e. Ew çûkekî gelek têgihîştî û xweşxeber e.¹²³

Hudhud rabû serefrax

¹²¹Cegerxwîn, a, r. 80.

¹²²Cegerxwîn, j, r. 73.

¹²³Sönmez, r r. 111-112.

Wî çû bi lez gote baz¹²⁴

3.1.1.10. Tûtî/Totî

Ṭûtî, ji çûkên ku nikulê wan stûr û lezlezok in, lingên wan tenik in, ji çar tiliyên wan du heb ber bi paşda ne û bi awayekî xweşik zarî dengê mirovan dikin ra tê gotin. Tê gotin ku ji ber ku ṭûtî, ji xwarina şekirî gelek hez dikin, di qefesa wan de herdem şekir dardakirî ye. Lewra helbestvanên klasîk bawer dikin ku ev çûkana ji ber ku şekirî dixwin, diaxivin û dibêjin ku ger ji me ra jî hurmet û alîkarî were kirin, em jî dikarin helbestên xweşiktir binivîsin.

Ṭûtî, di edebiyata klasîk da bi şekir û aweneyê ra hatiye bikaranîn. Bi bîranîna wê li hember neynikê bi şekirî ra; li pênuşa helbestvanî/ê, li kesayeta wî/ê, li evîndar û li dilê wî hatiye şibandin.¹²⁵

Cegerxwîn di van malikan de tûtî di wateya remza ah û nalîniyê ve û xweşbûna dengê wan ve bi kar anîne.

Bi ah û bi nalîn wekî **tûtiya**,

Cegerxwîn dinalî li deşt û çiya.¹²⁶

Her yek e Seyda Melayê Botî

Di xoşxwanê û evîndarî de **totî**¹²⁷

3.1.1.11. Kew/Çêlekew/Kewê Ribat/Kewa Gozel/Mêkew/Nêrkew/Ferxa Kewan

Kew, bi qebeqeba xwe ya xweşik û meşîna xwe ya delal ve di nava helbestan de cih digire. Mirov her tim bi qebeqeba kewê kêfxweş dibe. Lewra dengê wê mîna dengê kena mirovan e. Di helbestan de meşîna yarê bi meşîna kewê ve tê şibandin. Di hinek helbestan de ji ber ku çavên yarê bi teyrê baz tîn şibandin, aşiq û dil û canê aşiq jî bi kewa ku tê nêçîrkirin tê şibandin.¹²⁸

¹²⁴Cegerxwîn, a, r. 85.

¹²⁵Sönmez, r. 110.

¹²⁶Cegerxwîn, a, r. 174.

¹²⁷Cegerxwîn (2011), *Dîwana Duyemîn (Sewra Azadî)*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 151.

¹²⁸Ertap, r r. 76-79.

Cegerxwîn di helbestên xwe de ajala/ê kewê bi heft awayan bi kar aniyê. Sedema vê yekê jî ew e ku, kew di nava folklorê kurdî de di mijara evîn û evîndariyê de semboleke pir taybet e. Wekî din kew, bi awayê bêhêzî, belengazî, neçarî û bêmecaliyê de û bi awayê îxanet û bêbextiyê jî di nava edebiyata kurdî de derbas dibe.

Çêlekew çêlika kewê ye û Cegerxwîn di malikê de wek remza bêhêziyê da nivîsiye. Kewê Ribat kewê nêr e û her tim ji bo Kewa Gozel qebeqebê dike. Navê wî yê din jî Nêrkew e. Mêkew jî kewa mê ye û bi navê din Kewa Gozel e. Ferxa Kewê jî çêlika kewê ye û di malikê de di wateya neşarezabûnê de hatiye bikaranîn.

Hûn beg û axa ne yanê xwedyê mal û gund û zêr

Lê li ber destên neyaran hûn wekî **çêlekewa**¹²⁹

Dipeyîvin pir qelew

Ji dijmin re **çêlekew**¹³⁰

Hêj di dewra kevirî de dil çû bajarê evîn,

Lew bi qebqeb we dixwênî wekî şalûl û **kewa**¹³¹

Biken me go: - Xanim

Mekuj misilman im

Bi min kenî **mêkew**¹³²

Şev ta sipîdê me nîn e qet xew

Cihan li ber me dibîte rew-rew

Nêrkew nexwênî, çi bêjî mêkew?¹³³

¹²⁹Cegerxwîn, b, r. 163.

¹³⁰Cegerxwîn, d, r. 31.

¹³¹Cegerxwîn, b, r. 221.

¹³²Cegerxwîn, c, r. 339.

Şev ta sipîdême nîn e qet xew

Cihan li ber min tev bûye rew-rew

Ribat nexwênî, çi bêjî **mêkew**?¹³⁴

Kewa-gozel dixwênî, pir ciwan î

Dizanim hêj di jînê da tu ferx î¹³⁵

Kewa-gozel dixwênî, pir ciwan î

Dizanim hêj di jînê da tu **ferx** î¹³⁶

3.1.1.12. Kevok

Navê wê di nava helbestan de wek çûkeke ku tê nêçîrandin li gel çûkên nêçîrvan derbas dibe. Her wiha di edebiyatê de li şûna yarê jî tê bikaranîn. Kevok di wezîfekirina postayê de jî gelek navdar in.¹³⁷

Di navbera yarê û kevokê de ji aliyê por, delalî û reng ve têtikilik tê datanîn. Kevoka ku ji yarê xebereke xweş tîne dibe remza hezkirinê. Dema ku por û nêrînen yarê wek nêçîrvanekî hatin teswîrkirin, aşiq jî wek kevokeke spî ku dê bê nêçîrandin tê teswîrkirin.¹³⁸

Wek **kevokê** dêm bihokê

Tê bi rengê qazikê¹³⁹

Berê xwe da min, **kevoka** kedî

¹³³Cegerxwîn (2011), *Dîwana Şeşemîn (Şefağ)*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 31.

¹³⁴Cegerxwîn, g, r. 42.

¹³⁵Cegerxwîn, g, r. 217.

¹³⁶Cegerxwîn, g, r. 217.

¹³⁷Pala, r. 264.

¹³⁸Ertap, r. 60.

¹³⁹Cegerxwîn, g, r. 190.

Ji min dipirsî, bi şerm û fedî¹⁴⁰

3.1.1.13. Qaz/Qazik

Qaz, çûkeke/î bejindirêj, nikilfireh, lingperde, rengqehweyî yan jî gewr e. Ew, bi pirç e û giyaxur e û gelek ji avê hez dike û tê de avjeniyê dike. Yek ji ew heywanên ku di edebiyata klasîk da wek motif hatine bikaranîn e. Keç û bûk li qazan hatine şibandin û ew, yek ji remzên dilsoziya zewicandinê ne û mînaka bedewiyê ne.¹⁴¹

Cegerxwîn di van malikan de qaz/qazik di wateyekê de bi kar aniye. Di malika yekem de yara xwe ji aliyê delaliyê ve şibandiyê qazikê. Di malika duyem de bi navê wê yê eslî bi kar aniye û di wateya şibandinê de bi kar neaniye.

Wek kevokê dêm bihokê

Tê bi rengê **qazikê**¹⁴²

Elok û tûtik û **qaz**,

Tev de bûne belengaz.¹⁴³

3.1.1.14. Bilbil

Bilbil, bi xweşikbûna dengê xwe navdar e û di wextê siharê da dike wîçewîç. Tê gotin ku di dinyayê da tu amûreke mûzîkê tune ye ku weke bilbilan dengê xweşik derxîne. Bi Erebi jê re tê gotin 'Endelîb û ji cureyeke bilbilan ra jî şehlûl tê gotin.

Di edebiyata klasîk da bilbil gelek zêde hatiye bikaranîn. Lewra bilbil, evîndara dilbikul e û herdem qala xweşikahiyên yara xwe dike. Hinek caran bi xwe dibe evîndar û hinek caran jî dibe dilê wê. Bilbil evîndarê gulê ye û bi dengê xwe yê xweşik, dibe helbestên evîndarî.

¹⁴⁰Cegerxwîn, i, r. 28.

¹⁴¹Sönmez, r. 112.

¹⁴²Cegerxwîn, g, r. 190.

¹⁴³Cegerxwîn, a, r. 88.

Çawa ku bilbil bi gulê nabe, were jî 'aşiq bê me'sûq nabe. Çawa ku dirî û qîtên gulê kezeba bilbilê qul dikin; Were jî eziyetên yarê dilê evîndarî qul dike û bi derd û kulan tijî dike.¹⁴⁴

Dîlber û yarê tu wî,

Zêrîn guharê tu wî,

Gula biharê tu wî,

Bilbilê di bistan ez im¹⁴⁵

3.1.2. Ajalên Ku Têna Kedîkirin

Ajalên ku têna kedîkirin di nava jiyana mirovan de cihekê gelek girîng digirin. Nexasim jiyana Kurdan bi gelemperî ji berê heta niha di nav xwedîkirina ajalan de derbas bûye. Cegerxwîn, bi xwe jî helbestvanekî gundewar bû û ajalên ku di nav jiyana, çand, keleşor û edebiyata Kurdan de cih digirtin pir baş dizanîbû. Cegerxwîn taybetî û ferq û cudahiya ajalan jî gelek baş dizanî û di helbestên xwe de ev dianî ziman. Ajalên ku di nav helbestên Cegerxwîn de derbas dibin, ji aliyê edebiyata gelêrî, klasîk û nûjen ve hatine nirxandin. Her wiha ev ajal di keleşora Kurdan de xwedî wateyeke çawa ne, hatine diyarkirin.

3.1.2.1. Pez/Mî

Ji ber ku ajaleke bêzerar û sernerm e û her çi tiştê jê tê xwestin bêyî bervêdan qebûl dike û bi cih tîne, hemû peywirên ku jê re tîna dayîn bi cih tîne ye, mirovên wisa jî bi pez tîna şibandin. Di edebiyatê de bêhtir bi nêçîrandina xwe û sexîbûn û sernermiya xwe ve derbas dibe.¹⁴⁶

Di nava milletên Koçer de pez yan jî mî cihekê pir girîng digirin. Di nava milletên Koçer de keriyên pezan û garanên çêlekan pir hene. Mirov feydeyekî baş ji goşt, şîr, keşil û hiriya pezan distînin. Ji ber ku pez, ew qas bi kêrî mirovan tê, di nava edebiyatê de jî bi awayekî baş derbas dibe.¹⁴⁷

¹⁴⁴ Sönmez, r r. 110-111.

¹⁴⁵ Cegerxwîn, a, r. 271.

¹⁴⁶ Aslanoğlu, r. 424.

¹⁴⁷ Sani, Gören (2010), 17. *Yüzyıl Şairlerinden Fehîm-î Kadîm, Aşık Ömer ve Karacaoğlan'ın Şiirlerinde Hayvanlar C.1*, Marmara Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü, İstanbul, r. 466.

Cegerxwîn di van malikan de pez di remza sexîbûn û sernermiyê de bi kar anîne. Di malika dawiyê de mî, wek metafora bindestên nezan bi kar aniye. Jixwe di pir helbestên xwe de milletên bindest, ji aliyê sernermî û belengaziyê de şibandiyê pez û miyan. Lewra pez jiyana xwe her tim bi rêveberiya şivanan ve berdewam dike.

Ev keftelefa wî derew bû wek **peza** serjêkirî

Zirta bikî, forta bidî dinya bi çûn û hatin e.¹⁴⁸

Min digot, axa û beg; wê go, kurê min guh medê,

Ev şivan in sermiyan in dane gur wan col û **pez**.¹⁴⁹

Yan wek **miya** tirsonek e bêhiş bi gur re bazdidî

Xweş ketiye tora dijmina, ev keftelefa masî ye¹⁵⁰

3.1.2.2. Beran

Bi qurbanbûn û hêzdariya xwe ve di edebiyatê de cih digire. Her wiha ji ber qiloçên xwe girbûna xwe dibe mijara edebiyatê. Gava aşiq di rêya yara xwe de canê xwe dide wek beranê qurbanê tê nîşandan.¹⁵¹

Cegerxwîn di van malikan de dibêje divê mirov xwe di destê tu kesê de neke pez û divê mirov bibe beran û jiyaneke bêminet û serbixwe bijî.

Her yek meaşek dane wan, lê hon pezê tim bê şivan;

Ma yek ji we nabî **beran**, hon ên kul û derdan e bes.¹⁵²

Ey welat îdî metirse zariwên te va gihan

¹⁴⁸Cegerxwîn, b, r. 38.

¹⁴⁹Cegerxwîn, a, r. 82.

¹⁵⁰Cegerxwîn, b, r. 64.

¹⁵¹Ertap, r. 149.

¹⁵²Cegerxwîn, a, r. 20.

Pir xweş e ko em ji bo te bibne qurban wek **Beran**¹⁵³

Bi destê me tevr û bêr in

Ciwên avê em dikolin

Di vê rê de em **beran** in.¹⁵⁴

Destûr divê, qanûn û rist

Ji nav me rabin: kurt û pist

Kesek nemênî xwar û sist

Pozberanek ji mer divê¹⁵⁵

3.1.2.3. Berx

Di edebiyatê de berx, ji bo zarokan û ji bo yarê dibe hevalnav û di vê peywirê de tê bikaranîn. Gelek caran jî di edebiyatê de berx, remz û sembola paqijî, delalî, zelalî û xweşikiyê ye. Her wiha berx ji bo gazîkirin û bangkirina li zarokan jî tê bikaranîn.¹⁵⁶

Di nava keriyê pez de yên herî bêhêz û ji bo nêçîra gur musaît berx in. Ji ber vê yekê di edebiyatê de navê wî gelek caran li gel navê gur û dijminiya gur derbas dibe.¹⁵⁷

Di çanda kurdî de jî berx ji bo hezkirina zarokan, taybetî jî zarokên kurik tê bikaranîn. Wek mînak dayikên kurd gava ji kurên xwe hez dikin ji wan re gotinên wek: “Beroxê min”, “Berxo”, “Berxikê min” dibêjin. Cegerxwîn di van malikan de berx ji aliyê saffîtiyê, nezanî û xeşimiyê ve nivîsîne.

Nezanim ez, digel jînê dibazim

¹⁵³Cegerxwîn, b, r. 63.

¹⁵⁴Cegerxwîn, c, r. 164.

¹⁵⁵Cegerxwîn, d, r. 35.

¹⁵⁶Gören, r. 490.

¹⁵⁷Aslanoğlu, r. 430.

Weke **berxê** di nav pencên gurê har¹⁵⁸

Diran ji hev bi devkenî

Şêr bêjî **berxê**: - Ezbenî

Xap û fenê pîs û genî

Lê **berx** çizanî rav e ew¹⁵⁹

Kum û tac û kofî ketin ber piya,

Weke **berxê** mîjo herin ber miya.¹⁶⁰

Sermayedar, şerxwaz, istimar û koledar

Em **berxê** ber kêrê û ew bi xwe cellad in¹⁶¹

3.1.2.4. Bizin

Bizin di nava çanda Kurdan de ajaleke erênî ye û Kurd di jiyana xwe de feydeyekî gelek baş ji bizinê distînin. Şîr, goşt, kevil û hiriya bizinê di nav jiyana rojane de gelek bi kêrî mirovan tên û jiyana wan hêsantir dike.

Bizin ajaleke bi vekayîn e û pirî caran di nav keriyên pêz de bi hev re diçêrin. Bizin di çol û çîyan de ajaleke/î pir bitirûş e. Bizin bi navekî 13-14 salan dijîn. Bizin bi rahatî bi teht û zinaran de radipelikin. Bizin axleb giya dixwe û şîrê wê pir kêrhatî û têker e.¹⁶²

Cegerxwîn di van malikan de bizin wek metafora pasîfî û bêtevgeriyê nîşan daye.

Tu cewrên guran jî çi mêr û çi jin

Kedîkî, xwedîkî dibin qet **bizin**?¹⁶³

¹⁵⁸Cegerxwîn, d, r. 206.

¹⁵⁹Cegerxwîn, c, r. 47.

¹⁶⁰Cegerxwîn, a, r. 108.

¹⁶¹Cegerxwîn, b, r. 181.

¹⁶² Gören, r. 450.

Bibim ser dijmin êrîşên mezin

Em wan bidizin wek pez û **bizin**¹⁶⁴

3.1.2.5. Ga/Boxe/Gamboxe/Conega

Mirov ji goşt, hêz û çermê ga feyde dibînin. Di edebiyatê de ga bi awayekî erênî derbas dibe. Lê belê di nava jiyana rojane de wek heqaretê tê bikaranîn.¹⁶⁵

Tevî mezinbûn û girbûna wî, aqilê ga hindik e. Ji ber vê sedemê wek peyveke heqaretê di nav edebiyatê de cihê xwe digire.¹⁶⁶

Cegerxwîn di van malikan de ji aliyê nezanî û bêfehmiyê de peyva ga bi kar aniyê.

Çiqas bêjim bê fêde ye, wek bilûra ber **ga**,

Ax ji destê we şêx û melan, ez bûme Cegerxwîn.¹⁶⁷

Ê ku li Ewropa xwendî dê çilo parsê bikî,

Ê li pey **gayê belek** bî nabî carek mîr û şa.¹⁶⁸

Bi min pîrî ghişt û çû ciwanî,

Şikest û çû ji ber **boxê** birivî.¹⁶⁹

Ku çil sal e ez wer dikim qîre-qîr

Belam ez çî bêjim ji bo **gayê** pîr¹⁷⁰

¹⁶³Cegerxwîn (2011), *Zend-Avista*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 29.

¹⁶⁴Cegerxwîn, c, r. 50.

¹⁶⁵Gören, r. 381.

¹⁶⁶Ertap, r. 166.

¹⁶⁷Cegerxwîn, a, r. 167.

¹⁶⁸Cegerxwîn, a, r. 187.

¹⁶⁹Cegerxwîn, a, r. 264.

¹⁷⁰Cegerxwîn, e, r. 123.

Guh medne van şêx û bega

Çavsor dibin wek *conega*¹⁷¹

Ey destebirakê gur, hûn jî weke me mêr in,

Lê hûn *gamboxe* ne, hevalê piling û şêr in.¹⁷²

3.1.2.6. Mirîşk/Tûtik/Varik

Mirîşk bi kimika ser serê xwe ve tê nasîn. Gava ku hêkan dike dengê pir bilind derdixe. Ji ber vê yekê gava mirovek tiştekî biçûk dike û pir pesnê xwe dide bi mirîşkê tê şibandin.¹⁷³

Di edebiyatê de wek ajaleke bêhêz derbas dibe. Her wiha wek nêçîra ajalên dirende tê nîşandan. Navê mirîşkê gelemperî li gel navê rovî û dijminên wê yên din derbas dibe.¹⁷⁴

Di nava gel de li ser mirîşkê her tim pirsar; “Gelo mirîşk ji hêkê dibe, yan hêk ji mirîşkê?” heye. Cegerxwîn jî di malikê de îşaret li vê pirsê kiriye û gotiye bersiva vê pirsê tune ye. Di malikên din de jî bêtevgeriya mirîşkê derketiye pêş.

Wekî hêk û *mirîşk* in

Bê bersiv in ez û tu¹⁷⁵

Mirîşk, diçî çî dixwî

Tu jî hêka wê dixwî.¹⁷⁶

Varik ji xew şiyar bûn

¹⁷¹Cegerxwîn, f, r. 20.

¹⁷²Cegerxwîn, a, r. 69.

¹⁷³Ertap, r. 103.

¹⁷⁴Aslanoğlu, r. 469.

¹⁷⁵Cegerxwîn, d, r. 126.

¹⁷⁶Cegerxwîn, f, r. 168.

Ji pînîkên xwe derçûn¹⁷⁷

Elok û **tûtik** û qaz,

Tev de bûne belengaz.¹⁷⁸

3.1.2.7. Dîk

Di edebiyatê de dîk îşaretê derketina ronahiyê dike. Lewra sibehê, beriya ku roj derkeve, dîk bi bangê xwe ve mizgîniya hilatina rojê dide. Her wiha bangdana dîk wekî ya mirîşkê bi beredayî nayê dîtin. Lewra dîk dizane dê kengî bang bide.¹⁷⁹

Dîk bi gelemperî di nava gelek millet û şaristaniyan de wek remza wêrekî û ewlehiyê tê zanîn. Serpêhatiyên dîkan yên li gel roviyan bûne mijarên çîrokan. Rovî dixwazin dîkan bigirin û bixwin. Ji ber vê yekê ev herdu ajala dijminên hev in. Rovî nêçîrvan e û dîk jî nêçîr e.¹⁸⁰

Cegerxwîn di van malikan de dîk ji aliyê pêşengî û rêberiyê ve nirxandiyê. Dîk di nava ajalên koxikan de dijîn bi aliyê rêberî, şarezayî û pêşengtiyê ve derdikevin pêş.

Li welatê me Xerza

Dîkekhebû şehreza.

Rokê ew çû nav **dîka**;

Ji wan re go hêdîka.¹⁸¹

Axa bûye weke **dîk**

Li nav malan fîke fîk¹⁸²

Rast e dilê min têşî

¹⁷⁷Cegerxwîn, g, r. 64.

¹⁷⁸Cegerxwîn, a, r. 88.

¹⁷⁹Gören, r. 173.

¹⁸⁰Aslanoğlu, r. 450.

¹⁸¹Cegerxwîn, a, r. 84.

¹⁸²Cegerxwîn, g, r. 57.

Lê nabim *dîkê* pêşî¹⁸³

3.1.2.8. Werdek/Ordek

Werdek di nava edebiyata gelêrî de ajaleke pir girîng e. Di nava helbestên Dîwanê de zêde derbas nabe. Ji ber ku werdek ajalake avî ye û delal e û meşîna wê jî pir bi nazenîn e, di edebiyatê de bûye remza delalîyê.¹⁸⁴

Cegerxwîn di vê malikê de yara xwe ji aliyê meşîna wê ve şibandîye werdekê.

Zendan li zendên min bipêç seyran li nêv baxan bikin

Şansê min e sewra ciwan şêrîn ken û meş *ordek* e¹⁸⁵

3.1.2.9. Seg/Kûçîk/Tajî/Tola (Tûle)/Dêl

Seg ajalekî ji aliyê mirovan ve zû tê kedîkirin e. Mirov, seg ji bo ewlehî, şer, çûn û hatin, ragihandin û nêçîrê xwedî dîkin. Ji ber ku seg ji xwediyê xwe re gelek sadiq û fedakar e bûye mijara gelek çîrok û gotinan.

Li gorî dînê Îslamê seg necis e. Ji ber vê yekê helbestvan seg ji bo şibandinên xirab bi kar tînin. Ev nêrîn bûye sedema vê yekê ku seg, di edebiyatê de ji bo tiştên neyînî û menfî hatine bikaranîn.¹⁸⁶

Hinek seg jî hene bê'esil in û gelek caran êrîşî xwediyê xwe jî dîkin. Ev jî aliyê segan yê neyînî ye. Seg di nava civakê de wek ajalekî bêqedr û biçûk tê dîtin. Ji ber vê sedemê jî di nava gel de pirî caran wek peyveke heqaret û biçûkdîtinê tê bikaranîn.¹⁸⁷

Cegerxwîn di van malikan de bi piranî seg ji aliyên wî yê nebaş ve aniye ziman û wek peyveke heqaretê di nava helbestên xwe de nivîsiye.

Hemî çûne, belê em mane nêçîr,

Jixwe dijmin li pey me her wekî *seg*¹⁸⁸

¹⁸³Cegerxwîn (2011), *Aşitî*, Çapa çaran, Weşanên Avesta, Stenbol, r. 80.

¹⁸⁴Gören, r. 236.

¹⁸⁵Cegerxwîn, b, r. 211.

¹⁸⁶Aslanoğlu, r. 425.

¹⁸⁷Ertap, r. 151.

¹⁸⁸Cegerxwîn, a, r. 28.

Beg bê êl nabê, êl nabê bê beg,

Pezê bê şivan, xwedî dibê **seg**.¹⁸⁹

Hestiyê millet dikoşin wek **segan** û gornebaş.¹⁹⁰

Ta kengî emê karkerê axa û bega bin

Ta kengî emê hestiyê ber lingê **sega** bin¹⁹¹

Dijmin bibî wek çêlekew

Bimrin **sehên** devlok û har¹⁹²

Kûçik û **tajî** û **tola**

Tev birin, ma ker-kerîk¹⁹³

Ew **dêla** keça **dêlê**!

Bibî xatûna êlê?¹⁹⁴

Ev **segê** ko min bi nanê xo xwedî kir har e ew

Terbiya van reng **segana** zanibe dijwar e ew

Çav li destê her mirov e pê bi pê tê ber bi nan

Dûlivîn e sernexwîn e her dema bêçar e ew¹⁹⁵

¹⁸⁹Cegerxwîn, a, r. 34.

¹⁹⁰Cegerxwîn, b, r. 22.

¹⁹¹Cegerxwîn, b, r. 51.

¹⁹²Cegerxwîn, f, r. 134.

¹⁹³Cegerxwîn, f, r. 175.

¹⁹⁴Cegerxwîn, g, r. 62.

3.1.2.10. Ker

Di nava helbestên Dîwanê de car car bi ker ve têkildar qisse û efsane derbas dibin. Yek ji van çîrokan ew e ku di Tofana Nûh (e.s.) de qewimiye.

Gava ku hêj nû tofan radibe Nûh Pêxember îşaret bi heywanan dikir û li keştiyê siwar dikirin. Gava dor hatiye kerî, ker rikiniye û li keştiyê siwar nebûye. Nûh Pêxember çend caran jê re gotiye dîsa jî li keştiyê siwar nebûye. Şeytan ji dûvê wî girtibû û nedihîşt kul ê siwar bibe. Nûh Pêxember dawiyê lê hêrs bûye û “Têkevê ya mel’un” gotiye û ker jî li keştiyê siwar bûye. Di hengama tofanê de gava Nûh Pêxember şeytanî di keştiyê de dibîne jê rê dibêje tu bi çî awayî bi destûra kê li keştiyê siwar bûyî. Şeytan jî dibêje: “Gava te gotî lê siwar be ya mel’un ez jî lê siwar bûm. Ma ji bilî min mel’unekî din heye?” dibêje.¹⁹⁶

Ker di nava gel de wek “guhdirêj” jî tê zanîn û di hilgirtin û kêşandina barên giran de û ji bo siwariya mirovan tînan bikaranîn. Ker li hemberî dijiwariyan ajalekî pir qahîm e û ji mu’ameleya xweş pir hez dike. Ker di dîtin û peydakirina rê de ajalekî pir baş e. Ji ber vê taybetiya wî di zamanên berê de li pêşiya karwanên hêştiran de mirovan ew datanîn pêşiya karwanî.¹⁹⁷

Em dikarin bibêjin ku Cegerxwîn hemî helbestên ku navê kerî di nav de bi kar aniye, ker di watayên nezanîn û bêkêriyê de bi kar aniye.

Ew kesê bê xwendin û eql û zanîn,

Li rêza **ker**a ye çî bi dîn û çî bê dîn.¹⁹⁸

Kerdizanê ko ji Ûrfa bê nîşan,

Tev de kurd in ta biçîte Kermaşça.¹⁹⁹

Kerek mirî li ber avê

¹⁹⁵Cegerxwîn, b, r. 44.

¹⁹⁶ Pala, r. 191.

¹⁹⁷ Gören, r. 418.

¹⁹⁸Cegerxwîn, a, r. 41.

¹⁹⁹Cegerxwîn, a, r. 62.

Mizgîn kete wê navê²⁰⁰

Lê ev xapên eşkera

Nakevin serên **ker**²⁰¹

Kurtan li mil ez bûme **ker**

Barê neyaran tim li ser

Piştî min e, ah û keser

Bîr û mijî tev bûn qerej²⁰²

Di nav dînan de dîn im gawir im ez

Nezan im ez di nav koma **ker** da²⁰³

3.1.2.11. Deve

Hêştir xwe li ber germê û tînatîyê pir baş digire û bi van taybetiyên xwe ketiye nava edebiyatê. Her wiha ajaleke ku dikare rêyên pir dûr here û ajaleke barkêş e. Laşê wê hinekê xwar e û gir e. Di nava helbestên Dîwanê de, ji ber ku hêştir rêyên dûr diçe û stûyê wê xwar e, stûxwarbûna aşiq û bendewariya wî bi hêştirê tê şibandin.²⁰⁴

Cegerxwîn di vê malikê de hêştir tenê ji aliyê girbûn û hêza wê ve bi kar aniye.

Ê ket bin lingê **devê**

Mirin tenê jêr divê²⁰⁵

²⁰⁰Cegerxwîn, d, r. 49.

²⁰¹Cegerxwîn, d, r. 84.

²⁰²Cegerxwîn, d, r. 99.

²⁰³Cegerxwîn, g, r. 36.

²⁰⁴ Ertap, rr. 135-137

²⁰⁵Cegerxwîn, d, r. 90.

3.1.2.12. Hesp/Kihêl

Di edebiyata klasîk da motîfa hespê, gelek caran hatiye bikaranîn. Kehêl jî cureyek ji cureyên hespan e û rengên wan sorî qehweyî ne. Ev cure hesp ji hespên pir hêja û bi qîmet tîen hesabandin.²⁰⁶

Di dîroka mirovahiyê ya hezar salan de di hemî qadên jiyana mirovan de hespan cihekê pir girîng girtiye. Hesp ji aliyê mirovan ve bi hêsanî tê kedîkirin û perwerdekirin. Ji ber hêz û qaweta hespî, mirovan ew di karûbarê çandinê de bi kar anîne. Her wiha ji bo siwariyê jî ajalê herî zêde hatiye bikaranîn hesp bûye. Di çanda berê ya hemû miletan de mirovê ku xwediyê hespekî baş bûya ev ji xwe dikir xala pesindanê.²⁰⁷

Cegerxwîn di van malikan de hesp ji aliyê bitevgerbûn û kelecaniya wan de bi kar anîne.

Ez tim dikim qîr û hewar

Gazî dikim kurdên xwar

Carek li me dijmin siwar

Lê **hespê** bê dezgîn im ez.²⁰⁸

Evîna min wekî **hespê** çeleng e

Revandim ez, ezê çibkim bi Hesar?²⁰⁹

Eger rast e tu dilxwaz î

Bi şîranî, bi şehnaz î

Tu bê carek li vir razî

Kihêla ser bi dizgîn î²¹⁰

²⁰⁶ Sönmez, r. 113.

²⁰⁷ Ertap, r. 126.

²⁰⁸ Cegerxwîn, c, r. 58.

²⁰⁹ Cegerxwîn, d, r. 206.

²¹⁰ Cegerxwîn, g, r. 128.

Yar bi rastî rengê *hespa* ser bi gem

Lê me ew seglawiya bê gem divê²¹¹

3.1.3. Ajalên Kûvî

Ajalên kûvî di nava edebiyatên hemû miletan de cihekî girîng digirin. Lewra mirov ji aliyên hêzdarî, mêrxasî, hîlebazî, delalî, xwînrejî, hovîtî û hwd. ve bi ajalaên kûvî tîndarî şibandin. Di edebiyata kurdan de jî navên ajalên kûvî di nav helbestên helbestvanên klasîk de gelek caran derbas dibin. Cegerxwîn jî di gelek helbestên xwe de navên ajalên kûvî bi kar anîne û mirov bi awayekî ve şibandiye van ajalan.

3.1.3.1. Şêr/Şepal/Nêreşêr/Şêremê/Mêreşêr/Şêrgelê/Şêresawê

Şêr li daristan û çiyayan de dijîn. Bi laş û dîtî û heybeta xwe û pençeyên xwe ve wek padîşahê hemû heywanan tê dîtî. Şêr di beşên edebiyat û beşên hunerê de wek sembola hêz û qawetê hatiye bikaranîn. Di wêjeya klasîk de şêr ji bo kesên bihêz û wêrek tê bikaranîn. Her wiha ji bo padîşah û mîr û fermanbaran jî tê bikaranîn.²¹²

Di edebiyata klasîk da motîfa şêr/pilingê herî zêde di berhemên qala baweriya Elewîyan dikin da hatiye bikaranîn û di edebiyatê da gelek caran Hz. Elî û şêr, bi hev ra hatine bikaranîn. Şêr, leqeba Hz. Elî ye û jê ra “Şêrê Xwedê” hatiye gotin.

Wateya pençeyên şêr ew e ku evîndar, ji bo evîna xwe dikare her tiştî bike. Di helbestan da hinek caran şêr û xezal bi hev ra hatine bilêvkirin. Sedema herî mezin ji bo vî tiştî ew e ku yar, bi çavxwezaliya xwe û bit irs û xofa ku li şêr dinihêrebi wî awayî jî li evîndara xwe mêzedike ye. Li hember nihêrindina bi vî şiklî tu kesek nikare bisekine.²¹³

Cegerxwîn di helbestên xwe de şêr di awayên şêr, şêremê, şêremêr, nêreşêr, mêreşêr, şêrgelê de bi kar anîne. Ji bo şêrên mê peyva şepalê jî bi kar aniyê. Her wiha ji bo tirsê jî şêran jî şêresawê gotiyê.

²¹¹Cegerxwîn, g, r. 208.

²¹² Ertap, r. 122.

²¹³ Sönmez, r. 113.

Îro roja xebatê; serxwebûn e doza we
Dema jîn û felatê, li ku maye soza we
Hon tev **şêrêndi** latê, rovî kete koza we
Şikestine di matê; dijmin biriye boza we.²¹⁴

Xorto! Eger tu rabî, wek başokê herî çûk;
Ne xurt û şehreza bî, tu nastênî ji min mûk.
Ne wek **şêr** ûgura bî, bûkê didî bi tûtûk.
Ko bê tac û sera bî, tê çawan min bikî bûk.²¹⁵

Îro roja welêt e, pêş ve herin wekî **şêr**,
Jîn bo we pir seza ye, pir şerm e bo me ev rev.²¹⁶

Ji min re bankin **şêr** Silaheddîn
Çalak û mêrkuj, xort û sefdirrîn²¹⁷

Serê xwe tu rake kurê Erdeşêr
Li dijmin biqore wekî **nêreşêr**²¹⁸

Serê xwe ji xew rake ey **şêremê**
Bibîne çilo jin dijîn vê demê ²¹⁹

²¹⁴Cegerxwîn, a, r. 17.

²¹⁵Cegerxwîn, a, r. 17.

²¹⁶Cegerxwîn, a, r. 18.

²¹⁷Cegerxwîn, b, r. 140.

²¹⁸Cegerxwîn, e, r. 14.

²¹⁹Cegerxwîn, e, r. 18.

Dilovan û zana û serbest û mêr

Di rojên şeran de bibî **mêreşêr**²²⁰

Ez bûm xezûrê axê

Bûm **şêrgelê** nav taxê²²¹

Tîr li dil dan şox û şengê

Şêresawê xo pilingê²²²

Pismamê Guhderz çare nema ye

Destê xwe rake wek şêrî û **şepal**²²³

3.1.3.2. Asik/Ahû/Xezal

Di edebiyatê da xezal, bi çavên xwe û bi bîhna xwe ya xweşik û newêrektiya xwe û nazdariya xwe li yarê hatiye şibandin. Ji ber ku çavên wê girover, girs û mezin in û reşqemer in, çavên yarê tîne bîra mirovan. Ji bo ku bîhna mîskê jê tê li bîhna porê yarê hatiye şibandin.²²⁴

Cegerxwîn jî di van malikan de xezal di wateya delalî û nazikiyê bi kar aniye.

Sedê bîsta ye dixwazî bikujî bê gunehan

Kengî **asik** dikujî şêra divê çax û demê²²⁵

Di jînê de hemî candar dilîzin

²²⁰Cegerxwîn, e, r. 19.

²²¹Cegerxwîn, g, r. 65.

²²²Cegerxwîn, g, r. 178.

²²³Cegerxwîn, b, r. 148.

²²⁴Sönmez, r. 114.

²²⁵Cegerxwîn, c, r. 197.

Çi *asik* û çî kergoh û çî xenzîr²²⁶

Hêlevanê *asikên* deşta Xeten

Nêçîrvanê çiyayê rizde û ben²²⁷

Ew çavên di reş wekî *xezala*

Ew birhê zirav ji rengê dala.²²⁸

Ahû, keroşk û rovî, pez û dewar û kovî,

Wawik û hirç û gurg û şêr û piling û keftar.²²⁹

3.1.3.3. Rovî

Rovî bi fêlbaziya xwe ve tê zanîn. Gelek caran navê wî bi yê şêr re derbas dibe. Bi hêz û penceyên xwe ve nikare zora ajalên ji xwe mezintir û bihêztir bibe, ji ber vê yekê jî bi hîle û dekû dolabên xwe ve wan têk dibe.²³⁰

Rovî di edebiyatê de ji reqîb tê dirûvandin. Bi her tim nêçîrkirina xwe ve, bi lezokiya xwe ve, bi delaliya postê xwe ve, bi aqilê xwe ve, bi fêlbazî û hîlebaziya xwe ve tê behskirin.²³¹

Rovî di edebiyata kurdî ya devkî de cihekê girîng digire. Di gelek çîrok û metelokan de serleheng e û bi fenekî û fêlbaziya xwe derdikeve pêş. Heta di nava kurdan de êdî wek “Mam Rovî”, “Mamê Rovî” cih bûye û gava çîrok tên gotin bi van navan ve derbas dibe.

²²⁶Cegerxwîn, g, r. 167.

²²⁷Cegerxwîn, h, r. 25.

²²⁸Cegerxwîn, b, r. 187.

²²⁹Cegerxwîn, a, r. 27.

²³⁰ Ertap, r. 170.

²³¹ Aslanoğlu, r. 433.

Cegerxwîn di wan helbestên xwe yê ku navê rovî tê de derbas dibin de, her tim aliyê rovî yê fêlbaziyê û bêhêziyê derxistiye pêş û gotiye divê mirov xwe di destên mirovên wekî rovî de şerpeze neke.

Îro roja xebatê; serxwebûn e doza we
Dema jîn û felatê, li ku maye soza we
Hon tev şêrêndi latê, **rovî** kete koza we
Şikestine di matê; dijmin biriye boza we.²³²

Weke şêr û pilingan em diçûn hev,
Penîr **rovî** ji meydanê hilanî.²³³

Ji nûve gote **rovî**:
Seydayê hov û kovî!²³⁴

3.1.3.4. Gur

Ji ajalên kûvî ye. Êrîşî keriyên pêz dike û zikê wan diqelêşe û wan dixwe. Gava diçe nêçîrê bêdeng e û hêdîka nêçîra xwe dike. Ji ber vê sedemê dibêjin gur bi hizr û bîr e. Ji ber ku temenê wan jî dirêj e ji wan re dibêjin “Gurê Pîr” an jî “Gurê Barandîtî”. Gava gelek birçî bibe dadikeve gundan û dîk û mirîşkan jî dixwe. Gelek caran êrîşî mirovan dike û zerarê dide wan jî.²³⁵

Gur ji zamanên berê heta niha ketiye nava keriyên pêz û êrîşî mirovan kiriye û zerar daye mirovan. Ji ber vê yekê di çavkaniyên dînî û di edebiyatê de ji bo tiştên xirab û bi zerar wek amûrê şibandinê hatiye bikaranîn.²³⁶

²³²Cegerxwîn, a, r. 17.

²³³Cegerxwîn, b, r. 55.

²³⁴Cegerxwîn, d, r. 49.

²³⁵ Ertap, r. 159.

²³⁶ Aslanoğlu, r. 427.

Cegerxwîn di helbestên xwe de gur bi taybetiyên wî yê kûvîbûn û harbûnê ve aniye ziman. Ji ber vê yekê gur bi awayê “gurê har”, “gurê harê dev bi xwîn” di helbestên xwe de nivîsiye.

Xorto! Eger tu rabî, wek başokê herî çûk;

Ne xurt û şehreza bî, tu nastênî ji min mûk.

Ne wek şêr û **gura** bî, bûkê didî bi tûtûk.

Ko bê tac û sera bî, tê çawan min bikî bûk.²³⁷

Em kurd û **gur** yek in, ya destebirakê hev in,

Em jî weke we, tim li ser çiya direvin.²³⁸

Dewlet û welat hemî bighên me,

Dijmin bikujin weke **gurê** har.²³⁹

Ne çûne cem dostê xwe, dostê pîs û derewîn,

Dijûn kirin mihamî, **gurê** harê dev bi xwîn.²⁴⁰

Êrîş dibin wan ew **gurên** devlok

Dikevin çola wekî pîrhevok²⁴¹

3.1.3.5. Keftar

Keftar di çanda Kurdan de ji bo berjewendiyê bûye remz û sembol. Mirovên ku di derfeteke biçûk de zeraê didin mirovekî yan jî mirovan bi keftar tîn şibandin. Lewra keftar

²³⁷Cegerxwîn, a, r. 17.

²³⁸Cegerxwîn, a, r. 69.

²³⁹Cegerxwîn, b, r. 32.

²⁴⁰Cegerxwîn, b, r. 118.

²⁴¹Cegerxwîn, c, r. 77.

gava ku firsenda xwe dibînin, diçin nêçîra ajalên din ji wan didizin û dixwin. Bi gelemperê jî nêçîrê nakin û goştê ajalên mirarbûyî dixwin.

Keftar ajalekî goştixer û bi qasî gur mezin e û kûvî ye. Bi giştî li Efrîqayê û erdên germ dijî. Keftar bi goştê mirariyan zikê xwe têr dike û ji aliyê dîtbariyê ve jî hinekî kirêt e. Tevî ku diran û penceyên wî pir tûj in jî ajalekî newêrok e û goştê ajalên mirarbûyî dixwe. Gava bi tenê serê xwe be zû bi zû êrîşî mirovan jî nake. Bi roj, xwe di şkeftan de vedişêre û şev jî carinan êrîşî gundan dike. Heta dibêjin ku carinan cendekê mirariyan ji gorên wan dertîne û dixwe.²⁴²

Cegerxwîn, keftar, ji aliyê xwarina mirariyan ve di nava helbestên xwe de cih kiriye.

Dixist serê min hevsar

Dixapandin wek **keftar**²⁴³

Berê rengê pilingan ez bi saw bûm

Ji ber xapan, niha ez bûme **keftar**²⁴⁴

Herê ew fihris û ew mêr û xwînxwar

Di bin destê neyaran bûne **keftar**²⁴⁵

Mêr û gernas tê nemane, şêr û ejder jê revîn,

Rovî û **keftar** dilîzin bore bore hirç û ga.²⁴⁶

²⁴² Gören, r. 503

²⁴³ Cegerxwîn, d, r. 78.

²⁴⁴ Cegerxwîn, d, r. 207.

²⁴⁵ Cegerxwîn, j, r. 59.

²⁴⁶ Cegerxwîn, a, r. 186.

3.1.3.6. Wawik

Wawik ajalekî êrîşkar e û bi zerar e. Ji ber vê yekê di edebiyatê de wek ajalekî xirab, zi zerar û kirêt derbas dibe. Bi van taybetiyên xwe ve bi ajalên delal û bi esalet ve tê hevrûkirin û wek berevajiyê qencî û başiyê tê nîşandan.²⁴⁷

Wawik ji ajalekî gostxwer e û kûvî ye. Gelemperî li deşt û çolan de dijî û mezinahiya xwe ve ji gur biçûktir e. Gelemperî şev digere û bi goştê ajalên mirarbûyî ve zikê xwe têr dike. Li dû şêr û pilingan digere û goştê ku ji ber wan dimîne dixwe.²⁴⁸

Ahû, keroşk û rovî, pez û dewar û kovî,

Wawikû hirç û gurg û şêr û piling û keftar.²⁴⁹

3.1.3.7. Kerkedan

Kerkedan di nava ajalên bejayê de ji aliyê girsîyê ve ajalê herî girs yê sêyemîn e. Li welatên germ dijî. Li ser pozê wî yek yan jî du qiloçên wî hene. Kerkedan bi gelemperî ajalekî henûn e. Lê gava ku birîndar bibe yan jî bikeve tengasiyê pir hêrs dibe. Dijminê fîl e û li ku derê hev du bibînin şer dikin. Ji ber mezinahî, girsbûn, çerm û hêza xwe ve bûye mijara helbestan.²⁵⁰

Ji ber ku kerkedan û fîl neyarên hev in, Cegerxwîn di nava malikê de rewşa kurdan ya ku tu car li hev nakin û her tim şerê navxweyî dikin şibandiye rewşa fîl û kerkedan.

Ji bo hev em çi fîl û **kerkedan** in

Di bin destê neyaran em şivan in²⁵¹

Li çar aliyê pakê me dikuştin

Di nav me de **kerkedan** û fîl nehiştin²⁵²

²⁴⁷ Aslanooğlu, r. 415.

²⁴⁸ Gören, r. 394.

²⁴⁹ Cegerxwîn, a, r. 27.

²⁵⁰ Gören, r. 432.

²⁵¹ Cegerxwîn, j, r. 63.

²⁵² Cegerxwîn, j, r. 66.

3.1.3.8. Mar/Koremar

Di helbesta Dîwanê de porê yarê û ax û nalînên aşiq ji aliyê şiklî ve bi maran tê şibandin. Ji aliyê dirêjayî, xwarî, jehr û reşbûnê ve mar tên nixandî û bi van taybetiyên xwe ve dikevin nava helbestan. Li gorî hinek efsaneyan xezîne ji aliyên maran ve tên parastin û ji van maran hinek 100 salan jî dijîn û ejderha ne. Dibêjin mar salê carekê jehrê bi dest dixê û vê jî bi vexwarina dilopa barana nîsanê ve bi dest dixê.²⁵³

Cegerxwîn di helbestên xwe de ajalê mar, carinan ji aliyê neyariya mar û mirovan, carinan jî bi wateya wî ya di helbesta Dîwanê de derbas dibe de bi kar aniye. Di helbesta Dîwanê de jî gelemperî por û keziyên yarê bimar tên şibandin.

Ê neyar in, pir bi jehr in rengê **mar**,

Ê ko dost in, hîlekar in, sehredar.²⁵⁴

Qews û qezeh du ebrû bisk û kezî ji **maran**,

Rûniştî textê Dara taca keyan li ser ser.²⁵⁵

Ger millet rabî ji xew tev tene kuştin rengê **mar**.²⁵⁶

Divê netirsin, dêw û dijwarî

Têxin bin ligan, weke **serê mar**.²⁵⁷

Mi dî çav û birû tev de dilîzin

Me zanî ev ne şêx e **koremar** e²⁵⁸

²⁵³Pala, r. 297.

²⁵⁴Cegerxwîn, a, r. 61.

²⁵⁵Cegerxwîn, a, r. 214.

²⁵⁶Cegerxwîn, b, r. 22.

²⁵⁷Cegerxwîn, b, r. 32.

²⁵⁸Cegerxwîn, b, r. 146.

Çax û benga min, bejna wî zirav

Jehra **marê** reş bikevî dirav²⁵⁹

3.1.3.9. Hirç û Kudik

Hirç ajaleke/î kûvî ye û goşt xwer e. Laşê wê hinekî gir e û hêdîka dimeşe. Lê eger ku bixwaze, dikare pir xweş baz bide. Hirç zivistanê şeş mehan radizê. Ji bo razana xwe cihekê tena û teser dibîne û wê derê bi pelên daran û giyayan dinixumîne û li wê derê dikeve xewê. Hirç ji hingiv jî gelek hez dikin û di qorikên daran de li hingiv digerin û dixwin. Hirç ji goştê mirariyan hez nakin û naxwin.²⁶⁰

Kudik, ji çêlika hirçê re tê gotin.²⁶¹

Di çanda kurdan de hirç wek remza nezanî û hovitiyê ve cih digire û Cegerxwîn jî di helbestên xwe de gelemperî di van wateyan de bi kar aniye.

Ne ez perî me e'jî mirov im

Wek te kedî me ne **hirç** û hov im²⁶²

Dixwazim bijîm ez wek mirova

Naxwazim bijîm wek **hirç** û hova²⁶³

Dijminê xwînxwar **hirç** û hov û har

Rengê gurê har bi jehr û dijwar

Hov û bê mijî tê min dikuji²⁶⁴

²⁵⁹Cegerxwîn, b, r. 157.

²⁶⁰Gören, r. 377.

²⁶¹Zana, Farqînî (2010), *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Çapa sêyem, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, r. 1055.

²⁶²Cegerxwîn, b, r. 124.

²⁶³Cegerxwîn, c, r. 49.

²⁶⁴Cegerxwîn, c, r. 49.

Ew gundiyên **hirç** û hov

Bi zor me kirne mirov²⁶⁵

Bi ber pêlan ketim bê doz û daxwaz

Dinalim ez wekî **hirçê** birîndar²⁶⁶

Belam çende bûrîne ev meh û sal

Kudik qet nebûne keroşk û xezal²⁶⁷

3.1.3.10. Piling

Piling cureyek ji famîleya pisîkan ya mezin e û ev heywana him bi hêza xwe û him jî bi reva xwe ya bi lez navdar e.²⁶⁸

Gava navê piling di wateya têgehên aşiq-yar, nêçîr-nêçîrvan de derbas dibe, yar bi nîşaneyên rûyê xwe ve bi piling, dilê aşiq jî bi xezaleke ku dê were nêçîrandin tên şibandin.²⁶⁹

Cegerxwîn di van malikan de him di wateya ku di helbesta Dîwanê de derbas dibe, him jî ji aliyê hêz û qaweta wî ve nivîsiye.

Wa şiyar bûne kurên te tim li kar in wek **piling**,

Çar kenarên te dibazin wek Cegerxwîn qîr û deng.²⁷⁰

Zirav e şox û şeng e

Delal e pir çeleng e

Bi awiran **piling** e

²⁶⁵Cegerxwîn, d, r. 42.

²⁶⁶Cegerxwîn, d, r. 207.

²⁶⁷Cegerxwîn, e, r. 26.

²⁶⁸Sönmez, r. 113.

²⁶⁹Ertap, r. 146.

²⁷⁰Cegerxwîn, a, r. 119.

Şêrîn şeker dirêjî²⁷¹

3.1.3.11. Beraz/Xenzîr

Li gorî baweriya misilmanan goştê berazan nayê xwarin. Di Qur'an'ê de û di pirtûkên hedîs û fiqhê de beraz wek "xinzir" derbas dibe û "necîsu'l-ayn" e. Ango her cihê wî necîs e û ji vî ajalî nayê îstîfadekirin. Li Qur'an'ê de, di çar ayetan de behsê herambûn û necîsiya wî tê kirin. Li gorî baweriya cihûyan jî beraz haram e. Lê file beraz xwedî dikin û goştê wî jî dixwin.

Di edebiyatê de jî ji ber bandora Îslamî, beraz bi gelemperî ji bo şibandinên tiştên xirab û kirêt tê bikaranîn.²⁷²

Ajaleke/î ku di dînê Îslam'ê de xwarina goştê wî hatiye heramkirin e. Ji ber vê yekê di nava edebiyatê de bi awayekî nebaş derbas dibe û ji bo heqaretê tê bikaranîn.²⁷³

Hevsar medin dest borcewaz

Mebin çêra hirç û **beraz**²⁷⁴

Di jîne de hemî candar dilîzin

Çi asik û çi kergoh û çi **xenzîr**²⁷⁵

Ew mirovên hov û mêrkuj

Wek **beraz** in ceng û şer²⁷⁶

3.1.3.12. Fîl

Fîl ajalekî girs û mezin e. Di edebiyatê de bi gelemperî li gel ajalên biçûk tê qiyaskirin û bi vî awayî di helbestan de derbas dibe.²⁷⁷

²⁷¹Cegerxwîn, c, r. 297.

²⁷² Aslanoğlu, r. 417.

²⁷³ Ertap, r. 138.

²⁷⁴Cegerxwîn, f, r. 16.

²⁷⁵Cegerxwîn, g, r. 167.

²⁷⁶Cegerxwîn, h, r. 77.

Fîl, di lîstoka kişikê de navê kevirekî lîstokê ye. Di nava helbestan de wek “pîl” jî derbas dibe.²⁷⁸

Bi girbûn û mezinahiya xwe ve di nav helbestan de derbas dibe. Gelemperî li aliyê Hindîstanê dijî. Zemanê berê di şer de ji bo siwariyê dihat bikaranîn.²⁷⁹

Bi pêşve herî payedar rengê *fîl*

Perîrû ji bo te bikin lîle-lîl²⁸⁰

3.1.3.13. Kêvroşk/Kêrgoh

Kêvroşk bi biçûkbûn û xweşikiya xwe ve tîn zanîn û xewa wan sivik e û postê wan jî biqîmet e. Dilê yarê ji aliyê newêrokiyê ve bi kêvroşkê hatiye şibandin.²⁸¹

Kêvroşk li nava zeviyan, daristanan û rêlên daran de dijîn. Kêvroşkên kûvî li çol û çiyaran de dijîn û yên kedî jî hene û li malan û koxikan de tîn xwedîkirin.²⁸²

Di jîne de hemî candar dilîzin

Çi asik û çî *kerghoh* û çî xenzîr²⁸³

Belam çende bûrîne ev meh û sal

Kudik qet nebûne *keroshk* û xezal²⁸⁴

3.1.4. Ajalên Biçûk

Zimanê kurdî ji aliyê navên kêzikên biçûk û ajalên din yên biçûk ve gelek dewlemend e. Cegerxwîn jî ji vê dewlemendiyê sûd girtiye û di helbestên xwe de car caran navên ajalên biçûk jî nivîsandine.

²⁷⁷ Aslanoğlu, r. 419.

²⁷⁸ Pala, r. 157.

²⁷⁹ Ertap, r. 144.

²⁸⁰ Cegerxwîn, e, r. 44.

²⁸¹ Ertap, r. 168.

²⁸² Gören, r. 504.

²⁸³ Cegerxwîn, g, r. 167.

²⁸⁴ Cegerxwîn, e, r. 26.

3.1.4.1. Dûpişk

Bi dûvê wê ve derziyek heye û di wê derziyê de jî jehr heye. Dûpişk bi derziya xwe ve bi mirovan vedide û wan dijehrîne. Bi gelemperî di nîvê şevê de ji qulika xwe derdikeve û di ronahiya hîvê de tê dîtîn. Dûpişk bi mirovan vedide û wan dikuje ji ber vê yekê di nava edebiyatê de ji bo mirovên xirab tê bikaranîn.²⁸⁵

Di çanda kurdan de dûpişk gelemperî wek remza bêbextiyê derbas dibe. Her wiha ji bo neyaran jî tê bikaranîn. Cegerxwîn jî di vê malikê de di vê wateyê de bi kar aniye.

Di bin lingê xwe de deynin serê dijmin wekî **dûpişk**

Li ser pozê xwe deynin wê gula nû pişkiwî xar e²⁸⁶

3.1.4.2. Qumbil/Qimil

Qimil ji ajalên nîvper e. Qurmê giya, kulîlk, pel û geniman dimêjin û dixwin û di nava giya de dibin sedema nexweşiyê. Kêzik e û laşê wê dişibe mertalan.²⁸⁷

Cegerxwîn jî di vê malikê de aliyê qimilê yê zerardanê derxistiye pêş. Her wiha Cegerxwîn qimil wek metafora kesên biyanî ku hatine di cih û warê wî de zerarê didine wî de bi kar aniye.

Hawar hewar

Hawar hewar!

Van **qumbilan**

Genmê me xwar.²⁸⁸

3.1.4.3. Mûristan/Mûrî

Di edebiyatê de ji ber ku li gel Silêman Pêxember serpêhatiya heye tê bikaranîn. Serpêhatî jî wiha ye:

²⁸⁵ Ertap, r. 172.

²⁸⁶ Cegerxwîn, b, r. 43.

²⁸⁷ Güncel Türkçe Sözlük Çalışma Grubu (2009), *Türkçe Sözlük*, Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları. r. 1155.

²⁸⁸ Cegerxwîn, d, r. 13.

Rojekê Silêman Pêxember li gel artêşa xwe diçe seferê. Gava gihaştine newalekê mîrê moriyan ji moriyan re gotiye: “Birevin, da ku artêşa Silêman we neperçiqîne.” Silêman Pêxember jî van gotinên moriyê bihîstine û gîrniyê û mîrê moriyan gazî nik xwe kiriye. Mîrê moriyan bi raneke kuliyê ve ya ku ji bo wê pir biqîmet bû hatiye hizûra Silêman Pêxember. Bi duaya Hz. Silêman ev ranê kuliyê bi bereket ketiye û bi nivê wê ranê hemû artêşa Hz. Silêman têr bûye. Nivê mayî jî dîsa daye moriyê û ji wê şîret xwestiye. Moriyê jî şîret li Hz. Silêman kiriye. Hz. Silêman ji moriyê re gotiye: “Ez pêxember im û te çawa bawer kir ku ez ê te û hevalên te biperçiqînim û te ji wan re got birevin?” Moriyê jî jê re gotiye: “Min got dê bi vê heybeta te tenbîhên te ji bîr bikin.”²⁸⁹

Di edebiyata Dîwanê de morî bûye remza acz û feqîriyê, Hz. Silêman jî bûye remza desthilatdariyê.

Hero şêrê Silêman,

Diçû şarê *mûristan*.²⁹⁰

Binêr *mûrî* çixas hûr û weza ye

Di jînê da dikî talan û nêçîr.²⁹¹

3.1.4.4. Mişk

Mişk ajalekî kojer e û genim û dexilê ku mirov ji xwe re datînin embaran dizîkî ve dikirîne û dixwe. Zad û genimê ku mirov ji xwe re vedişêrin wek sermayeya mirovan tê hesabandin û mişk jî vê sermaye û mal û milkê wan xilas dike. Nefsa mirov jî gelek tiştên ku di destê mirov de ne dizîkî ve dixwe û xilas dike. Ji vî alî ve di edebiyatê de nefis bi mişkan tê şibandin.²⁹²

²⁸⁹ Pala, r. 412.

²⁹⁰ Cegerxwîn, a, r. 104.

²⁹¹ Cegerxwîn, g, r. 167.

²⁹² Aslanoğlu, r. 418.

Mişk, tevî ku biçûk e zerarên pir mezin dide. Xwarina xwe jî hêdî hêdî dikirîne û dixwe. Ev taybetiyên mişk yê sereke ne. Bi şev û roj li du xwarina xwe ye û ji ber vê taybetiya xwe ya nebaş bûye remza wan mirovan yê ku bi şev û roj ji bo vê dinyayê dixebitin.²⁹³

Kî hevalê **mişka** ye?

Ya kî hevalê rişka ye?²⁹⁴

3.1.4.5. Rişk

Ji hêka spih/spiyê re rişk tê gotin û Cegerxwîn di vê malikê de ji bo ku mirovên nebaş û xirab biçûk nîşan bide ji wan re rişk gotiye.

Kî hevalê mişka ye?

Ya kî hevalê **rişka** ye?²⁹⁵

3.1.4.6. Kêç

Kêç xwîna mirovan û ajalan dimêjin û wisa dijîn. Ji ber ku pir baş dipengize zû biz û nayê girtin. Kêzikeke pir biçûk e.²⁹⁶

Cegerxwîn jî di vê malikê de kêç bi wateya wê ya eslî de bi kar aniye.

Beg û şêx û axa nehişt herne pêş

Tevan em dimêtin wekî **kêç** û mêş²⁹⁷

3.1.4.7. Mêş

Di helbestên Edebiyata Dîwanê de mêş, bi nîşana rûyê yarê ve tê şibandin. Her wiha ajaleke pir biçûk e û li gel biçûkbûna xwe ji aliyê Xwedê (c.c.) ve pir bi huner hatiye xeliqandin û delîlê qudreta Xwedê (c.c.) ye.²⁹⁸

²⁹³ Ertap, r. 143.

²⁹⁴ Cegerxwîn, d, r. 90

²⁹⁵ Cegerxwîn, d, r. 90.

²⁹⁶ Güncel Türkçe Sözlük Çalışma Grubu, r. 1608.

²⁹⁷ Cegerxwîn, e, r. 87.

²⁹⁸ Aslanoğlu, r. 487.

Mêş bi rengê xwe yê reş, per û firîna xwe ve derdikeve pêş. Ji tiştên şêrîn pir hez dike û diçe dixwe. Ji bilî van tiştan ji ber ku mêş diçe ser pîsatiyê û nexweşî jê çêdibe bi awayekî nebaş di nava mirovan de tê dîtin.²⁹⁹

Beg û şêx û axa nehişt herne pêş

Tevan em dimêtin wekî kêç û **mêş**.³⁰⁰

3.1.4.8. Kulî

Kulî bi rehetî û teraliya xwe ve tê zanîn. Ji ber vê yekê bi mirovên ku amadekariya tişteki nakin û tevdîra xwe nagirin re tê şibandin. Mu'cîzeyê Kuliye, mu'cîzeyê ji neh mu'cîzeyên Hz. Musa ye. Ev mu'cîze di Qur'anê de jî derbas dibe. Ji ber vê yekê li gel navê Hz. Musa jî tê bikaranîn. Di edebiyatê de bi sê taybetiyên xwe ve derdikeve pêş: Talankirina wê ya geniman, teralbûna wê û mu'cîzeyê wê ya li gel Hz. Musa.³⁰¹

Kulî bi keriyên ve êrîşî zebze û geniman dikan. Bi vî alî ve artêşên mezin bi kuliyan ve tên şibandin.³⁰²

Kulî gava dikevin nava nava giya û geniman zerareke pir mezin didinê. Ji ber vê yekê mirovan her tim tevdîrên cur bi cur ji bo kuliyan girtine. Eger ku hejmara wan pir be û bikevin nava zeviyekê dikarin wê zeviyê di demeke kurt de xilas bikin.³⁰³

Ditirsim tu winda bibî wek **kulî**

Çi kara me tê de heye ev gilî?³⁰⁴

3.1.5. Ajalên Ku Di Nava Avê De Dijîn

Cegerxwîn heta salên xwe yên dawiyê, li welatê xwe jiyayê û hemû berhemên xwe di nav deşt, çiya, lat, gund û bajarên welatê xwe de nivîsandine. Li Kurdistanê bi qasî erdnîgariya derdora wê av û behr û derya tune ne. Ji ber vê sedemê ye ku di nava edebiyata

²⁹⁹ Ertap, r. r. 198-202

³⁰⁰ Cegerxwîn, e, r. 87.

³⁰¹ Aslanoğlu, r. 479.

³⁰² Ertap, r. 180.

³⁰³ Gören, r. 533.

³⁰⁴ Cegerxwîn, e, r. 90.

Kurdî ya devkî û nivîskî de jî peyv û têgehên av û behr û deryayan hindik in. Di nava helbestên Cegerxwîn de jî ev yek xwe xuya dike.

3.1.5.1. Masî/Gamasî

Li gorî baweriyên gelek berê dinya rast û deşt bû li dora wê Çiyayên Qafê hebûn. Dinya li gel Çiyaê Qafê di nava pêlên avê de dihat û diçû. Xwedê (c.c.), milyaketekê/î dişîne û milyaket masiyê hildide ser milê xwe. Di bin milyaketê/î de zinarek, di bin zinarî gayek, di bin gayî masiyek, di bin masiyê deryayek, di bin deryayê dogeh, di bin dogehê de jî ba û bahoz hebûn. Ji duwazdeh bircan, bircek jî Birca Masiyê ye. Di helbesta Dîwanê de ji ber ku masî di nava deryayê yan jî di nava avê de ye û bi tora masîgiran ve tê nêçîrandin, veherimîna xewê bi dil û canê aşîq ve tîn şibandin.³⁰⁵

Cegerxwîn di van malikan de mirovên ku tîn xapandin dişibîne rewşa masiya ku ketiye torê û dibêje êdî xilasbûna wan ji dest dijmin tune ye.

Yan wek miya tirsonek e bêhiş bi gur re bazdidî

Xweş ketiye tora dijmina, ev keftelefta **masî** ye³⁰⁶

Roja bibî tengasî

Hemî dibin **gamasî**³⁰⁷

3.1.4.2. Kevjal

Di edebiyatê de kevjal ji ber meşîna xwe, tevgerên xwe û di jiyana xwe ya nava avê de ketiyê nava helbestan. Kevjal rasterast bi rê ve naçe û ber bi kêlekên xwe ve dimeşe. Ji ber vê taybetiya wê jî ji mirovên ku rast nemeşin re kevjal tê gotin.³⁰⁸

Ew **kevjal**ên belengaz,

Çawa karin bibin baz?³⁰⁹

³⁰⁵ Pala, r. 294.

³⁰⁶Cegerxwîn, b, r. 64.

³⁰⁷Cegerxwîn, h, r. 79.

³⁰⁸ Gören, r. 624.

3.1.6. Ajalên Mîtolojîk

Wekî gelek helbestvanên edebiyata klasîk, Cegerxwîn jî di helbestên xwe de navên ajal û mexlûqên efsûnî û mîtolojîk bi kar anîne. Dêw û Ejdeha ji wan ajalan in ku di nava helbestên Cegerxwîn de derbas dibin.

3.1.6.1. Dêw

Ji bo mexlûqên xirab yê efsûnî dêw tê gotin. Hinekî girs in. Mexlûqên bi saw û hêzdar in. Di derheqê wan de baweriyeke wisa heye ku, wekî mirovan dijîn û mê û nêrên wan hene. Di dînê Zerdeştîyê de ji ruhên xirab re jî dêw gotine. Ji serokê wan re jî gotine Ehrîmen. Di dînê Zerdeştîyan de hejmara dêwan kifş nîn e. Dibêjin du cur dêw hene û hinek ji wan spî hinek jî reş in. Di destanan de lehengên destanê her tim bi dêwan re şer dikin.

Gustîla Silêman Pêxember ji aliyê dêwekê ve hatiye dizîn. Ji ber vê jî bi hunera telmîh (bîranîn)ê ve jî ji dêwan tê behskirin.³¹⁰

Hezar sal e ko ev **dêwê** mirovxwer,

Li ser çavên me danîbûn kitanî.³¹¹

Dijmin gihaye, bi top û leşker

Êrîş dibî me wek **dêwê** sêser³¹²

Devê xwe li me vekirye reş**dêw**

Ji xew ranabin, kurdên kurê Gêw³¹³

³⁰⁹Cegerxwîn, b, r. 193.

³¹⁰ Pala, r. 118.

³¹¹Cegerxwîn, b, r. 12.

³¹²Cegerxwîn, f, r. 48.

³¹³Cegerxwîn, f, r. 52.

3.1.6.2. Ejdeha

Ejdeha ji marên mezin re tê gotin. Li gorî baweriyekê ejdeha bi ecela xwe ve namirin, bes bi destê yekê tîn kuştin. Marên ku 100 salan dijîn dibin ejdeha. Gava ku mar dibe ejdeha jî ji devê xwe agir diavêje û bi nefesa xwe ve ajalên din dadiqurtîne. Li ser vê yekê milyaket jî ejdeha digirin û diavêjin piştî Çiyayê Qafê. Paşê jî serên ajalên ku jê re ejder û ejdeha tê gotin zêde dibin û piyên wî jî derdikevin.

Di edebiyatê de ejdeha li şûna porê yarê tê bikaranîn. Lewra porê yarê ê kurîşk dişibe ejdeha. Por, bi pîrbûna zulfên xwe ve dişibe serê ejdeha. Her wiha tê gotin ku xezîneyên bisêhr jî ji aliyê ejdehayên ve tînin parastin.³¹⁴

Meger şêrîn im ez *ejdeha* me

Tu min dibênî ez wek bihok im

Li min binêre çî pîrhevok im³¹⁵

3.2. Awayê Bikaranîna Ajalan

Cegerxwîn di helbestên xwe de navên ajalan di nava gelek cureyên edebiyata devkî de bi kar anîne. Jixwe edebiyata kurdî ya devkî, ji vî alî ve gelek dewlemend e. Di nava helbestên Cegerxwîn de gelek gotinên pêşyan û biwêj hene ku ji navên ajalan pêk hatine. Her wiha Cegerxwîn navên ajalên diwate û nêzwate jî di hinek malikan de bi hev re bi kar anîne. Di malikekê de em dibînin ku peyveke hevdeng jî ji navê ajalekê çêkiriye. Hinek malikan de jî herî kêr navê du-sê ajalan bi hev re nivîsiye. Cegerxwîn di nava helbestên xwe de bi ajalan ve têkildar mezmûnên edebiyata klasîk jî bi kar anîne.

Cegerxwîn hinek helbestên xwe bi tevahî li ser gotûbêjên ajalan nivîsîne. Her wiha di hinek malikan de rasterast navên ajalan derbas nebe jî bi jiyana ajalan ve têkildar peyv û lêker derbas bûne.

³¹⁴ Pala, r. 136.

³¹⁵Cegerxwîn, b, r. 126.

3.2.1. Di Nav Gotinên Pêşyan De Ajal

Zimanê kurdî ne tenê bi bêje û gotinên xwe, her wiha bi biwêj û şayesên xwe, bi pend û şîretên xwe û bi gotinên pêşyan xweşik û dewlemend e. Hin caran bi gotinek bi tenê dikare daxwaza mirov bi awayekî pir xweş derbibe.

Gotinên pêşyan ezmûn û tecrûbeyên mirovan ên bi hezaran salan nîşan didin. Bi guherîna civakê re ew jî diguherin. Her dem û serdem hinek pêdiviyên civakî, hinek bîr û ramanên felsefî derdixin pêş, li gorî wê jî hinek ji wan gotinan zêdetir derdikevin pêş. Wekî mînak em dikarin gotina “Şêr şêr e, çî jin e, çî mêr e.” bidin.³¹⁶

Di zimanê kurdî da bi taybetî di nav zargotina kurdan da mesele û metelok gotin, nimûnedayîn an jî îdyom bikaranîn pir in. Kurd di axaftinên xwe da esse vana bi kar tînin. Jiber vê sedemê jî zimanê me pir dewlemend û xweşik dibe. Lewma galegalên kal û pîran bi saet bi rojan tînin guhdarîkirinê. Jiber vê sebebê yê ku mirov naxwaze dawiya çîrok, hikyat an jî serpêhatiyên wana bê, dixwaze ewana her bêjin mirov jî guhdarî bike. Belku bi wan bêjeyên hunerî însan hin xweştir tê digihîje ku meremê wana çî ye, çî dixwazin bêjin.³¹⁷

Cegerxwîn jî gotinên pêşyan yên ku navên ajalan di nav de derbas dibin û di edebiyata kurdî ya devkî de hene, bi hostetiyê baş di nava helbestên xwe de bi kar anîne.

Porê serî te sor e, weke gula zinara,

Serê te kehrûba ye, mû distînî ji **mara**.

Ayîneya Skender, çavê te bû li dara...³¹⁸

Berîkên we tê de hene zêrê sor,

Berîkên me tê de hene **marê** kor.³¹⁹

Digel **gur** dixwin goştê **berxê** û **kar**,

Digel min dikêşin hezar ah û zar.³²⁰

³¹⁶ Mehmet, Oncu (2009), *Gotinên Pêşyan*, Çapa yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, İstanbul, r. 5.

³¹⁷ Ahmet Cengiz, Çamlıbel (1997), *İdyomên Kurdî*, Çapa yekemîn, Weşanên Deng, İstanbul, r. 7.

³¹⁸ Cegerxwîn, a, r. 160.

³¹⁹ Cegerxwîn, a, r. 173.

Şêx û beg û axa şivanê millet, lê dijmin

Bi **gur** re dixun û bi xwedî re heznê dikşînin.³²¹

Çi qas delal im porim ji zêr e,

Belê we xwestim nizam ji kê re

Rovî revandim ji destê **şêr** e.³²²

Li Şam heft mişar **gayek** davêjin,

Eger dûr e Şam; lê va ye mişar.³²³

Zanibe ey dewlemend jîna **segê** har çil şev e

Kuştiyê destê şivan û karker û cotar e ew³²⁴

Xwedî ku **pez** berdî çiyê, ser têxî tamara xewê

Her kes dizanî, ko **gur** û **wawik** û diz dibin xwedî.³²⁵

Ê ket bin lingê **devê**

Mirin tenê jêr divê.³²⁶

Serê xo tu rake ji xew carekê

³²⁰Cegerxwîn, a, r. 173.

³²¹Cegerxwîn, b, r. 170.

³²²Cegerxwîn, b, r. 17.

³²³Cegerxwîn, b, r. 31.

³²⁴Cegerxwîn, b, r. 44.

³²⁵Cegerxwîn, c, r. 138.

³²⁶Cegerxwîn, d, r. 90.

Hezar **pez** mexel tèn li bin darekê.³²⁷

Ku **şêr şêr** e carek çî jin û çî mêr

Metirsêne carek bi mizgeft û dêr³²⁸

Biborin di min xwendewarê mezin

Eger şiv li **hespan** nedî nabezin.³²⁹

Lê guh nedin ez-ezî

Fêde nakin sed xwezî

Ez bê ez, tu bê ez

Wê **gur** bikevî nav **pez**.³³⁰

Kurdan berê gotiye

Bibîn pirsî pêşiya

Sê tişt hene bi dilêş

Mirîşk û **mêş** û derwêş.³³¹

Kundên serê şikêra

Nakevin şûna **şêra**.³³²

³²⁷Cegerxwîn, e, r. 36.

³²⁸Cegerxwîn, e, r. 70.

³²⁹Cegerxwîn, e, r. 124.

³³⁰Cegerxwîn, h, r. 26.

³³¹Cegerxwîn, h, r. 80.

³³²Cegerxwîn, h, r. 80.

3.2.2. Di Nav Biwêjan De Ajal

Biwêj ew tişt e ku, mirov bixwaze bûyerekê, rewşekê, têgehekê bi bandoreke zêdetir vebêje yan jî binivîse, herî kêr du-sê komên peyva ve vê tiştê bibêje ye. Carinan tişteki ku mirov bi çend hevokan ve bibêje dikare bi hevokeke biwêjê ve bibêje û axaftina xwe hêsan bike. Di nava biwêjên edebiyata kurdî ya devkî de jî bi navên ajalan ve gelek biwêj hene û Cegerxwîn ev biwêj di helbestên xwe de bi kar anîne.

Ta kengî emê karkerê axa û bega bin

Ta kengî emê hestiyê ber lingê **sega** bin.³³³

Xwedî li jor dizanî em ji bo çi dane

Çima girtî û dîl bin weke **berxa** di nav koz.³³⁴

Dixwazim şiyar bin, bibin rêçevan

Ji bo ku nebin em **pezê** bê şivan³³⁵

Ey kurdê ko navdar î di bin destê neyaran çikesî tû

Wek **şêrê** girêdayîbi zincîrê di qeyd û qefes î tû³³⁶

Çavên xwe veke guh bide karwanê biratî vediborin

Xem nakî eger çend **segên** bê tore li pey wan e diqorin³³⁷

³³³Cegerxwîn, b, r. 51.

³³⁴Cegerxwîn, c, r. 28.

³³⁵Cegerxwîn, e, r. 125.

³³⁶Cegerxwîn, b, r. 68.

³³⁷Cegerxwîn, b, r. 69.

3.2.3. Di Nav Ajalan De Dijberî

Tezad wate dijberî, ku jê re mutabiqe yan tibatq jî dibêjin. Tezad li cuwankariyê de ewe, ku bêjer yan nivîskar du yan çend peyvên ku wateyên wan dijî hevdu be, bîne. Em li kurdî da dikarin navê dijberiyê li tezaadê bikin.³³⁸

Di nava ajalan de hinek ajal hene ku di jiyana rojane ya rastî de nemimkun e ku werin cem hev. Lewra jiyana ajalekê ji wan, li ser xwarina ajalê din berdewam dike. Yek nêçîr e û yek jî nêçîrvan e. Her wiha hêza hinek ajalan jî wekhev nîn e û ji aliyê hêzdariyê ve di wateyê de nêzî hev nîn in. Em dikarin çend mînakên wek “Gur û Pez”, “Mî û Gur”, “Gur û Berx”, “Gur û Bizin”, “Pisîk û Şêr”, “Şêr û Kew”, “Şêr û Berx”, “Şêr û Asik”, “Çûk û Mar”, “Şêr û Rovî”, “Kudik û Kêroşk û Xezal” bidin.

Cegerxwîn ev ajalên dijberî hev di nava helbestên xwe de bi kar anîne.

Xameya çalak tu binivîse bi lez,

Wa li gerdûşê dinê bû **gurg û pez**.³³⁹

Nezanim ez, digel jînê dibazim

Weke **berxê** di nav pencên **gurê** har³⁴⁰

Tu cewrên **guran** jî çi mêr û çi jin

Kedîkî, xwedîkî dibin qet **bizin**?³⁴¹

Ko em ji dijmin, carek netirsin, dijmin ditirsî,

Em penêr ew kêr, lê ko bibin mêr, ew penêr, em kêr.

Eger em neşkên, bi xwe ew dişkê, divê ko bişkê

Em **pisîk** ew **şêr**, lê ko bibin mêr, ew **pisîk** em **şêr**.³⁴²

³³⁸ Perwîz, Cîhanî (2010), *Mem û Zîn-Ehmedê Xanî*, Çapa yekem, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 54.

³³⁹Cegerxwîn, a, r. 61.

³⁴⁰Cegerxwîn, d, r. 206.

³⁴¹Cegerxwîn, e, r. 29.

Min go: Belkî tu **şêr** î

Lê xuya ye **pisîk** î³⁴³

Yan wek **mîya** tirsonek e bêhiş bi **gur** re bazdidî

Xweş ketiye tora dijmina, ev keftelefta masî ye³⁴⁴

Çend sal li ser hev ev hawar û qîr

Medxwest bibî **şêr**, lê tu bûyî **kew**.³⁴⁵

Diran ji hev bi devkenî

Şêr bêjî **berxê**: - Ezbenî

Xap û fenê pîs û genî

Lê **berx** çizanî rav e ew³⁴⁶

Belam çende bûrîne ev meh û sal

Kudik qet nebûne **kerişk** û **xezal**.³⁴⁷

Gemar û qelêr tev bibin zîv û zêr

Ne şerm e ko **rovî** siwar bî li **şêr**.³⁴⁸

³⁴²Cegerxwîn, b, r. 42.

³⁴³Cegerxwîn, g, r. 17.

³⁴⁴Cegerxwîn, b, r. 64.

³⁴⁵Cegerxwîn, c, r. 33.

³⁴⁶Cegerxwîn, c, r. 47.

³⁴⁷Cegerxwîn, e, r. 26.

³⁴⁸Cegerxwîn, e, r. 122.

Ne mizgeft û ne jî dêr

Ez pê nabim xwedî xêr

Çûk im ketim devê **mêr**.³⁴⁹

Çilo **asik** dilê **şêran** derênin

Serê bûye spî, ez mame sergêj³⁵⁰

3.2.4. Di Nav Ajalan De Nêzwateyî

Mura'atunnezîr yan tenasûb ewe, ku kesek li nivîsîn yan axiftinên xwe da navên çend tiştên ku hevbabet bin û têkeliya wan bi hevdura hebe û hevpeywend bin, bîne. Ev hinde jî axiftin û nivîsînê ciwan û balrakêş dike.³⁵¹

Cegerxwîn jî di helbestên xwe de navên ajalên ku jiyana wan ya bi hevreyî mimkun be û yan jî ji aliyê hêzdariyê nêzîkî hev bin bikaranîne. Wek mînak têkiliya di navbera berx û miyê wekî ya dayik û çêlikê ye û pêkan e ku ev her du ajal bi hev re bijîn. Lê têkiliya di navbera şêr û piling de ne wisa ye. Şêr û piling tenê ji aliyê hêzdariyê ve nêzî hev in û ne pêkan e ku ev her du ajal li cem hev bijîn.

Kum û tac û kofî ketin ber piya,

Weke **berxê** mîjo herin ber **miya**.³⁵²

Delal e pozbilind e, çeleng û şemşematî ye

Ji kuştina dilan re pir xurt û jêhatî ye

Kezî û bisk û ebrû, **şêr û piling** û xwînxwar in.³⁵³

³⁴⁹Cegerxwîn, g, r. 30.

³⁵⁰Cegerxwîn, h, r. 171.

³⁵¹Cîhanî, r. 56.

³⁵²Cegerxwîn, a, r. 108.

³⁵³Cegerxwîn, c, r. 237.

3.2.5. Bi Navên Ajalan Ve Hevdengî

Hinek bêje hene ku ji aliyê teşe û dirûv ve wekî hev in, lê wateya wan ji hev cuda ye. di kurdî de bêjeyên bi vî rengî bi qasî bêjeyên hemwate ne zêde bin jî, peyda dibin. Hinek bêje jî her çi qas dengê wan ne yek be jî, awayê nivîsandina wan yek e. Em dikarin van peyvan wekî “hevrenge” bi nav bikin. Peyvên hevrenge ji ber du dengên ku heman tîpê hatine nîşandan, pêk hatine.³⁵⁴

Cegerxwîn di vê malikê de ajala ker û peyva ker ya ji bo nebihîstinê tê gotin bi kar aniyê. Ev her du peyv di nivîsê de wekî hev in, lê di axaftin û wateyê de wekî hev nîn in.

Nizam **ker** e yan jî **ker**?

Ez bi gurzan tême ser³⁵⁵

3.2.6. Bi Navên Ajalan ve Cotepeyv

Dema ku mirov bala xwe dide cotepeyvvan, mirov dibîne ku hinek ji wan hemwate ne. Hinekan wateya wan nêzî hev e û hinek jî di jwate ne. Mirov dixwazin bi cotepeyvê ve wateya peyvê xurt bikin, bi alîkariya du peyvan têgiheke gelemperî bi dest bixin, her wiha dema ku vê yekê dikin hem ji aliyê wateyê ve hem jî ji aliyê denganiyê ve peyvên têkildarî hev dineqînin.³⁵⁶

Cegerxwîn di nava helbestên xwe de gelek caran cotepeyvên ajalan bi kar aniyê û xwendina helbestên xwe bi van cotepeyvvan xurt kiriye.

Li ser tenişta rastê datênin ber bi jêr,

Li **mişk û mara** dibî dabaş û mizgîn.³⁵⁷

Tirsim ji te pir dûr kevim, dîsa di axa kûr kevim,

Nêv pencê **mar û mûr** kevim, aman ji destê dûriyê.³⁵⁸

³⁵⁴ Samî, Tan (2011), *Rêzimana Kurmancî*, Çapa duyemîn, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, r r. 78-79

³⁵⁵Cegerxwîn, f, r. 22.

³⁵⁶ Tan, r. 80.

³⁵⁷Cegerxwîn, a, r. 195.

Ne wek **şêr û gura** bî, bûkê didî bi tûtûk.

Ko bê tac û sera bî, tê çawan min bikî bûk.³⁵⁹

3.2.7. Peyv û Lêkerên Bi Jiyana Ajalan Ve Têkildar

Ajal di jiyana û çanda kurdan de cihekî pir girîng digirin. Li gundan debara kurdan her tim li ser xwedîkirina pez û dewaran bûye. Her wiha di edebiyata kurdî ya devkî de jî çîrok û metelokên ajalan gelek hene. Ji ber ku kurd ew qas bi xwedîkirina ajalan re têkildar in û di edebiyata devkî jî ew qas xurt e, peyv û lêkerên bi jiyana ajalan ve têkildar jî di nava kurdiyê de pir hene. Wek mînak peyv û lêkerên: Gem, Hevsar, Lîs, Hêlîn, Post, Dotin, Zincîr, Rekkeh, Gavan, Şivan, Kurtan, Koxik, Reşmal, Qefes, Kerî û hwd.

Cegerxwîn ev peyv û lêker di nava helbestên xwe nivîsîne û dewlemendiya peyv û lêkerên bi jiyana ajalan ve têkildar nîşan dane.

Beg bê êl nabê, êl nabê bê beg,

Pezê bê **şivan**, xwedî dibê seg.³⁶⁰

Yekî xwenda li bajaran, meger zana dibû dîsa;

Di bin destê neyaran da, dima ew bê **gem û hevsar**.³⁶¹

Xaniyê axê mezin her dem di ser gund re bilind;

Lîs û hêlîna dîza ye, wek şikefta sêder e.³⁶²

Şûr bi dest in, tev neyar û dostê me,

³⁵⁸Cegerxwîn, a, r. 230.

³⁵⁹Cegerxwîn, a, r. 17.

³⁶⁰Cegerxwîn, a, r. 34.

³⁶¹Cegerxwîn, a, r. 29.

³⁶²Cegerxwîn, a, r. 44.

Bê biha ye wa li sûkê **postê** me.³⁶³

Ev quling, qulingêwelatê me ê jor;

Lîs û hêlîn dijminan tev kirine wêran.³⁶⁴

Dewletên zana û jîr dinya bi zanîn **dotine**,

Roj û şev karê ewan her tim kirîn û firotin e.³⁶⁵

Cegerxwîn dîn e **gavanê** hirça,

Bikir dost û da gurperesta keç.³⁶⁶

Hişyar nebî carek li cihan yek dil û perçe,

Zincîrê li gerdên bî, di nêv **rekkehê** şêr bî.³⁶⁷

Ev renga biratî me nevê ger timî wa bin

Hevsar girêdayî bi **kurtanê** kera bin³⁶⁸

Millet şiyar bû îdî bes e bes

Vaye me şikand ew **tenge qefes**.³⁶⁹

Me ev sera û eywanên bilind

³⁶³Cegerxwîn, a, r. 61.

³⁶⁴Cegerxwîn, a, r. 80.

³⁶⁵Cegerxwîn, a, r. 116.

³⁶⁶Cegerxwîn, a, r. 204.

³⁶⁷Cegerxwîn, b, r. 29.

³⁶⁸Cegerxwîn, b, r. 51.

³⁶⁹Cegerxwîn, c, r. 100.

Avakirin tev li bajêr, li gund

Lê em dibênin **koxik û reşmal**

Di wan de dijîn, parsek û evdal³⁷⁰

Min **dotiye**, min xweş meyand

Min xweş nixwamt û xweş kiland

Min ew kire rûn û heland

Dijmin ji bo min hişt dewêj³⁷¹

Dubendî di nav de heye berberî

Bibêje ku dijmin bûye çend **kerî**.³⁷²

3.2.8. Di Nava Malikan De Piraniya Ajalan

Cegerxwîn gelek malikên helbestên xwe, bi tevahî li ser ajalan çêkiriye û herî kêm navê du-sê ajalan nivîsiye.

Ahû, keroşk û rovî, pez û dewar û kovî,

Wawik û hirç û gurg û şêr û piling û keftar.³⁷³

Mêr û gernas tê nemane, **şêr û ejder** jê revîn,

Rovî û keftar dilîzin bore bore **hirç û ga**.³⁷⁴

Di jînê de hemî candar dilîzin

³⁷⁰Cegerxwîn, c, r. 132.

³⁷¹Cegerxwîn, d, r. 100.

³⁷²Cegerxwîn, e, r. 48.

³⁷³Cegerxwîn, a, r. 27.

³⁷⁴Cegerxwîn, a, r. 186.

Çi *asik* û çî *kergeh* û çî *xenzîr*.³⁷⁵

Kelaşên me li van çolan mirar in

Pepûk û *bûm* û *kunda* tev de xwarin³⁷⁶

3.2.9. Helbestên Bi Tevahî Fabl

Helbestên ku tevahî li ser çîrokeke ajalan derbas bibe û di nav de peyamên nivîskar hebin û aliyê hînkarî yê helbestê hebe ji wan helbestan re helbestên fablî dibêjin. Cegerxwîn jî di dîwanên xwe de helbestên wiha cih kirine. Helbestên Cegerxwîn yên bi vî awayî li jêr cih digirin û ji her helbesta wî herî kêr bi sê malikan ve hatine nivîsîn.

Ji helbesta "*Serxwerabûna Mirîşkan*,"

Li welatê me Xerza

Dîkek hebû şehreza

Rokê ew çû nav *dîkan*

Ji wan re go hêdîka

Rabin bêjin *mirîşkan*

Bes xwe bidin enîşkan³⁷⁷

(...)

Bûm go *bazê* dilawer

Gelo kî ye serleşker?

Go; tev paşa û mîr in;

³⁷⁵Cegerxwîn, g, r. 167.

³⁷⁶Cegerxwîn, j, r. 28.

³⁷⁷Cegerxwîn, a, r. 84.

Bê wezîr û gizîr in.

Bûm hêdî rabû ser xwe

Taca xwe da serê xwe.

Go; bi taca serê min

Kes nîn e, hemberê min.³⁷⁸

Ji helbesta "**Xurtiya Yekîtiyê**",

(...)

Şêrê mezin pir qelew

Mûrî rabûn weke mêr,

Şêrê sor û qirbelek,

Hudhud gote Silêman;

Kurê Dawid pê kenî,

Ew şêrê pir hinermend,

Mûrî tev de bûne yek,

Arîkarî, yekîtî,

(...)

Ji êvar de kete xew.

Ketin poz û guhê şêr.

Nava rojê bû kelek.

Ka ew şêrê dergevan.

Hudhud gotê ezbenî,

Îro sê ro bûye mend.

Kuştin şêrê çavbelek.

Mûrî kirin rûsipî.³⁷⁹

Ji helbesta "**Ji Biçûkan Re**",

Şêr û **piling** tev de çûn,

Vî jê xwar û wî jê xwar,

Yekî ji ê dî re got,

Rastî serîk penîr bûn.

Herduwa li hev dane dar

Herdu rabûn bûne cot.

³⁷⁸ Cegerxwîn, a, r. 87.

³⁷⁹ Cegerxwîn, a, r. 105.

Go em herin cem **rovî**,

Seydayê weş û kovî.³⁸⁰

(...)

Ji helbesta "**Kerê Reş**",

Du bihara sala par,

Ro di esrê çûbû xwar

Min dî **kerek** qut û kem,

Diçêriya li ber çem.

Bê hesar û bê sergoş,

Min ban kirê kero şoş.

Bi zirzir û qoreqor,

Ji çem derket û hate jor.³⁸¹

(...)

Ji helbesta "**Segê Har**",

Ev **segê** ko min bi nanê xo xwedî kir har e ew

Terbiya van reng segana zanibe dijwar e ew.

Çav li destê her mirov e pê bi pê tê ber bi nan

Dûlivîn e sernexwîn e her dema bêçar e ew

Lê dema ko têr dixwî qencî ji bîra wî diçî

Dijminê her kes dibî çunkî segê bedkar e ew.³⁸²

(...)

Ji helbesta "**Kevjal Nikarin Bifirin**",

Baz hilferî çûye jor,

³⁸⁰ Cegerxwîn, a, r. 141.

³⁸¹ Cegerxwîn, a, r. 183.

³⁸² Cegerxwîn, b, r. 44.

Çend *kevjalan* xwe da dor.

Gava bû toz û dûman,
Wan kevjalan xwe berdan.

Dil bi tirs û ah û zar,
Ji banî ve hatin xwar.³⁸³

(...)

Şêr go: Bazê terî rim

Ez ê çawa bifirim?

Go: Ezbenî du sê car,

Xwe ji jêr de berde xwar.³⁸⁴

(...)

Ji helbesta "*Dûvê Nav Çiravê*",

(...)

Şêr bakire *gurê* har

Rabe li me bike par

Gurê reben dîmuqrat

Li hev xistin hemî qat

Goştê sor û çermelaq

Şêr di zik de faqe-faq³⁸⁵

³⁸³ Cegerxwîn, b, r. 192.

³⁸⁴ Cegerxwîn, b, r. 193.

(...)

Ji helbesta "*Welatê Çirto û Virto*",

Şêrê sorê ser mezin

Pir bi saw bû weke cin

Rokê rast hat li **rovî**

Dî ko di dev de hirmî

Go: Rovîko, ev çi ye?

Rovî go: Ev hirmî ye.³⁸⁶

(...)

Ji helbesta "*Zira Kerê û Lota Devê*",

Di mêngê de **deve** û **ker**

Diçêriyan ser bi ser

Goştê wan tev bûye bez

Ne sewal û ne jî pez

Mexel bûne li ber hev

Bi ser wan de hatî şev

Devê go: Tira mi tê

³⁸⁵Cegerxwîn, d, r. 49.

³⁸⁶ Cegerxwîn, f, r. 58.

Kerê go: Zira mi tê³⁸⁷

(...)

Ji helbesta **“Jin Hene Jinkok Hene”**,

(...)

Çiqê reşê pir bi rû

Xwe avête hindirû

Ket hêlîna **kevokê**

Xwe berdaye ser çokê

-Kevokê kir qire-qir

Pepû, ji ku hatî vir?

-Ba, bahoz tèn bi gij-gij

Cihan tev de bûye mij³⁸⁸

(...)

3.2.10. Di Nava Mezmûnên Edebiyata Kurdî ya Klasîk De Ajal

Edebiyata Kurdî ya Klasîk, edebiyateke nivîskî ye û di serdema Îslamê de di bin bandora unsurên dînî, Erebî, Farsî û çanda Îranê de li gorî hinek rêzikan derketiye meydana. Ev edebiyat zanistên binbeş ên wekî tarîxa edebiyatê, kêşa erûzê, serwa (qafiye), paşserwa (redîf), teşeyên nezmê (şiklên nezmê), rewanbêjî (belaxet), ciwankarî (hunerên edebî),

³⁸⁷ Cegerxwîn, f, r. 65.

³⁸⁸ Cegerxwîn, f, r. 58.

cureyên edebî, şîroveya metnan û edebiyata berawirdkirî (edebiyata muqaseyeyî) di xwe de dicivîne ku ji van zanistan bi taybetî tarîxa edebiyatê ji aliyê girîngiyê ve derketiye pêş.³⁸⁹

Di nava Edebiyata Kurdî ya Klasîk de hinek peyv û têgeh hene û helbestvanan her tim yan rasterast yar şibandiye wan, yan jî ji aliyekê tenê ve yar şibadiye wan peyv û têgehên. Ev peyv û têgeh bi derbasbûna zeman ve êdî di nava helbestan de wek qalibekî cihê xwe girtine û pir hatine bikaranîn. Lewra êdî ji wan re “mezmûn” hatiye gotin. Di nava mezmûnên edebiyata klasîk de navên hinek ajalan jî hene û Cegerxwîn jî navên van ajalan di nava helbestên xwe de nivîsandine.

3.2.10.1. Xezal/Ahû

Xezal bi çavên xwe yên delal, bi bîhna xwe ya xweş û bi bizdonekiya xwe ve ji aliyê helbestvanan ve bi yarê tê şibandin û di edebiyatê de bi xezalê ve têkildar pir şibandin hene. Çavên wê reş û mezin in ev jî yarê tîne bîra helbestvan.³⁹⁰

Bi bejn û dêm û bala xweş tu serdara delala ye

Bi wan çavên reş û mêrkuj tu wek xibşa **xezala** ye³⁹¹

Taca delala ti wî

Şewqa şemala ti wî

Kara **xezala** ti wî

Bi qîr û giryan ez im³⁹²

Me **ahû** çavbelek dî û me da pey,

Li ber min bû beranê qertekovî.³⁹³

³⁸⁹Abdurrahman, Adak (2013), *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Çapa yekem, Weşanên Nûbihar, İstanbul, r. 15.

³⁹⁰ Pala, r. 14.

³⁹¹Cegerxwîn, c, r. 263.

³⁹²Cegerxwîn, f, r. 148.

³⁹³Cegerxwîn, a, r. 264.

3.2.10.2. Perwane/Pirpirîk

Perwane perperoka bi şev li dora findê digere re tê gotin. Di helbesta Dîwanê de wek aşîqa findê tê qebûlîkirin. Zemanê berê, helbestvanan nîvê şevê li ber ronahiya findê helbestên xwe dinivîsîn. Perwane jî li dora findê digeriyan û diziviriyan. Gaveke wisa dihat ku perwaneyê ji nişka ve xwe di avête nava agirê findê. Helbestvan jî yarê dişîbîne findê û xwe jî dişîbîne perwaneyê û dibêje ku ez hazirim di oxira yarê de canê xwe bidim.³⁹⁴

Rûhîlalê, gûn-şemalê, rengê xurşîdê bi nûr,

Min dil û canê xwe dayê, her wekî *perwane*'ê.³⁹⁵

Heta kengî li eywanê

Bisojim rengê *perwanê*.³⁹⁶

Agirê derdê te îro

Suhtime wek *pir-pirîk*.³⁹⁷

3.2.10.3. Mar

Di helbesta Dîwanê de porê yarê û ax û nalînên aşîq ji aliyê şiklî ve bi maran tê şîbandin. Ji aliyê dirêjayî, xwarî, jehr û reşbûnê ve mar tîr nîrxandin û bi van taybetiyên xwe ve dikevin nava helbestan. Li gorî hinek efsaneyan xezîne ji aliyên maran ve tîr parastin û ji van maran hinek 100 salan jî dijîn û ejderha ne. Dibêjin mar salê carekê jehrê bi dest dixê û vê jî bi vexwarina dilopa barana nîsanê ve dest dixê.³⁹⁸

Pir gewr û rinde yar im,

³⁹⁴ Pala, r. 370.

³⁹⁵ Cegerxwîn, a, r. 238.

³⁹⁶ Cegerxwîn, c, r. 252.

³⁹⁷ Cegerxwîn, f, r. 173.

³⁹⁸ Pala, r. 297.

Marên di reş ji biskan.³⁹⁹

3.2.10.4. Bilbil

Bilbil, bi xweşikbûna dengê xwe navdar e û di wextê siharê da dike wîçewîç. Tê gotin ku di dinyayê da tu amûreke mûzîkê tune ye ku weke bilbilan dengê xweşik derxîne. Bi Erebi jê re tê gotin ‘Endelîb û ji cureyeke bilbilan ra jî şehlûl tê gotin.

Di edebiyata klasîk da bilbil gelek zêde hatiye bikaranîn. Lewra bilbil, evîndara dilbikul e û herdem qala xweşikahiyên yara xwe dike. Hinek caran bi xwe dibe evîndar û hinek caran jî dibe dilê wê. Bilbil evîndarê gulê ye û bi dengê xwe yê xweşik, dibe helbestên evîndarî. Çawa ku bilbil bi gulê nabe, were jî ‘aşiq bê me’sûq nabe. Çawa ku dirî û qîtên gulê kezeba bilbilê qul dikin; Were jî eziyetên yarê dilê evîndarî qul dike û bi derd û kulan tijî dike.⁴⁰⁰

Dîlber û yarê tu wî,

Zêrîn guharê tu wî,

Gula biharê tu wî,

Bilbilê di bistan ez im.⁴⁰¹

3.2.10.5. Şêr û Piling

Di edebiyata klasîk da motîfa şêr/pilingê herî zêde di berhemên qala baweriya Elewîyan dikin da hatiye bikaranîn û di edebiyatê da gelek caran Hz. Elî û şêr, bi hev ra hatine bikaranîn. Şêr, leqeba Hz. Elî ye û jê ra “Şêrê Xwedê” hatiye gotin. Piling jî cureyek ji famîleya pisîkan ya mezin e û ev heywana him bi hêza xwe him jî bi reva xwe ya bi lez navdar e.

Wateya penceyên şêr ew e ku evîndar, ji bo evîna xwe dikare her tiştî bike. Di helbestan da hinek caran şêr û xezal bi hev ra hatine bilêvkirin. Sedema herî mezin ji bo vî tiştî ew e ku yar, bi çavxezaliya xwe û bit irs û xofa ku li şêr dinihêrebi wî awayî jî li evîndara xwe mêzedike ye. Li hember nihêrindina bi vî şiklî tu kesek nikare bisekine.⁴⁰²

³⁹⁹Cegerxwîn, a, r. 267.

⁴⁰⁰Sönmez, r. 110-111.

⁴⁰¹Cegerxwîn, a, r. 271.

⁴⁰²Sönmez, r. 113.

Zirav e şox û şeng e

Delal e pir çeleng e

Bi awiran **piling** e

Şêrîn şeker dirêjî⁴⁰³

Delal e pozbilind e, çeleng û şemşematî ye

Ji kuştina dilan re pir xurt û jêhatî ye

Kezî û bisk û ebrû, **şêr û piling** û xwînxwar in.⁴⁰⁴



⁴⁰³Cegerxwîn, c, r. 297.

⁴⁰⁴Cegerxwîn, c, r. 237.

ENCAM

Cegerxwîn wek helbestvan, nivîskar û lêkolînerekî di nava Edebîyata Kurdî de cih digire û di sedsala 20. de bi helbestên xwe yê welatevîniyê ve navê xwe di nava gelek kurdan de daye zanîn û belavkirin. Hemû berhemên wî ji aliyê rêziman, folklor, rexneyên edebî û hwd. hêjayî lêkolîn û dûçûnên berfireh in.

Me jî di vê xebatê de, li ser ajalên di helbestên Cegerxwîn de lêkolînek kir. Di beşa yekem de lêkolînek li ser mijara Edebîyata Cîhanê û Edebîyata Kurdî de Ajal hat kirin. Me di vê beşê de bi mînakên ji Edebîyata Kurdî ya Klasîk û ji zargotina kurdî zanî ku Wêjeya Kurdî ji aliyê fabl û bikaranîna navên ajalan ve ji edebîyatên miletên din kêmtir û qelstir nîn e. Her wiha me di vê beşê de dît ku di Edebîyata Cîhanê û Edebîyata Kurdî de bikaranîna navên ajalan xwedî armançeke taybet e û navên ajalan navgîna vegotina hest, fikr û ramanên mirovan yê veşartî ne. Me di beşa duyem de jî jiyana Cegerxwîn û berhemên wî xwendin. Di vê beşê de jî em pê hesiyar ku jiyana Cegerxwîn ya bi feqîrî û di bêçaretîyê de derbasbûyî bandora xwe li ser naveroka helbestên wî kirine. Ji bilî vê yekê berhemên Cegerxwîn yê ku ji bo folklorê kurdî çavkaniyên bêhempa ne, ji jiyana wî ya kurdewarî derketinê holê.

Bingeha teza me di helbestên Cegerxwîn de ajal bûn û ji bo vê mijarê jî me hemû pirtûkên Cegerxwîn yê helbestan bi hûngilî xwendin û ajalên ku di nava van helbestan de derbas dibin me nivîsîn. Berhemên Cegerxwîn ji aliyê navên ajalan ve çavkaniyên gelek bi qiymet in. Lewra navên gelek ajalan di nava helbestên wî de derbas dibin û ev navên ajalan di nava helbestên bi tevahî fabl, biwêj, gotinên pêşyan û hwd. de hatine bikaranîn. Cegerxwîn gelek taybetiyên kurdan bi taybetiyên ajalan ve kirine yek û rewşa kurdan baştir bi xwendevanên xwe daye fêmkirin. Em dibînin ku Cegerxwîn ji aliyê vegotina çîrokên fablî ve gelek pêşveçûyî ye. Dibe ku tu helbestvanên kurd bi qasî Cegerxwîn navên ajalan ve têkildar helbest, malik, çarîn û çîrok nenivîsandibin. Me ji mêşê heta gamêşê navên ajalan di helbestên Cegerxwîn de dît in û em bi têgihîştina wî ya di vî warî de hesiyar. Di vê beşê de me hêza pênuşa Cegerxwîn baştir dît û waqîfbûna wî ya folklorê kurdî jî ji nêzikî ve tesbît kir. Cegerxwîn bi zanîna xwe ya di derbarê çand û edebîyata kurdî ve gencîneyeke veşartî ye û li hêviya lêkolîneran e.

ÇAVKANÎ

- Abrurrahman, Adak (2013), *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Çapa yekem, Weşanên Nûbihar, İstanbul.
- Ahmet Cengiz, Çamlıbel (1997), *İdyomên Kurdi*, Çapa Yekemîn, Weşanên Deng, İstanbul.
- Ali İhsan, Kolcu (2007), *Batı Edebiyatı*, 2. Basım, Salkımsöğüt Yayınları, Erzurum.
- Beydeba (2006), *Kelile ve Dimne*, 1. Baskı , Alkim Yayınevi, İstanbul.
- Cegerxwîn (2003), *Hayat Hikayem*,1. Basım, Evrensel Yayınları. İstanbul.
- Cegerxwîn (2007), *Reşoyê Darê*, Çapa yekem, Weşanên Lîs, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Agir û Pirûsk*, Çapaşêşan, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Aşitî*, Çapa çaran, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Hêvî*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Kî Me Ez*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Ronak*, Çapa pêncan, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Salar û Mîdya*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Sewra Azadî*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Şefaq*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Şerefnameya Menzûm*, Çapa çaran, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Cegerxwîn (2011), *Zend-Avista*, Çapa pêncem, Weşanên Avesta, Stenbol.
- Celadet Elî, Bedirxan (1998), *Elfabeya Kurdî Bingeha Gramera Kurdmancî*, Çapa yekem, Weşanên Nefel, İstanbul.
- Celadet Elî, Bedirxan (2012), *Hawar*, Çapa duyem, Weşanên Belkî, Stenbol.
- Feqî Huseyn, Sağniç (2002), *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Çapa yekemîn, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul.
- Ferit, Devellioğlu (2007), *Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat*, 24. Baskı, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara.
- George, Orwell (2016), *Hayvan Çiftliği*,46. Basım, Can Yayınları, İstanbul.

- Gernas, Koçer (2007), *Destana Şerrê Kundan û Qijikan*, Çapa yekem, Weşanên Nûbihar, İstanbul.
- Güncel Türkçe Sözlük Çalışma Grubu (2009), *Türkçe Sözlük*, Onuncu baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara.
- Haydar Diljen, Azad J. Erdem, Remzî Kerim, Mahmûd Lewendî (2014), *Dergûşa Nasnameyê*, Çapa duyem, Weşanên Sîtav, Van.
- Huseyn, Şemrexî (2011), *Mem û Zîn-Ehmedê Xanî*, Çapa duyem, Weşanên Nûbihar, İstanbul.
- Îsfahanî, Rağîb (2015), *Müfredat-Kur'an Kavramları Sözlüğü*, 4. Baskı, Yarın Yayınları, İstanbul.
- İskender, Pala (2015), *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, 26. Basım, Kapı Yayınları, İstanbul.
- Îzolî (2013), *Ferheng*, Çapa 8'an, Weşanên Deng, Stenbol.
- Keça, Kurd (2014), *Ferhenga Etîmolojiya Kurdî-Zaravê Kurmancî*, Çapa yekem, Weşanên Nûbihar, İstanbul.
- M. Emin, Bozarıslan (2000), *Gurê Bilûrvan*, Çapa diduyan, Weşanên Deng, İstanbul.
- M. Xalid, Sadinî (2011), *Mela Huseynê Bateyî*, Çapa duyem, Weşanên Nûbihar, İstanbul.
- M. Xalid, Sadinî (2012), *Feqîyê Teyran*, çapa şeşan, Weşanên Nûbihar, İstanbul.
- Mehmed, Uzun (2009), *Kürt Edebiyatı Antolojisi*, 3. Baskı, İthaki Yayınları, İstanbul.
- Mehmet, Oncu (2009), *Gotinên Pêşyan*, Çapa yekem, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, İstanbul.
- Mehmet, Öncü (2014), *Çîrokên Efsaneyî yên Kurdan*, Çapa yekem, Weşanên Nûbihar, İstanbul.
- Melayê, Cizîrî (2012), *Dîwan* (Amd: Selman Dilovan), Çapa duyem, Weşanên Nûbihar, İstanbul.
- Mistefa, Aydoğan (2012), *Rêbera Rastnivîsînê*, Çapa yekem, Weşanxaneya Rûpel, İstanbul.
- Murad Cuwan, Mahmûd Lewendî, Serdar Roşan, Reşo Zîlan, *Fablên Kurdî*, Weşanên Weqfa Kurdî ya Kulturî li Stockholmê, Stockholm.
- Musa, Anter (2013), *Hatıralarım*, 3. Baskı, Aram Yayınları, İstanbul .

Nesim, Sönmez (2018), *Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî-Metn û Lêkolîn*, Çapa yekem, Seyda Yayınları, Diyarbakır.

Ordîxan Celîl, Celîlê Celîl (2013), *Zargotina Kurda (2 cîlt)*, Çapa sêyem, Weşanên Aram, Diyarbakır.

Osman, Aslanoğlu (2014), *Pervîn-i İ'tisâmî Divanı'nın Tahlili*, Doktora tezi, Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Fars Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, Erzurum.

Önder, Ertap (1996), *Dîvan Şiirinde Hayvan Motifi*, Yüksek Lisans Tezi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Balıkesir Üniversitesi.

Perto Begê, Hekarî (2011), *Dîwan*, (Amd: Tehsîn İbrahîm Doskî), çapa yekem, Weşanên Nûbihar, İstanbul.

Qanatê, Kurdo (2009), *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Çapa yekem, Weşanên Lîs, İstanbul.

Ramazan, Çeper (2014), *Ferhenga Etîmolojiyê*, Çapa yekem, Weşanên AR, İstanbul.

Sadiq Bahaeddîn, Amêdî (2013), *Folklorê Kurdî*, Çapa yekem, Weşanên Lîs, Amed.

Samî, Tan (2011), *Rêzimana Kurmancî-Çapa Berfirehkirî*, Çapa duyemîn, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul.

Selman Dilovan, Huseyn Şemrexî (2012), *Dîwana Seyîd Elîyê Findikî*, Çapa şeşan, Weşanên Nûbihar, İstanbul.

Selman, Dilovan (2012), *Dîwana Melayê Cizîrî*, Çapa duyem, Weşanên Nûbihar, İstanbul.

Şerefxan, Cizîrî (2011), *Edebiyata Devkî û Sosyalîzasyon*, Çapa Yekem, Weşanên Aram, İstanbul.

Şeyh Sadî, Şirazî (2008), *Gülistan*, 2. Baskı, Alkım Yayınevi, İstanbul.

Şeyh Sadî, Şirazî (b.d.), *Bostan*, Müjde Yayınevi, İstanbul.

Yusuf, Kaynak (2010), *Jînenîgariya Cegerxwîn û Berhemên Wî*, Çapa yekemîn, Weşanên Do, İstanbul.

Zana, Farqînî (2010), *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Çapa sêyem, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul.

Zana, Farqînî (2013), *Türkçe-Kürtçe Sözlük*, Üçüncü baskı, İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, İstanbul.

